K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Masterê

DI KILAMÊN ELÎ SÎZER DE ŞOPÊN BAWERIYA ELEWÎTIYÊ

Hüseyin KAÇMAZ

17711003

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Shahab VALI

Mêrdîn 2020

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Masterê

DI KILAMÊN ELÎ SÎZER DE ŞOPÊN BAWERIYA ELEWÎTIYÊ

Hüseyin KAÇMAZ

17711003

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Shahab VALI

Mêrdîn 2020

wî, yek şeva bi tenê jî

em ji kaniya vî zimanê şêrîn bêpar nehiştin

ez vê xebatê diyariyî bavê xwe dikim

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Di Kilamên Elî Sîzer de Şopên Baweriya Elewîtiyê" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

 Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

 Tezim, sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

 Tezimin … yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

..../..../.....

Hüseyin KAÇMAZ

KABUL VE ONAY

Hüseyin KAÇMAZ tarafından hazırlanan "Di Kilamên Elî Sîzer de Şopên Baweriya Elewîtiyê" adındaki çalışma, … /… /… tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

_____

_____

_____

_____

PÊŞGOTIN û SPASÎ

Civaka Kurdan, ji aliyê baweriyê ve ne civakeke homojen e. Herçiqasî ku piraniya Kurdan Misilman bin jî Kurdên Mesîhî, Mûsewî, Êzîdî, Şebek û Yarsan jî hene. Xeyn ji van baweriyan, yek ji baweriyên di nava Kurdan de tê dîtin Elewîtî ye. Navê Elewî, ji bo çend komên baweriyê yên weke Nuseyrî, Bektaşî, Qizilbaş, Tahtaci, Çepnî, Qelenderî weke têgeheke sîwanî tê bikaranîn. Ev kom, xwedanê gelek xalên hevpar in lê mirov nikare bibêje ku bi tevahî dişibine hev, hinek taybetiyên ku wan ji hev cuda dikin jî hene. Yek ji van komên baweriyê yên ku di bin sîwana navê Elewî de ne, Kurdên Elewî ne û ji bo Kurdên Elewî navên Qizilbaş û Rêya Heqiyê jî têne bikaranîn. Weke ku dê di naveroka vê lêkolînê de jî were dîtin Kurdên Elewî ji aliyê baweriya xwe ve ji hinek aliyan ve dişibine van komên ku navên wan hatine dayîn û ji hinek aliyan ve jî ji wan vediqetin. Ji bo nîşandana van şibahî û cudahiyan pêwistî bi xebatên li ser Kurdên Elewî heye. Lê wextê ku ev xebat bêne kirin divê agahî bes ne ji çavkaniyên nivîskî bêne girtin, divê civak were naskirin, çanda civakê û kevneşopiyên wê neyêne piştguhkirin. Di vê xebatê de hewla me ev e ku baweriya civaka Kurdên Elewî him bi rêya çavkaniyên nivîskî him bi rêya analîza kilamanên wan, bi mînaka kilamên Elî Sîzerê ku derwêşekî Elewî ye û kilamên xwe bi Kurmancî dibêje, û him jî bi rêya xebatên li qadê were nîşandan.

Ji bo ku ev hewla me bigihe armancekê, ji destpêka vê lêkolînê heta bi dawiya wê gelek kes û hevalan hevalbendiya me kir, spasî û malavayiya van kesan ji bo me dilcoşî û kêfxweşî ye. Gelekî spas bo Elî SÎZER û malbata wî yî ku di maweyê xebatên qadê de ez hefteyekê mêvanê wan bûm û wan, ez her rojê ji roja din bi beşereke xweştir pêşwazî dikirim. Gelekî spas bo hevalên min Latife ATAY, Aziz ŞAHİN, Rezzan SOYSAL; xwişka min Melek KAÇMAZ; kameravanê Can TVyê Kamil Murat DEMİR; mamosteyên min Necat KESKİN, Yılmaz ÖZDİL. Şêwirmendê min Shahab VALI, di her qada vê lekolînê de bi fikr û rêxneyên xwe rê li ber vê xebatê firehtir kir, gelekî spasiya cenabê birêz VALI dikim, mala wî ava be.

KURTEBÊJE

b. :Berg

b.c. :Bê Cih

b.d. :Bê Dîrok

ber. :Berhevkar

bnr. :Binêrin

d.g. :Dîroka Gihiştinê

ed. :Edîtor

h.b. :Heman Berhem

h.g. :Heman Gotar

h.t. :Heman Tez

hj. :Hejmar

hwd. :Her Wekî Din

in. :di … de

k. :Koçî

m. :Mirin

r. :Rûpel

wer. :Werger

KURTE

Di nava civaka Kurdan de gelek baweriyên ciyawaz hene. Yek ji van baweriyan jî Elewîtî ye. Kurdên Elewî bi bawerî, çand û kevneşopiyên xwe di nava civaka Kurdan de xwedanê cihekî cuda ne lê herçiqasî ku Kurdên Elewî di cihekî cuda de bin jî îro baweriya wan hêdî hêdî ber bi guherîneke mezin ve diçe û ev bawerî gav bi gav ji xwezaya xwe dûr dikeve herwiha rastiyên vê civakê jî di gelek lêkolînan de nayêne nîşandan. Di vê xebatê de armanca me ev e ku bi mînaka kilamên Elî Sîzer, di kilamên Elewiyên Kurd de şopên baweriya wan bêne diyarkirin. Ji ber ku Elewî baweriya xwe hîn zêdetir bi rêya kilamên xwe tînine zimên dê mirov karibe gelek şopên vê baweriyê di kilamên wan de bibîne û xwezaya vê baweriyê çêtir fêhm bike. Lê helbet wextê ku me ev kar kiriye, me bes cih nedaye kilaman; me, li gorî çavkaniyên cuda di heqê baweriya Elewiyan, dîroka wan, wateya navên Elewî-Qizilbaş, têkiliya Eliyê xelîfe û Elewîtiyê, di dema dewletên Osmanî, Safewî û Tirkiyeyê de rewşa Elewî-Qizilbaşan de agahî dane û herwiha me cih daye agahiyên ku me di xebatên qadê de berhev kirine.

Piştî ku di heqê baweriya Elewîtiyê de agahî hatine dayîn û kilamên Sîzer li gorî vê baweriyê hatine nirxandin bi awayekî zelal kifş bûye ku Sîzer di kilamên xwe de qala gelek hêmanên vê baweriyê kiriye û gelek hîmên girîng ên vê baweriyê di kilamên xwe de parastine.

Peyvên Sereke: Kilam, Bawerî, Elewî, Elewîtî, Elî Sîzer.

ABSTRACT

There are many different beliefs in Kurdish society. One of these beliefs is Alevism. Kurdish Alevis have a different place in the Kurdish society with their faith, culture and traditions. However, although this community has a different position, the belief of this community is gradually changing, the Alevi faith is gradually moving away from its nature and the truths about this community are not mentioned in many studies. Our aim in this study is to determine the traces of the beliefs of the Alevi Kurds in the kilams of the Alevi Kurds with the example of the kilams of Ali Sizer. Since Alevis express their beliefs more through their kilams, many traces of their beliefs can be seen in their kilams so that the nature of this belief can be more understood. Of course, we did not only mention the kilams of the Alevis in this study; we explained the Alevi faith, the history of the Alevis, the meaning of the Alevi-Kizilbash names, relationship between caliph Ali and Alevism, at the time of Ottoman, Safavid and Turkey states status of Alevi-Kizilbash, according to different sources and we also included the information we gathered from field studies.

After giving information about Alevi faith and Ali Sizer's songs were evaluated according to this faith it became clear that he mentioned many elements of this faith in his kilams and he preserved many important elements of Alevi faith in these kilams.

Key Words: Kilam, Faith, Alevi, Alevism, Ali Sizer.

ÖZET

Kürt toplumu içerisinde birçok farklı inanç grubu mevcut olup bu inançlardan bir tanesi de Aleviliktir. Alevi Kürtler; inanç, kültür ve gelenekleri bakımından Kürt toplumu içersinde ayrı bir yere sahiptir fakat bu topluluk her ne kadar kendine has bir konuma sahip olsa da günümüzde bu topluluğun inancı yavaş yavaş büyük bir değişime uğramakta, Alevilik inancı adım adım kendi doğasından uzaklaşmakta ve bu topluluğa dair doğrulara birçok çalışmada değinilmemektedir. Bu çalışmadaki amacımız Ali Sizer'in deyişleri örneğiyle Alevi Kürtlerin deyişlerinde, Alevi Kürtlerin inançlarının izlerini tespit etmektir. Aleviler, inançlarını daha çok deyişleri yoluyla ifade ettiklerinden, onların deyişlerinde inançlarının birçok izi görülebilir ve böylelikle bu inancın doğası daha çok anlaşılabilir. Elbette bu çalışmayı yaparken sadece Alevilerin deyişlerine yer vermedik; farklı kaynaklara göre Alevilik inancı, Alevilerin tarihi, Alevi-Kızılbaş isimlerinin anlamı, halife Ali ve Alevilik ilişkisi, Osmanlı, Safevi ve Türkiye devletleri zamanında Alevi-Kızılbaşların durumu konularına değindik ve aynı zamanda saha çalışmalarından derlediğimiz bilgilere de yer verdik.

Alevilik inancı hakkında bilgiler verildikten ve Ali Sizer'in deyişleri bu inanca göre yorumlandıktan sonra Sizer'in, deyişlerinde bu inancın birçok unsurundan söz ettiği ve deyişlerinde bu inanca ait birçok unsuru koruduğu açıkça ortaya çıkmıştır.

Anahtar Kelimeler: Deyiş, İnanç, Alevi, Alevilik, Ali Sizer.

NAVEROK

PÊŞGOTIN û SPASÎ iii
KURTEBÊJE iv
KURTE v
ABSTRACT vi
ÖZET vii
DESTPÊK 1
1. ELEWÎTÎ: NAV, DÎROK Û BAWERÎ 7
1.1. Wate û Dîroka Navên "Elewî û Qizilbaş" **7**
1.2. Elî, Têkiliya Elî û Elewîtiyê **17**
1.3. Dîroka Elewîtiyê **23**
1.3.1. Dewleta Osmanî û Elewî **27**
1.3.2. Dewleta Safewî û Elewî **30**
1.3.3. Komara Tirkiyeyê û Elewî **33**
1.4. Baweriya Elewîtiyê **38**
1.4.1. Cudahî û Şibahiyên di Navbera Elewîtî û Bektaşîtiyê de **41**
1.4.2.1. Kelîmeya Şehadetê-Îqrar 50
1.4.2.2. Nimêj-Cem **50**
1.4.2.3. Rojî **54**
1.4.2.4. Zikat **56**
1.4.2.5. Hec-Ziyaret **56**
1.4.2.6. Mirin **57**
1.4.2.7. Perwaz-Kirasguhertin **59**
1.4.2.8. Baweriya Xwedê **61**
1.4.2.9. Destbiraktî-Misawtî **62**
2. JIYANA ELÎ SÎZER Û KILAMÊN WÎ 71
2.1. Jiyana Elî Sîzer **71**
2.1.1. Zaroktî û Perwerdehî **73**
2.1.2. Destpêka Muzîkê û Kilamgotinê **73**
2.1.3. Xebatên Televîzyonê **74**

2.1.4. Çûna Ewropayê û Planên Pêşerojê 75
2.2. Kilamên Elî Sîzer 76
2.2.1. Lîsteya Kilaman 76
2.2.2. Ji Aliyên Teşe, Naverok û Şêwazê ve Analîzeke Kurt a Kilamên Elî Sîzer 150
3. DI KILAMÊN ELÎ SÎZER DE RENGVEDANA ELEWÎTIYÊ 152
3.1. Bi Nêrîna Elî Sîzer Elewîtî 152
3.1.1. Elewîtî: Nav-Bawerî 152
3.1.2. Mirin, Hizra Axretê, Perwaz 156
3.1.3. Îbadet 157
3.1.4. Xweda-Pêxember-Quran 157
3.1.5. Kevneşopiyên Girîng 158
3.1.6. Jin 160
3.2. Di Kilamên Elî Sîzer de Kesên Dîrokî 160
3.2.1. Baba Tahir 160
3.2.2. Baba Mansûr 161
3.2.3. Xelacê Mensûr 162
3.2.4. Nesîmî 163
3.2.5. Ebul Wefa 164
3.2.6. Baba Îshaq 164
3.2.7. Baba Resûl 165
3.2.8. Şêx Bedredîn 165
3.2.9. Pîr Sultan 166
3.2.10. Çelebî 167
3.2.11. Seyîd Riza 168
3.2.12. Elîşêr 169
3.3. Di Kilamên Elî Sîzer de Şopên Elewîtiyê 170
3.3.1. Perwaz 170
***3.3.2.* Çil Derî Çar Meqam-Çar Enasir 170**
3.3.3. Dîrok-Destpêk 170
3.3.4. Elî 171
3.3.5. Xweda 172
3.3.6. Şît û Nacî 172

3.3.7. Îqrar ... 173
3.3.8. Destbiraktî ... 174
3.3.9. Pêşengên Baweriyê ... 174
3.3.10. Diwazdeh Îmam ... 175
3.3.11. Jin ... 176
3.3.12. Pirtûkên Pîroz ... 177
3.3.13. Xizir ... 177
3.3.14. Tembûr ... 177
3.3.15. Ferîşteh ... 179
3.3.16. Ziyaret ... 179
3.3.17. Dem (Cem) ... 181
3.3.18. Derhoze ... 183
3.3.19. Navê Baweriyê ... 184
3.3.20. Bûyerên Dîrokî ... 184
ENCAM ... 186
ÇAVKANÎ ... 188
PÊVEK ... 204

DESTPÊK

Baweriya Elewîtiyê, mijareke gelekî berfireh û nîqaşbir e. Elewiyên ku li Tirkiyeyê û Kurdistanê dijîn hîn ji wextê Selçukiyan û Osmaniyan ve tûşî çewisandinê hatine û ev çarenûsa wan, wextê komara Tirkiyeyê jî neguheriye. Mijara Elewîtiyê bi sedsalan weke rastiyeke civakî û dîrokî nehatiye dîtin, hebûna Elewiyan hatiye înkarkirin. Piştî ku hebûna wan hatiye qebûlkirin jî gelek tiştên ku di rastiya vê baweriyê de nînin tevlî vê baweriyê hatine kirin. Ji ber înkara dirêjdem û polîtîkayên domdar ên asimilasyonê yên li ser vê baweriyê, parastina xwezaya Elewîtiyê bûye karekî qurs. Herwiha nebûna dokumentên dîrokî yên ku rasterast rastiyên vê civakê nîşan didin jî parastina vê baweriyê dijwartir dike. Di nava şert û mercên bi vî rengî de ji bonî têgihiştina rastiyên vê baweriyê girîngiya çanda devkî derdikeve holê. Çanda devkî, gelek caran gelek rastiyên civakan nîşan dide û van rastiyan bo nifşên nû vediguhêze. Îro jî Elewî baweriya xwe hîn bêhtir bi rêya çanda devkî bo nifşên nû vediguhêzin û rastiyên bawerî û civaka xwe bi rêya kilamên xwe tînine zimên. Wî çaxî, kilam ji bo têgihiştina vê baweriyê dibine çavkaniyeke girîng û nîşaneya rastiyên vê civakê. Lê wextê ku Elewî, kilamên xwe dibêjin ev kilam bi serê xwe nayêne gotin, hema bêje tim bi tembûrê re têne gotin. Dema ku mirov li nava Elewiyan digere gelek caran rastî nêrîna ku dibêje "Tembûr, Qurana me ye; ayet jî hedîsên me ne" dibe. Ev nêrîna bi vî şiklî, di baweriya Elewîtiyê de girîngiya kilaman û cihê wan bi awayekî zelal kifş dike.

Wextê ku qala Elewîtiyê tê kirin divê were zanîn ku ev bawerî ji bo tevên komên ku navê wan Elewî ye nayê wateya heman tiştî. Gelek komên ku di bin sîwana navê Elewî de ne hene û baweriya van koman di nava xwe de gelek hêmanên şibahev û cuda dihewîne. Yek ji van koman jî Kurdên Elewî ne. Kurdên Elewî gelek caran him ji aliyê nijadî û him ji aliyê dînî ve hatine çewisandin. Vê çewisandinê, ew naçar kirine ku baweriya xwe bi awayekî nepen bijîn û heta salên heftêyî îbadeta xwe ya sereke, cem, li malên xwe bi dizîka bikin. Lê piştî ku salên heftêyî Elewiyan koçî bajaran kirin, rêya xweîfadekirinê zêdetir peyde kirin û

baweriya xwe hişkeretir anîne zimên. Bi taybetî, piştî ku salên hefteyî cemxane ketin formeke nû û rayedarên dewletê di wan de peywirdar bûn ayînên cemê hîn zêdetir bi zimanê Tirkî hatin lidarxistin û motîfên Kurdan û zimanê Kurdî hin bi hin kêmtir bûn. Îro li gelek cemxaneyên li Kurdistanê dedeyên Tirk peywirdar in û ayînên cemê weke formeke hevpar têne lidarxistin. Herçiqasî ku him li nava Kurdan him jî li nava Tirkan dedeyên Kurd ên ku hatibine peywirdarkirin hebin jî zimanê ayînên cemê Tirkî ye.

Dîsa bi awayekî zelal tê dîtin ku baweriya Kurdên Elewî ya di pratîkê de li tiştên teorîk nayê, ev jî nîşaneya guherîneke mezin e. Helbet guherîn tiştekî xwezayî û pêwist e lê wextê ku ev guherîn bi destê hinek rêxistinan li ser civakê were ferzkirin û civak ne bi dilê xwe yan jî bêyî ku hay ji xwe hebe ji kevneşopiyên xwe dûr bikeve ev pirsgirêkek e. Herçend ku cudahiyên gelekî zelal di navbera Elewîtiya Kurdan û Tirkan de hebin jî îro Elewîtiya Kurdan hin bi hin nêzîkî ya Tirkan dibe û Elewîtî bi giştî nêzîkî Îslamê dibe. Ev rûdanên bi vî şiklî girîngî û pêwistiya lêkolînên li ser Kurdên Elewî derdixine holê. Di vê lêkolînê de kilamên Kurdên Elewî yên ku ji aliyê Elî Sîzer ve hatine stran hatine berhevkirin, reng, motîf û têgehên Kurdan ên di nava Elewîtiyê de hatine nîşandan nîşandan.

Di wextekî ku gelek tiştên bê kok û binyat tevlî vê baweriyê têne kirin û endamên vê baweriyê him ji aliyê dînî û him jî ji aliyê nijadî ve tuşî çewisandinê tên, girîngiya lêkolînên ku rastiyên vê civakê derxine holê zêdetir dibe. Lê mixabin gelekên xebatan, li dora nîqaşên çêkirî diçin û tên. Divê lêkolînerên ku dixwazin rastiyên vê civakê û vê baweriyê fêhm bikin berê xwe bidine nava civakê û angaştên ku hema bêje dubareya hev in ji xwe re nekine bar û piştî. Hêviya me ev e ku ev lêkolîn ji bo vejînkirina tradisyona Kurdên Elewî bibe mînakek û rê li ber xebatên bi vî rengî veke.

Mijara Lêkolînê

Mijara vê xebatê, kilamên derwêşekî Elewî, Elî Sîzer, û di kilamên wî de diyarkirina şopên baweriya Elewîtiyê ye. Piştî ku kilamên Elî Sîzer ên ku nîşaneyên Elewîtiyê di wan de hene hatine dayîn ev kilam, li gorî baweriya

Elewîtiyê hatine şîrovekirin û nîşaneyên vê baweriyê di van kilaman de hatine diyarkirin. Helbet di bijartina mijara vê lêkolînê de Elî Sîzer ne tesadufek e. Elî Sîzer, li gel temenê xwe yî ciwan îro di nava Kurdên Elewî de, bi taybetî li herêmên Semsûr, Mereş û Meletiyê, bi xebat û kirinên xwe mînakek e. Di vê rewşa ku zimanê ayînên Elewiyên Kurd jî bûye bi Tirkî de, bi piranî havînan ji Wêlsê tê welêt û ayînên bi Kurmancî li dar dixe ev yek jî girîngiya wî zêdetir dike herwiha bi vê kirina xwe tradîsyona Kurdên Elewî ji nû ve zindî dike.

Armanca Lêkolînê

Di wextekî ku li ser Elewiyan gelek spekulasyon hene û gelek tiştên ku di eslê baweriya Elewîtiyê de nînin tevlî vê baweriyê dibin de, mirov dikare bi rêya kilamên Elewiyan, li ser baweriya wan gelek agahiyan bi dest bixe. Ji ber vê yekê, mirov dikare kilamên Elewiyan ji bo baweriya Elewîtiyê weke çavkaniyeke girîng binirxîne. Armanca sereke ya vê lêkolînê, di kilamên Elî Sîzer de diyarkirina şopên baweriya Elewîtiyê ye. Bi vê rêyê dê mirov karibe rasterast bi rêya çanda wan a devkî, xwe bigihîne nîşaneyên vê baweriyê. Dîsa di heqê mijarên baweriya Elewîtiyê, dîroka Elewîtiyê, wateya navê Elewîtiyê, têkiliya Elî û Elewîtiyê de agahîdayîn û bi rêya van agahiyan nîşandana cuahî-şibahiyên di navbera Kurdên Elewî û komên din ên Elewî de hinek ji armancên vê xebatê ne.

Girîngiya Lêkolînê

Lêkolînên ku li Tirkiyeyê têne kirin gelek caran Kurdên Elewî piştguh dikin û yên ku qala Kurdên Elewî jî dikin gelek caran bi zimanê Tirkî ne. Ev yek, rê li ber kêmbûna hêmanên Kurdî yên di nava baweriya Elewîtiyê de vedike. Ji ber ku ev lêkolîn li ser Kurdên Elewî bi zimanê Kurdî hatiye kirin, kilamên Elewiyan ên bi Kurmancî hatine berhevkirin û bi rêya vê yekê Elewîtiya Kurdan hatiye nîşandan xebateke girîng e.

Orîjînalî

Wextê ku mirov li lîteratura Elewîtiyê dinêre, xwiya dibe ku berhevkirina kilamên Kurdên Elewî û nîşandana wan di xebateke zanistî de, dîsa lêkolînên li ser

Kurdên Elewî, karekî ku pir nayê dîtin e. Elî Sîzerê ku kilamên wî mijara vê lêkolînê ne, derwêşekî Elewî ye, herçend ku çend heb kilamên wî yên bi Tirkî hebin jî kilamên wî bi piranî bi Kurmancî ne. Li herêmên Semsûr, Mereş û Meletiyê di ayînên cemê de li tembûrê dixe û di van ayînan de bi taybetî kilamên Kurmancî dibêje, li pêşiya cimatê bi Kurmacî diaxive û diayên xwe bi Kurmancî dike. Îro, gelekên ayînên cemê yên Kurdên Elewî bi zimanê Tirkî têne lidarxistin û kilamên ku di van ayînan de têne gotin bi zimanê Tirkî ne. Ji ber ku Elî Sîzer, li derveyî vê yekê dimîne û dixwaze ku kevneşopiyên Kurdên Elewî biparêze şexsiyetekî girîng e. Herwiha ji ber ku kilamên Elewiyan gelek şopên baweriya wan nîşan didin, berhevkirin û nirxandina van kilaman jî karekî girîng e. Ji ber ku heta niha xebateke Kurmancî ya bi vî şiklî li ber destan nîne ev lêkolîn, xebateke resen e.

Rêbaza Lêkolînê

Teknîka bingehîn a vê lêkolînê berhevkarî ye. Kilamên Sîzer ên di çarçoveya vê xebatê de, hatine berhevkirin û kilamên ku hatine berhevkirin di naveroka vê lêkolînê de hatine nîşandan. Xeyn ji karê berhevkariyê, di heqê mijara lêkolînê de gelek çavkaniyên ku nêrînên cuda dihewînin hatine xwendin, ev nêrînên cuda hatine berawirdkirin û encamên van berewirkirinan hatine nîşandan. Herwiha em beşdarî ayînên cemê yên Elewiyên herêma Semsûr û Mereşê bûne û me bi rêya hevpeyvînan agahî berhev kirine. Dîsa di çarçoveya lêkolînê de, bi Sîzer re hevpeyvîn hatine kirin û li gorî agahiyên ku Sîzer di hevpeyvînan de dane nêrînên wî yên li ser Elewîtiyê û naveroka kilamên wî hatine berawirdkirin.

Sînor û Çarçove

Weke ku li jorê jî amaje pê hatibû kirin xebatên li ser kilamên Elewiyan ên bi Kurdî û baweriya Kurdên Elewî kêm in. Ji ber vê yekê, ev lêkolîn bi kilamên Elî Sîzer ên Kurmancî sînordar e. Elî Sîzer, hinek kilamên xwe bi zimanê Tirkî jî dibêje lê ew kilam ne di çarçoveya vê lêkolînê de ne. Di vê xebatê de sih û heşt kilamên Sîzer hatine berhevkirin. Nozdeh ji van kilaman bi rêya malperên înternetê hatine peydekirin û nozdeh ji wan jî destxetên Elî Sîzer in. Lînkên

kilamên ku bi rêya malperên înternetê hatine berhevkirin di beşa çavkaniyan de hatine dayîn û wêneyên destxetên kilamên Sîzer ên ku di malperên înternetê nînin jî di pêvekê de hatine nîşandan. Kilamên ku destxetên wan hatine dayîn hîn weke kilaman nehatine stran, Sîzer dixwaze ku wan jî di albûmên nû de bistrê. Kilamên "Bêrî Bêrî, Ya Elî, Axîn, Delîl, Dewrêşane û Dem Bû Dem" di albûma nû ya Elî Sîzer de cih digirin û ev albûm di destê me de jî heye. Lê ji ber ku ev albûm, hîn nehatiye belavkirin destxetên kilaman hatine dayîn. Du kilamên Sîzer, bi navên "Dîlber" û "Berfa Bêqirar" di malperên înternetê de hene, lê ji ber ku "Dîlber" bi şêweyê dengbêjiyê hatiye gotin û kilama "Berfa Bê Qirar" ne li ser Elewîtiyê ye di vê lêkolînê de cih negirtine.

Astengî û Awantaj

Astengiya herî mezin a vê lêkolînê diyarkirina çarçoveya Elewîtiyê bû. Weke ku tê zanîn Elewîtî navekî sîwanî ye û ji bo çend komên ciyawaz tê bikaranîn. Wextê ku qala Bektaşiyan jî tê kirin navê Elewî tê bikaranîn û wextê ku qala Qizilbaş, Nûseyrî, Çepnî û hwd. tê kirin jî. Dîsa kêmbûna xebatên li ser Kurdên Elewî, alîgiriya xebatan heyî û tunebûna xebatên bi zimanê Kurdî di maweyê lêkolînê de zehmetî derdixistin.

Awantaja herî mezin a vê lêkolînê ev bû ku jêder, Elî Sîzer, sax e. Xeyn ji hevpeyvînên ku pê re hatine kirin, çi wextê ku gotineke kilamekê nedihate fêhmkirin an jî tiştek di serê me de zelal nedibû bi dildarî alîkarî dikir. Herwiha piştî ku kilam hatine nivîsîn, tevên kilaman pê re hatine kontrolkirin bi saya vê yekê rê li ber şaşiyan hatiye girtin. Dîsa ji bo vê xebatê çavkaniyên bi zimanên Îngilîzî, Farisî û Tirkî hatine xwendin, vê yekê rê li ber berawirdkirina nêrînên cuda vekiriye.

Bijartina Çavkaniyan û Helwesta Me

Me, di çarçoveya vê lêkolînê de hewl da ku em him çavkaniyên nivîskî bixwînin û him jî xwe bigihînin civaka Kurdên Elewî. Di xwendina çavkaniyan de hewla me ya sereke ev bû ku em xwe nêzîkî ti nêrînan hîs nekin û heta ku em karibin em rê bidine nêrînên ciyawaz. Helbet, herkes xwedan nêrîn e, lê me hewl da ku em

nêrînên xwe yên şexsî tevlî vê xebatê nekin û ji angaştên bê çavkanî dûr bikevin. Me, berhemên ji zimanên Îngilîzî, Farsî û Tirkî yên ku di wan de nêrînên cuda dihatine temsîlkirin xwendin û ev nêrîn dane ber hev. Bi rêya vê yekê, me hewlên ku Elewîtiyê nêzîkî Mesîhîtiyê, Sunîtiyê, Şiîtiyê dikin; angaştên ku Elewîtiyê ji van baweriya kevnartir û çavkaniyan van baweriyan nîşan didin jî anîne zimên û herwiha me dîmenen gelek ayînên cemê, dîmenên hevpeyvînên bi Sîzer re qeydkirin û cih da çavdêriyên xwe. Bi saya van, me şiyana berawirdkirina Elewîtiya ku di çavkaniyên nivîskî de heye û ya ku di pratîka Kurdên Elewî de heye peyde kir.

Di xwendinên ku me li ser mijara lêkolînê de kirin tiştekî ku pir derdikete ber çavan ev bû ku gelek xebat gelekî dişibiyane hev. Mixabin, gelek kesên ku li ser mijara Elewîtiyê dixebitin ji rastiyên civakê bi wê de, cih didine hinek nêrînên ku xwe nêzîkî wan hîs dikin û herwiha gelek angaştên bê çavkanî jî tînine zimên. Hewla me, berovajiyê vê yekê nîşandana nêrînên cuda û rastiyên civaka Elewî bû. Dîsa, me hewl da ku em nêrînên xwe yên şexsî weke rastiyên vê civakê nîşan nedin.

Naveroka Lêkolînê

Ev xebat; ji pêşgotin, destpêk û sê beşan pêk tê. Di beşa ewil a vê xebatê de, berê di heqê wateya navê Elewî, tekiliya Elî û Elewîtiyê û dîroka Elewîtiyê, paşê jî di heqê baweriya Elewitiyê de agahî hatine dayîn û li ser van mijaran nêrinên cuda hatine nîşandan. Di beşa diduyan de qala jiyana Elî Sîzer hatiye kirin, kilamên wî hatine nivîsîn; kilamên wî ji aliyên teşe, naverok û şêwazê ve hatine şîrovekirin. Di beşa sisiyan de li gorî nêrîna Elî Sîzer qala baweriya Elewîtiyê hatiye kirin, di heqê jiyana kesên dîrokî ên ku di kilamên Sîzer de derbas dibin agahî hatine dayîn û hatiye îfadekirin bê van kesan di kilaman de bi çi şiklî cih girtine. Paşê hêmanên Elewitiyê yên weke kirasguhertinê, diwazdeh îmaman, destbiraktiyê, îqrardayînê û hwd. ên ku di baweriya Elewîtiyê de gelekî girîng in, di kilaman de hatine tespîtkirin û li gorî baweriya Elewîtiyê hatine şîrovekirin.

1. ELEWÎTÎ: NAV, DÎROK Û BAWERÎ

Dema ku qala baweriyekê tê kirin ji bo têgihiştina vê baweriyê divabe ku qala gelek hêman û têgehên vê baweriyê were kirin. Bi taybetî wextê ku mijar dibe Elewîtî nîqaş hîn ji navê vê baweriyê dest pê dikin, herwiha dîroka Elewiyan û mijarên bi baweriya wan re eleqedar jî mijarên nîqaşbir in. Dê di vê beşê li gorî çavkaniyên cuda bi rêzê di heqê navên Elewî û Qizilbaş, dîroka Elewîtiyê û naveroka baweriya Elewîtiyê de agahî bêne dayîn, ev agahî bêne nirxandin û berawirdkirin.

1.1. Wate û Dîroka Navên "Elewî û Qizilbaş"

Him wateya bêjeya Elewî, him dîroka bikaranîna vê bêjeyê û him jî navên hinek komên ku îro weke Elewî têne binavkirin mijarên ne zelal in û li ser van mijaran nîqaşên cûrbicûr hene. Di çavkaniyan de li ser mijara wateya bêjeya Elewî çend nêrînên cuda hene. Nêrîna sereke, vê bêjeyê bi binyata xelîfeyê çarem Elî û alîgirên wî re têkildar dike û nêrîna herî berbelav ev e; lê belê herçend ku ev nêrîn berbelav be jî hinek angaştên ku li derveyî vê nêrînê dimînin û lêkolînerên ku ji bo bêjeya Elewî hinek şîroveyên din jî dikin hene. Hinek ji nêrînên ku vê bêjeyê bi xelîfe Elî re têkildar dikin bi vî şiklî ne:

Elewî, anku ewladên Hz. Elî. Ev bêje tê wateya zarokên Hz. Elî yên ku ne ji Hz. Fatîmayê ne.[1] Elewî: "Malbata Elî, sifetê binyata Elî."[2] Li gorî wateya ferhengî Elewî tê wateya kesê ku di rêya Elî de ye û pê ve girêdayî ye. Elewîtî jî bi gelemperî hezkirina Hz. Elî û çûyîna di rêya malbata, Ehlê Beytê, wî de ye.[3]

Şîe, ji bo kesên ku baweriya wan bi îmameta Eliyê kurê Ebûtalib heye navekî giştî ye, di destpêkê de ji van kesan re gotine Şîeya Elî. Piştî xwiyabûna Rawendiyan

[1] Qiyasuddîn Mohemmed ibnî Celaluddîn ibnî Şerefuddînê Rahpûrî, *Qias-al-loqat,* ed. Mohammedê Dabirsyaghi, Cildê Dovvom, Çapxaneyê Gîlan, Tehran, 1242 (k.), r.94.
[2] Ebûlfezl Mohemmed Bin Beyheqî, *Tarîxê Beyheqî*, ed. Xelîlê Xetîbrehber, Cildê Dovvom, Çapxaneyê Aftab, 1381 (k.), r. 550.
[3] Ali Yaman, *Alevilik-Bektaşilik Cep Kitapları Dizisi 2, Alevilik Nedir?,* Şahkulu Sultan Külliyesi Hilmi Dedebaba Araştırma Eğitim ve Kültür Vakfı Yayınları, b.c, b.d., r.14.

anku şîeya Alê Ebas, ji bo ku aligirên Elî ji vê firqeyê cuda bêne nîşandan ji wan re Elewiye hatiye gotin.[4]

Di Ansîklopediya Îslamê de xala *Alide*yê bi şiklê "Kesên ji binyata Elî b. Ebûtalib" hatiye pênasekirin.[5]

Bêjeya Elewî ji navê Hz. Elî bi qertafa "î"yê hatiye çêkirin. Ev qertaf wateya aîdiyetê dide û wateya ku bi navê beriya xwe re têkildar e dide. Ji ber vê yekê bêjeya Elewî tê wateya kes an jî têgehên bi Elî re têkildar.[6]

Bêjeya Elewî tê wateya kesên ku ji binyata Elî ne. Lê di dîrok û tesewûfa Îslamê de Elewîtî bi wateya hezkirina Hz. Elî, rêzdayîna wî û di her mijarê de girêdana bi wî ve hatiye bikaranîn.[7]

Çawa ku ji malbata Ebasiyan re Ebasî, ji malbata Haşimiyan re Haşimî dihate gotin di destpêkê de ji binyata Elî re jî Elewî dihate gotin û bi firehbûna wateyê ev peyv ji bo alîgirên Elî hate bikaranîn.[8]

Navê Elewî, ji bo kesên ku Hz. Elî weke sehabeyê herî payebilind dibînin û qebûl dikin ku divabû piştî Hz. Muhemed ew bibûna îmam, bi "Şîa" re di heman wateyê de hatiye bikaranîn. Bi vî şiklî van koman, ji hezkirina Hz. Elî bi wê de, li ser navê wî û navê binyata wî berpirsiyariya siyasî ya partîbûneke cuda jî girtine ser milên xwe. Ji ber ve yekê ye ku ev civakên ku li ser navê hezkirina Hz. Elî û girêdana bi wî re derketine holê û paşê tevgereke civatbûna siyasî tercih kirine li

[4] Mohammedê Cevadê Meşkûr, *Tarîxê Şîe ve Firqehayê Îslamî*, Întîşaratê Îşraqî, Tehran, 1368 (k.), r. 149.
[5] H. A. R. Gibb, J. H. Kramers, E. Lêvi-Provençal, J. Schacht, *The Encyclopaedia of Islam*, Volume 1, E. J. Brill, Leiden, 1986, r.400.
[6] Sadullah Gülten, "Osmanlı Devleti'nde Alevî Sözcüğünün Kullanımına Dair Bazı Değerlendirmeler", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, hj. 11, Summer 2016, r.28.
[7] Ethem Ruhi Fığlalı, *Türkiye'de Alevilik Bektaşilik*, Selçuk Yayınları, İstanbul, 1994, r. 7.
[8] Atilla Özkırımlı, *Alevilik-Bektaşilik ve Edebiyatı*, Cem Yayınları, Ankara, 1985, r.10.

gorî tercihên xwe yên siyasî bi navên weke Zeydiye, Îsmaîliye, Îmamiye, Nusayriye û hwd. hatine binavkirin.[9]

Têgeha Elewî bi temamî ji bo kesên ku mensûbî Elî ne û ji koka wî tên tê bikaranîn. Lê piştre wateyeke taybettir girtiye û di wateya yên ku ji Elî hez dikin, yên ku di rêya wî de diçin hatiye bikaranîn. Ev term hîn bêhtir sedsala 19an berbelav bûye.[10]

Ev nêrînên ku heta niha hatine nîşandan, Elewîtiyê hîn zêdetir bi malbat û binyata Elî re têkildar dikin. Nêrînên ku ji bo koka bêjeya Elewî nokakiyên siyasî yên dema Elî ji wateya malbata Elî zêdetir derdixine pêş jî hene:

Têgeha "Elewî" di dîroka Îslamê ya siyasî de cara ewil di dema nakokiyên li ser xelîfetiyê de hatiye bikaranîn. Bi taybetî di nîqaşên ku piştî kuştina xelîfeyê sêyem Hz. Osman tund bûne de ji bo alîgirên Hz. Elî, li gel bêjeya Şîatu Elî têgeha Elewî jî hatiye bikaranîn.[11]

Piştî mirina pêxember Muhemed, ji kesên ku xwestine ku Elî bibe xelîfe, xelîfetiya wî pejirandine û paşê bûne endamên baweriya Şiî-Batinî re Elewî hatiye gotin. Wextê ku mirov ji vê hêlê ve lê dimeyzîne çawa ji binyata Ebasiyan re Ebasi, ji ya Haşimiyan re Haşimî dihate gotin ji binyata Elî re jî gotine Elewî. Lê bêjeya Elewî bi demê re wateya aligirên Elî jî hewandiye. Ji ber vê yekê, ne şaş e ku mirov bibêje Elewîtî di destpêkê de weke tevgereke siyasî bûye.[12]

Xeyn ji van nêrînên ku bêjeya Elewî rastrerast bi malbat û binyata Elî, hezkirina wî û alîgiriya wî re têkildar dikin, hinek lêkolînerên ku di heqê vê bêjeyê de angaştên gelekî cuda jî dikin hene. Bulut, dibêje: "Navê Elewî, piştî Elî bi

[9] Eyüp Baş, "Ahmed Yesevî'nin Bektaşîlik, Alevîlik Üzerindeki Etkileri ve Osmanlı Dini Hayatındaki İzleri", *Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 52:2(2011), r.35.
[10] Nesrin Sis-Mehmet Akif Çeçen, "Yaşayan Alevi Kültür Ve İnanışları Üzerine Bir Araştırma", *Journal of Turkish Language and Literature*, b. 2, hj. 1, Winter 2016, r. 414.
[11] Sayın Dalkıran, "Alevi Kimligi ve Anadolu Aleviligi Üzerine Bir Deneme", *Ekev Akademi Dergisi*, Yıl: 6 Sayı 10, (Kış 2002), r.97.
[12] Atilla Özkırımlı, *Alevilik Bektaşilik Toplumsal Bir Başkaldırının İdeolojisi*, Cem Yayınevi, İstanbul, 1996, rr.10-11.

sedsalan derketiye holê, çima nabe ku peyva Elewî ji peyva ‘alaw’ ya Farisî-Kurdî hatibe ku ‘alawî’ tê wateya kesên ku agirparêz in, dîsa navekî êgir ‘ar’ e, mijara ku peyva ‘arawî’ bi demê re bûbe Elewî hîn nehatiye lêkolînkirin.”[13]

Kutlu, bêjeya Elewî bi bêjeya alev-alaw re têkildar dike: “Koka têgeha Elewî ‘Alev’ (Elaw-Alaw) e, qertafa ‘î’ wateya aîdiyetê didiyê, ti eleqeya vê têgehê bi nêrîna dûrîaqilan a ku dibêje Elewî anku ‘mala-Elî’ re nîne. Em dizanin ku têgeha ‘alev’ê ji bo geşbûna êgir tê bikaranîn.”[14]

Çinar, ji bo wateya bêjeya Elewî şîroveyeke cuda dike û vê bêjeyê Luviyan re têkildar dike: “Bêjeya ‘Alevi’ îfadekirina bi Tirkî ya peyva ‘Aluvi’ ye û ku koka wê ‘Luvi’ ye. Tê wateya ‘Mirovê Ronahiyê.’[15] Xeyn ji ku Elewiyan û Luviyan - xwecihên erdnîgariya Elewiyan ên herî kevnar in - heman cih ji xwe re kiribine war û li heman perestgehan îbadetên xwe kiribin taybetiyeke zehfî girîng a ku bala me dikişîne ev e ku heman nav bi kar anîne. Koka bêjeya Luvî ‘lu’ yan jî ‘luw’ e. Di zimanê Luviyan de tê wateya şewq û ronahiyê.[16] Ku em ‘A’ya li serê bêjeya ‘Luvi’ îhmal nekin û binivîsin dê bêjeya ‘Aluvi’ derkeve holê. Pênasekirina Abdal Mûsa ya bi şiklê ‘Ronahî’yê û li axa Osmaniyan heta bi çarîka dawî ya sedsala şazdehan binavkirina Elewiyan a bi şiklê ‘Taîfeya Ronahiyê’ îhtimala ku bêjeya ‘Alevi’ ji ‘Aluvi’ya ku koka wê ‘Luvi’ ye hatibe zêde dike.[17] Wextê ku em vê yekê bibînin ihtimala ku ‘Alevi’ bi guherîneke biçûk a dengî ji ‘Aluvi’yê hatibe mîsoger dibe.”[18] Divê were îfadekirin ku ev nêrînên Bulut, Kutlu û Çinar nêrînên nû ne û ji bo van angaştan ti çavkaniyên kevn nînin. Ev nêrîn weke şiroveyên şexsî yên van kesan derdikevine holê herwiha di çavkaniyên ku ji aliyê dîrokî ve kevntir in de şîroveyên bi vî rengî cih nagirin. Şîroveyên li ser vê

[13] Faik Bulut, *Ali’siz Alevilik*, Berfin Yayınları, İstanbul, 2015, rr. 512-513.
[14] Haşim Kutlu, *Kızılbaş Alevilikte Yol Erkan Meydan*, Yurt Kitap-Yayın, Ankara, 2007, rr. 403-404.
[15] Erdoğan Çınar, *Dergah’ın Sırrı Aleviliğin Kayıp Hafızası*, Kalkedon Yayınları, İstanbul, 2012, rr. 63-64.
[16] *h.b.*, r. 60.
[17] Erdoğan Çınar, *Aleviliğin Kökleri Abdal Musa’nın Sırrı*, Kalkedon Yayınları, İstanbul, 2012, r. 51.
[18] *h.b.*, rr.51-52.

mijarê çiqasî ji hev cuda bin jî îhtîmala ku bêjeya Elewî ji malbat û alîgirên Elî hatibe bihêztir e.

Piştî ku nêrînên cuda yên li ser wateya bêjeya Elewî hatine nîşandan ku mirov li dîroka bikaranîna vî navî binêre dê mijar baştir were fêhmkirin. Weke ku li jorê amaje pê hate kirin bêjeya Elewî bêjeyeke kevn e û li gorî gelek lêkolîneran ev bêje xwe dispêre xelîfe Elî. Lê bikaranîna vê bêjeyê ji bo Elewiyên Kurd û Tirk mijareke binîqaş e. Li gorî gelek lêkolîneran, ev bêje ji bo Elewiyan dawiya sedsala nozdehan û destpêka sedsala bîstan hatiye bikaranîn. Hinek ji van nêrînan bi vî şiklî ne:
Ji aliyê dîrokî ve Elewî tê wateya kesên ku ji binemala Elî ne. Wextê ku ev nav li Îranê tê bikaranîn di wateya kevneşopî û mezhebekî Îslamê yê heterodoks de tê bikaranîn lê li Tirkiyeyê sedsala nozdehan derketiye holê.[19]

Herçend ku têgeha Elewî di bingeha xwe de têgeheke pir kevn be jî, tê wateyeke gelekî berfireh a ku qet eleqeya wê bi Elewîtiya li Tirkiyeyê re nîne, li cihên cuda û di demên cuda yên erdnîgariya Misilman de ji aliyê derdorên ku ti eleqeya wan bi Elewîtiya Tirkiyeyê re nîne di çarçoveyeke cuda de, bi wateya têkildarbûna bi binyata Elî re hatiye bikaranîn. Bikaranîna vê têgehê ya ji bo Elewîtiya Tirkiyeyê di demeke pir nêzîk, sedsala nozdehan, de ye.[20]

Bêjeya Elewî ji dawiya sedsala nozdehan û ji destpêka sedsala bîstan ve tê dîtin. Li gel ku him di lîteratura Osmaniyan de û him jî di ya Rojavayiyan de qet li vî navî nayê rasthatin ev nav bi Bektaşîtiyê re bi awayekî boş ketiye nav lîteratura Tirkan, ev rewş bê şik watedar e.[21]

[19] Irene Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları*, wer. Turan Alptekin, Cem Yayınevi, İstanbul, 1993, r.53.
[20] Ahmet Yaşar Ocak, "Babaîler İsyanından Kızılbaşlığa: Anadolu'da İslam Heterodoksisinin Doğuş ve Gelişim Tarihine Kısa Bir Bakış", *Belleten*, C. LXIV, 9, r. 133.
[21] Mehmet Bayrak, *Êzidî-Kızılbaş, Yaresan Kürtler- Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler*, Özge Yayınları, Ankara, 2014, rr. 13-14.

Elewîtî di Erebî de tê wateyên mensûbên Elî, têkildarên Elî. Ev peyv sedsala 19an derketiye holê. Elewîtî, herçiqasî di destpêkê de bi Şîayê re di heman wateyê de hatibe bikaranîn jî ji bilî çend xalên hevbeş aliyên wan ên şiba hev nemane, pêywendî û têkiliyên wan ji binî qut bûne û jev biyanî bûne.[22]

Têgeha Elewîtiyê, kurên Elî Îbn Talib ên ku dûndeya pêxember Muhemed in û şopînerên Îmam Elî ne îfade dikir. Ji sedsala nozdehan ve ji bo binavkirina civakên mîstîk ên ku li Anadolê û Balkanan dijîn navê Elewî hatiye bikaranîn. Navên wan ên berê Qizilbaş, Tahtacî, Abdal, Işik, Qelenderî û Bektaşî bûn. Ji bo binavkirina van koman bikaranîna navê Elewî tê wateya ku kesayeta Îmam Elî di nevanda fikrên van civakan de ye.[23]

Weke ku tê dîtin herçend ku bêjeya Elewî bêjeyeke kevn be jî bikaranîna vê bêjeyê ji bo hinek komên Elewî gelekî nû ye. Wextê ku mirov li navên komên Elewî yên Kurd û Tirk dinêre hîn zêdetir bêjeya Qizilbaş derdikeve holê. Li ser wate û destpêka bikaranîna vê bêjeyê jî dîsa lihevkirin nîne. Izady û Bayrak bêjeya Qizilbaş bi Mazdek û Xuramiyan re têkildar dikin. Li gorî agahiyên ku Arik, ji Izady girtine nîşaneya ku Mazdek û Xuramî kifş dikirin rengê sor bû ku di al û kincên xwe de bi kar dianîn. Ji bir vê yekê, di wateya kesên kincsor an jî kesên alsor ji wan re, Surkhjamagan dihate gotin. Ev nişane, sedsalên çardeh û pazdehan careke din derdikeve pêşiya me. Ji ber ku kumên wan sor bûn ji Elewiyan re Qizilbaş hatiye gotin.[24] Tê zanîn ku navê Qizilbaş Mazdek û Xuramiyan tê, van civakan lixwekirina cilên sor kiribûne kevneşopî û alên sor hildigirtin.[25] Dîsa nêrînên ku bêjeya Qizilbaş bi Elî û kurê wî Hiseyn re têkildar dikin hene: Dîroka Qizilbaşiyê xwe dispêre dîrokeke pir kevnar î ku heta bi Hz. Elî diçe. Di şerê Uhûdê de wextê ku Hz. Elî xwe ji Pêxember re kiriye mertal,

[22] İsmail Özmen, *Alevi-Bektaşi Şiirleri Antolojisi*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, b.1, 1998, r. 38.
[23] Fahimeh Mokhber Dezfouli, "Alevism-Bektashism From Seljuks to Ottomans and Safavids; A Historical Study", *Alevilik-Bektaşilik Araştırmaları Dergisi* / 2018 / 17, r.36.
[24] Arik, *Alevilik ve Tarihi*, r.72.
[25] Mehmet Bayrak, "İnanç ve Kültür Kaynaklarıyla Kürt Aleviliği", in Yalçın Çakmak-İmran Gürtaş, *Kızılbaşlık Alevilik Bektaşilik Tarih-Kimlik-İnanç-Ritüel,* İletişim Yayınları, İstanbul, 2016, r. 547.

xwîn ji serê wî hatiye û ji ber ku serê wî ji ber xwîne sor bûye ji Elî re Qizilbaş hatiye gotin. Ji yên ku jê hezkirina re jî gotine Qizilbaş.[26] Sedemeke ku navê dîrokî yê Elewiyan Qizilbaş e, serê Îmam Hiseyn î bixwîn e.[27] Lê divê were îfadekirin ku navê Qizilbaş hîn zêdetir bi Safewiyan re tê têkildarkirin û destpêka bikaranîna vî navî weke çaxê Şêx Heyder (m. 1488) tê nîşandan: Navê Qizilbaş wextê ku Şêx Heyderê kurê Cuneyd (m. 1460) xwestiye ku şopînerên wî kumekî gilover û bi diwazdeh çivaneyan, weke temsîla diwazdeh îmaman, bidine serê xwe derketiye holê.[28] Em zanin ku bêjeya Qizilbaş wextê bavê Şah Îsmaîl (m. 1524), Şêx Heyder derketiye holê.[29] Tê gotin ku wextê Şêx Heyder, şopînerên wî dev ji kumê Tirkmenan berdane û kumekî ku li dora wî diwazdeh çivaneyên sor hene dane serê xwe. Li gorî ku xwiya dike têgeha Qizilbaş a ku ji bo gelên Elewiyên gundî yên Asyaya Biçûk tê bikaranîn ji vir tê.[30] Melikoff jî dibêje ku ji aliyê zanistî ve bêjeya Elewî şaş e. Navê Elewiyan ê dîrokî Qizilbaş e. Sedsalên pazdeh û şazdehan Qizilbaşên ku Safewiyên ewil bûn êlên Tirkmen bûn. Kumekî sor didane serê xwe ji ber vê, navê wan Qizilbaş bû.[31] Nêrîneke din jî, ji aliyê Baha Saîd Bey ve hatiye îfadekirin. Wî, di gotara bi sernavê "Sureka Sûfiyan/Meydana Qizilbaşan" de ewil qala têgehên Sûfî, Sûfiyan kiriye û paşê gotiye ku Sûfî-Sûfiyan di nava Elewiyên Anadolê de Qizilbaş in û dîsa îfade kiriye ku ev nav ji bo ku ji wan re bi mebesta Safewiyan, Safewiye neyê gotin hatiye pejirandin.[32]

Dîsa li gorî hinek lêkolîneran di dokumentên berê de qala navê Elewî nîne û navê Qizilbaş navê herî kevn ê civaka Elewî ye: Wextê ku em li çavkaniyên herî kevn û di serî de li Dîwana Şah Îsmaîl binêrin em ê bibînin ku bêjeya Elewî qet nehatiye

[26] Rıza Algül, *Aleviliğin Sosyal Mücadeledeki Yeri*, Pencere Yayınları, İstanbul, 1996, r.27.
[27] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, *Alevi-Bektaşi İnancının Esasları*, DABF (Danimarka Alevi Birlikleri Federasyonu) Kendi Yayını, Danimarka, 2008, r. 34.
[28] Matti Moosa, *Extremist Shiites The Ghulat Sects*, Syracuse Universty Press, New York, 1987, r.36.
[29] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları,* r.54.
[30] John Kigsley Birge, *Bektaşilik Tarihi*, Wer. Reha Çamuroğlu, Ant Yayınları, İstanbul, 1991, r.73
[31] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları*, r.33.
[32] Baha Said Bey, *Türkiye'de Alevi-Bektaşi, Ahi ve Nusayri Zümreleri*, amd. İsmail Görkem, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 2000, rr.37-38.

bikaranîn. Wextê ku Şah Îsmaîl xwe û alîgirên xwe bi nav dike bêjeya Qizilbaş bi kar tîne.[33] Di belgeyên ku Ehmed Refîq çap kirine de yek cara bi tenê jî navê Elewî derbas nabe. Her car navên Qizilbaş, Rafizî û Mulhîd hatine bikaranîn.[34]

Karolewski jî dibêje ku navê Elewî yê ku îro ji bo pênasekirina kom/komên vê baweriyê tê bikaranîn navekî gelekî modern e. Heta bi dawiya sedsala nozdehan ev nav nedihate bikaranîn. Ji dawiya sedsala nozdehan û bi vê de, ev nav hate bikaranîn û kesên ku ne Elewî jî bûn hêdî hêdî ev nav pejirandin. Pênaseya Elewiyan a dîrokî Qizilbaş bû.[35] Navê Qizilbaş ji dawiye sedsalan nozdehan pê ve cihê xwe hêdî hêdî ji navê Elewî re dihêle û weke ku Melikoff angaşt dike, berdêla navê Elewî ya dîrokî nîne. [36]

Herçiqasî ku navê Elewî ji navê Qizilbaş kevntir be jî tê dîtin ku ji bo Elewiyên Kurd û Tirk bêjeya bikaranîna navê Qizilbaş ji bikaranîna navê Elewî kevntir e. Lê îro ji bo van her du civakan jî navê Elewî zêdetir tê bikaranîn. Wî çaxî dikare were gotin ku civaka Elewî ya li Kurdistanê û Tirkiyeyê piştî dawiya sedsala nozdehan hêdî hêdî dev ji navê Qizilbaş[37] berdane û hîn zêdetir navê Elewî bi kar anîne. Helbet, divê ji bo rûdaneke wilo hinek sedem hebin. Sedemên ku navê Qizilbaş hêdî hêdî cihê xwe ji navê Elewî re hiştiye ji aliyê hinek lêkolîneran ve bi vî rengî hatine îfadekirin:

Têgeha Qizilbaş, sedsala pazdehan di dokumentên Osmaniyan de bi şiklê "Zindiq, Xaricî, Mulhîd, Rafizî, Ehlî Bidat, Torlak, Işik, Bedredînî" cih digire.[38] Navê Elewiyan ê dîrokî Qizilbaş e lê di nava sedsalan de ev nav ketiye şiklekî neçê û ji ber serhildanên Celaliyan di wateyên serhildêr, bêdîn de hatiye bikaranîn. Ji ber

[33] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları*, r.54.
[34] *h.b.*, r.55.
[35] Janina Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", *Die Welt des Islams, New Series*, Vol. 48, Issue 3/4, The Dynamics of Orthodoxy and Heterodoxy in Islam (2008), r.438.
[36] Hasan Onat, "Kızılbaş Farklılaşması Üzerine", http://www.hasanonat.net/index.php/101-k-z-lbasl-k-farkl-lasmas-uezerine-2, (d.g., 08.01.2020).
[37] Ji Elewiyan Tirk hîn bêhtir navê Bektaşî tê bikaranîn. Lê yên ku weke Qizilbaş têne binavkirin jî hene.
[38] Selahhattin Ali Arik, *Alevilik ve Tarihi*, Dara Yayınları, İstanbul, 2019, r.72.

vê ye ku navê Qizilbaş cihê xwe daye navê Elewî.[39] Navê Qizilbaş di dokumentên Osmaniyan de di wateyên zindiq, rafizî, jirêderketî de hate bikaranîn. Bi çûyîna zemên re, ev wateyên neçê bihêztir bûn û Qizilbaş hate wateya serhildêr, zindiq, paşê wateya Kurd jî li vî navî zêde bû. Ji ber van wateyên xerab navê Qizilbaş hêdî hêdî cihê xwe da bêjeya Elewî.[40]

Em dibînin ku têgeha Elewî ji bo binavkirina Qizilbaşan û tewr ji bo biçûkkirina wan, ji aliyê şerîetvanên İslamê û Mesîhîtiyê ve hatiye gotin. Şerîetvanên van her du baweriyan ji bo Qizilbaşan, di wateya kesên agirperest de navê "Alev-î" bi kar anîne û endamên vê baweriyê -yên ku naçar in nasnameya xwe veşêrin- xwe bi şiklê "Rast e, em Elewî ne çimkî em ji mala Elî ne" pênase kirine û ev nav hêdî hêdî hatiye qebûlkirin.[41]

Bêjeye Elewî ya ku ji bo kesên ku ji binyata Hz. Elî tên dihate bikaranîn di dema têkoşîna ji bo xelîfetiyê de ji bo alîgirên Hz. Elî hatiye bikaranîn. Bi demê re komên ku ti eleqeya wan bi Hz. Elî re nîne jî ji bo ku bandora komên xwe zêde bikin xwe weke Elewî bi nav kirine. Tê pejirandin ku di dema Osmaniyan de komên ku bi navê Qizilbaş dihatine zanîn ji ber ku ev nav dihate wateyên bêdîn, îsyankar ji sedsala nozdehan û bi vê de dev ji navê Qizilbaş berdan û navê Elewî pejirandin.[42]

Navê Elewî navekî zehfî nû ye, li Tirkiyeyê ji bo hinek komên ku Elîperest in û rasterast têkiliya wan bi hev re nîne tê bikaranîn. Navê Kurdên Elewî û gelek Tirkên Elewî yê berê, Qizilbaş, hîn jî ji holê ranebûye lê ji ber ku têgeheke ku di

[39] Elif Gül Akman, *Onaltıncı Asır Osmanlı Toplumunda Bellibaşlı Kızılbaş İsyanları*, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 2008, r.13.
[40] İrene Melikoff, *Hecî Bektaş Efsaneden Gerçeğe*, Çeviri Turan Alptekin, Cumhuriyet Kitapları, İstanbul, 2010, r.227.
[41] Haşim Kutlu, *Kızılbaş Alevilikte Yol Erkan Meydan*, Yurt Kitap-Yayın, Ankara, 2007, r. 401.
[42] Sadullah Gülten, "Osmanlı Devleti'nde Alevî Sözcüğünün Kullanımına Dair Bazı Değerlendirmeler", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, hj. 11, Summer 2016, r.27.

wateyên neçê de dihate bikaranîn bû gelek kesên ku endamên vê baweriyê ne, ev nav red kirin.[43]

Bêjeya Qizilbaş di nava sedsalan de bûye xwedan wateyeke neçê. Ji ber serhildanên dinî-civakî yên Celalî ev peyv di wateyên bêdîn, serhildêr de hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê bêjeya Elewî hêdî hêdî cihê bêjeya Qizilbaş girtiye. [44]

Ji aliyê gelek lêkolîneran ve hatiye îfadekirin ku navê dîrokî yê çend komên baweriyê yên ku îro weke Elewîtiya Anadolê têne binavkirin Qizilbaş e, gelek lêkolîneran ji ber wateyên neyînî ku bi demê re li Qizilbaşiyê hatine barkirin dest pê kirine ku navê Elewîtiya Anadolê bi kar bînin.[45]

Ji sedsala 19an ve Osmaniyan di dema têkoşîna Osmanî-Safewiyan de navê Qizilbaş di wateya komên muxalifên dewletê û îsyankar de bi kar anîne û bi çûyîna zemên re wateyeke dînî li vî navî hatiye zêdekirin, di wateyên zindiq, mulhîd, rafizî de hatiye bikaranîn û sedsala 19an vî navî cihê xwe ji navê Elewî re berdaye.[46]

Wextê ku mirov li şîroveyên jorê yên ku li ser navê Elewîtiyê û dîroka bikaranîna vê bêjeyê dinêre bi awayekî zelal kifş dibe ku Elewîtî navekî kevn e û di wextê xelîfe Elî de ji bo malbata wî hatiye bikaranîn. Piştre ev nav, di wateyeke berfirehtir de ji bo alîgirên Elî hatiye bikaranîn lê bikaranîna navê Elewî ji bo civakên ku îro weke Elewî têne binavkirin tiştekî nû ye. Herçend ku Elewî ji yek koma homojen pêk newin jî îro ev nav bûye navekî sîwanî. Ev nav, ji aliyê gelek komên cuda ve tê bikaranîn. Dîsa tê dîtin ku civaka ku navê wê ji dema Safewiyan ve Qizilbaş bû hêdî hêdî dev ji vî navî berdaye. Di vê rûdanê de rola Osmaniyan û civaka Osmanî yî ku piraniya wê Sunî bû zêde ye. Navê Qizilbaş, di wateyên pir

[43] Martin Van Bruinessen, "Religion in Kurdistan", *Kurdish Times (New York),* vol.4, nos. 1-2 (1991), r.10.
[44] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları*, r. 33.
[45] Doğan Kaplan, "Aleviliğin Yazılı Kaynaklarından Buyruklar ve Muhtevaları Üzerine -Bir İçerik Çözümleme Denemesi-", I.Uluslararası Bektaşilik ve Alevilik Sempozyumu'nda Sunulan Bildiri*, SDÜ İlahiyat Fakültesi*, 28–30 Eylül, Isparta, 2005, r.1.
[46] Gülten, "Osmanlı Devleti'nde Alevî Sözcüğünün Kullanımına Dair Bazı Değerlendirmeler", rr.28-29.

xerab de dihate bikaranîn û heqaretên dijwar li wan dihatine kirin. Ji ber van kirinan, Qizilbaşan hêdî hêdî ji ber navê xwe fihêt kirin û navekî nû pejirandin. Lê divê were îfadekirin ku di pejirandina navê Elewî de rola dewleta Osmanî û Tirkiyeyê jî heye. Rêvebirên van dewletan xwestine/dixwazin ku Elewîtiyê nêzîkî Sunîtiyê bikin û bi rêya vî navî têkiliya vê baweriyê û fîgurên Îslamî zêdetir bikin. Heman tişt li ser Êzîdiyan jî hatiye kirin dixwazin ku peyva Êzîdî bi Yezîd bin Muaviye re têkildar bikin.[47] Herwiha, ji bo Yarsanan jî bi heman şiklî navê Ehlî Heq tê bikaranîn. Xwiya ye ku ev hewl bi heman armancê ne û tê xwestin ku nasnameyeke/bingeheke nû ji van baweriyan re were çêkirin

1.2. Elî, Têkiliya Elî û Elewîtiyê

Wextê ku qala têkiliya Elî û Elewîtiyê tê kirin du nêrînên sereke derdikevine pêş. Nêrînek, Elewîtiyê rasterast bi xelîfe Elî re têkildar dike lê nêrîna din angaşt dike ku ti eleqeya Elî û Elewitiyê bi hev re nîne herwiha nakokiyên li ser xelîfetiyê pirsgirêkên Şiî û Suniyan in, eleqeya Elewiyan bi van mijaran re nîne. Lê belê beriya ku qala van mijaran were kirin ku di heqê kesayeta Elî de hinek agahî bêne dayîn dê ev yek, ji bo têgihiştina têkiliya Elî û Elewitiyê baştir bibe. Elî; yek ji Misilmanên ewil e, wextê ku Muhemed banga Îslamê kiriye ji mêran ewil Elî, ji jinan Xedîce ji pêxember bawer kirine û îman pê anîne. Şiiyên ekstremîst hinek derhozeyan etfî Elî dikin ku tenê benîxweda karibin van tiştan bikin. Li gorî wan, Elî ji zarokiya xwe ve kesekî nuwaze bû. Bi gelemperî, tevlî peyrewên Diwazdeh Îmaman derhozeyên Elî ji pileya mirovê super (superhuman) heta bi xwedayekî dikine rêz. Di rastiyê de ew, bûna Elî weke derhozeyekê dibînin.[48] Bi taybetî jiyana Elî zehfî çalak xwiya dike. Di ciwanbûna wî de avabûna Îslamê û rola wî, li Mekihê û Medîneyê têkiliyên wî û Muhemed, bikêrhatina wî ya şer, aliyê wî yê arişî, malbata wî, ji bo xelîfetiya Pêxember piştguhkirina wî, têkiliyên wî bi her sê xelîfeyên ewil re, serdariya wî yî kurt, şerê navxweyî yê bênavber û hwd. Ev

[47] h.g., 547.
[48] Moosa, *Extremist Shiites The Ghulat Sects*, r.66.

hemû di çavkaniyên Îslamî de nîşaneyên kesê herî payebilind û rengîn in.[49] Herwiha wextê ku qala Elî tê kirin yek ji tiştên ku ewil tê hişê însên şervaniya wî ye û dîsa têkoşîna ku di dema avabûna Îslamê de ji bo berbelavbûna Îslamê kiriye û wêrekiya wî, di gelek çavkaniyan de cih digirin. Lehengiya Elî ya di şerê Îslamê de wilqasî efsanewî ye ku çi jê hez bike çi jê hez neke, divê her kes heyranê vê lehengiya wî be.[50] Elî, di tevên şerên ji bo Îslamê de weke şervanê herî bihêz derketiye pêş. Di şerê Bedirê de heftê kes hatine kuştin, sih-sih û pênc heb ji wan bi destê Elî hatine kuştin. Di Şerê Uhûdê de dîsa kesê ku darî çavan e ew e. Di şerê Xendekê de Amrê kurê Ebdû Wed, şervanekî zehfî jîr bûye, xwestiye ku yek ji artêşa Muhemed derkeve qadê û pê re şer bike. Xeyn ji Elî kesî negotiye ez ê derkevim. Elî xwestiye ku pê re şer bike. Çend caran Muhemed destûr nedayê. Paşê ew şandiye şerê Amr. Amr nexwestiye ku pê re şer bike. Gotiye ez naxwazim te bikujim ji ber ku bavên me heval bûn lê Elî gotiye ez ê te bikujim. Wextê ku Amr kuştiye gotiye "Alahu Ekber" û serê Amr jê kiriye aniye ji Muhemed re.[51] Di bidestxistina Keleha Hayberê de kesê pêşeng dîsa ew e. Di şerê Zatu's Selasilê de gelek kes kuştine. Di bidestxistina Mekihê de zehf bandora wî çêbûye.[52] Di şerê Huneynê de piştî ku Cervel kuştiye pişta dijmin şikestiye û Elî di vî şerî de 40 kes kuştiye.[53] Elî, bes tevlî Şerê Tebûkê nebûye. Pêxember ew li Medîneyê hiştiye, wî qebûl nekiriye xwestiye ku here şer lê Pêxember xwestiye ku ji bo pergala bajêr xera nebe bimîne û ew qani kiriye.[54] Kesê ku Peymana Hudeybiyeyê dinivîsand Elî bû. Li binê peymanê qasidê Xwedê Muhemed nivîsand Suheyl ev bernavk qebûl nekir. Muhemmed, ji Elî re got: "Wî bernavkî jê bibe, Muhemedê kurê Evdila binivîse". Elî ev qebûl nekir. Got: "Bernavkê ku Xwedê dabe ez ê çawa jê bibim?" Muhemed rabû bi destê xwe jê bir.[55]

---

[49] Mohammad Ali Amir-Moezzi, *The Spirituality of Shiʿi Islam Beliefs and Practices*, I.B.Tauris Publishers, London, 2011, r.12.
[50] Leyla İlkay Özsüer, *Abdülbaki Gölpınarlı'nın Eserlerinde Hz. Ali Tasavvuru: Kaynakları ve Etkileri*, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, 2006, r.30.
[51] Abdülbaki Gölpınarlı, *Müminlerin Emiri Hz. Ali (A. M.)*, Der Yayınları, İstanbul, 1990, rr. 25-32.
[52] *h.b.*, rr. 38-42.
[53] *h.b.*, r.47.
[54] Özsüer, *Abdülbaki Gölpınarlı'nın Eserlerinde Hz. Ali Tasavvuru: Kaynakları ve Etkileri*, r.38.
[55] Gölpınarlı, *Müminlerin Emiri Hz. Ali (A. M.)*, r.37.

Li gorî Bulut, Elî ji bo ku Îslamê biparêze bi kesên ku heqê wî yê xelîfetiyê parastine û weke Xariciyan têne naskirin jî şer kiriye. "Muxelefa li dijî Osman-Muawiye ji komên cûrbicûr û kesên ku hatine çewisandin pêk hatiye û ev kom weke kesekî ku heqê wî hatibe xwarin û neheqî lê hatibe kirin li dora Elî civiyane lê armanca wan ne biserketina Elî ye, wan xwestiye ku bi rêya Elî, doza xwe ya hukimraniyê bibine serî lê Elî li dijî van komên muxalif sekiniye û Îslam parastiye. Yek ji van koman, koma bi navê Xariciyan e, tê zanîn ku Elî bi Xariciyan re li herêma Harura-Nehravanê şer kiriye û dora 6000 kesî daye kuştin."[56] Bulut, dîsa îfade dike ku Elî, Xaricî di çalên êgir de şewitandine û li ser navê Îslamê rêya karwanan biriye: "Elî; Rafiziyên ku muxalifên ewil in, an di çalên êgir de şewitandine yan jî dane kuştin.[57] Di serê yên ku li ser navê Îslamê rêya karwanan dibirîn û malên xenîmet ji wan distandin de Elî tê."[58]

Elî; xeyn ji şervaniya xwe, gelek caran bi zanebûna xwe derdikeve pêş. Herwiha tê dîtin ku tevlî nakokiyên li ser xelîfetiyê nebûye û bi xelîfeyên beriya xwe, bi taybetî bi Omer û Osman re, têkiliyên baş ava kirine. Hz. Elî yek ji kesên ku herî baş zanîbû bi Quranê bû û bi ihtîmaleke zêde kesê ku herî baş zanîbû ew bû. Li gel Îbnî Ebas li Kûfeyê gelek alim perwerde kirine. Hewleke pir zedê daye da ku mirovan hînî kelama Xwedê û sineta Pêxember bike. Ji pênc saliya xwe ve li cem Pêxember bûye û heta bi mirina wî jê neqetiyaye. Wextê ku ev rewş bi exlaqê wî yî xweş û jîriya wî re bûye yek, otorîteyeke Quran û sinetê derketiye holê.[59]

Hz. Ebûbekir û Elî rêz ji hev re girtine, Elî di her mijarê de alîkariya Ebûbekir kiriye[60] û keça xwe daye Hz. Omer.[61] Ti hizr û fikra Elî xeyn ku İslamiyet mezin bibe û kokên xwe qehîm bike nîn bû. Ji bo wî qet ferq nedikir bê kî dibû xelîfe. Wextê ku piştî Ebûbekir, Omer bû xelîfe dîsa dengê xwe nekir.[62]

[56] Bulut, *Ali'siz Alevilik*, r. 298.
[57] Bulut, *Ali'siz Alevilik*, r.258.
[58] *h.b.*,r. 145.
[59] Özsüer, *Abdülbaki Gölpınarlı'nın Eserlerinde Hz. Ali Tasavvuru: Kaynakları ve Etkileri*, r.80.
[60] *h.b.*, r.84.
[61] *h.b.*, r.89.
[62] Murtaza Dinçer, *Alevi-Sünnî Ayırımının Tarihsel Nedenleri*, Evren Matbaası, Ankara, 1990, r.8.

Wextê ku agahiya şehîdkirina xelîfe Osman di nava Misilmanan de belav bû nîqaşên ji bo xelîfetiyê dest pê kirin. Piştî Osmên, êdî kesekî hêzdar nebû ku Elî berberiyê pê re bike. Elî digot piştî van her sê xelîfeyan ez kesekî ji xwe layîqtirî xelîfetiyê nabînim. Hinek komên Misilman dihatine cemê û digotin qebûl bike em te weke xelîfe bihebînin, wî jî dixwest ku bisekinin heta ku komên din ên Misilman û xelkê Bedrê jî bipejirînin. Tê dîtin ku Elî xwestiye bi piştgiriya sehabeyên pêşeng bibe xelîfe.[63] Ensar û Mihacir lev civiyan, hatin cem Elî û gotin: "Em bîatî te bikin?" Elî got: "Ne şert e ku hûn min hilbijêrin, hûn kê bixwazin min qebûl e."[64] Li gorî angaştekê, piştî mirina Osmên wextê ku gel hatiye cem Elî û xwestiye ku bibe xelîfe wî qebûl nekiriye. Gotiye dev ji min berdin yekî din bibînin. Lê ji ber israra wan, Elî naçar maye ku xelîfetiyê bipejirîne.[65]

Ev şexsiyetê ku ji Misilmanên ewil e û ji bo berbelavbûna Îslamê têkoşiyaye îro di cîhana Îslamê de kesekî ku gelek nîqaş li serê têne kirin e û nîqaşên li ser vî kesî îro di cudabûna du mezhebên Îslamê yên mezin de nîqaşên bingehîn in. Hîn wextê ku Elî û sehabeyên Pêxember bi şûştin û veşartina wî re serqal bûn, komek ji Ensar, civiyabû û ev kom bi diyarkirina xelîfeyê Muhemed re mijûl bû.[66] Bê dê kî xelîfeyê Muhemed be di Îslama Şiî de pirsa sereke ye û di cudabuna Şiî û Suniyan de hêmana sereke ye. Lê pirs ne bes kîbûna xelîfe ye, mîsyonên vî xelîfeyî jî sedemên lihevnekirinên di navbera Şiî û Suniyan de ne.[67] Li gorî Suniyan, Elî xelîfeyê çarem e lê li gorî Şiiyan xelîfebûna wî bi paş ketiye. Li gorî wan, Pêxember wextê ku sax e zava û pismamê xwe, Elî, weke xelîfeyê xwe diyar kiriye.[68] Herwiha armanca sereke ya mîracê ev e ku Elî weke xelîfeyê Muhemed were hişkerekirin. Li mîracê, Muhemed ji Cebraîl pirsiye bê dê kî xelîfeyê wî be,

[63] Ahmet Akbulut, *Sahabe Dönemi İktidar Kavgası Alevi Sünni Ayrışmasının Arka Planı*, Otto Yayın, Ankara 2017, r.168.
[64] *h.b.*, r.169.
[65] Gölpınarlı, *Müminlerin Emiri Hz. Ali (A. M.)*, rr.77-78.
[66] Muhemed Kazimê Xacûyan, *Tarîxê Teşeyu'*, Inîşaratê Cîhadê Danîşgahê Meşhed, Meşhed, 1376 (k.), r.11.
[67] Moojan Momen, *An İntroduction to Shi'i İslam The History and Doctrines of Twelver Shi'ism*, Yale Universty Press, London, 1985, r.11.
[68] Heinz Halm, *Teşeyyu'*, wer. Mohammed Tahgi Akbari, Neşriyatê Adyan, Qûm, 1384(k.), rr.27-28.

wî jî gotiye ku ev kes, Eliyê kurê Ebûtalib e.[69] Di cudabûna Şiî û Suniyan de Kîbûna xelîfeyê Muhemed û misyonên wî, pirsên bingehîn in. Xeyn ji pirsa xelîfetiyê nîqaşên li ser Quranê jî di navbera wan de hene. Piştî ku Elî nivîsandina Quranê xelas kiriye, ew nîşanî gel daye û gotiye ku ev Quran orîjînal e û çawa ji Muhemed re hatiye bi wî şiklî ye lê wan gotine jixwe va ye Quran heye bi me re û Qurana ku Elî nivîsiye qebûl nekirine. Elî jî gotiye min peywira xwe anî cih, êdî hûn Qurana orîjînal nabînin.[70] Ji ber van nêrînên cuda yên Şiî û Suniyan ên li ser pirsa xelîfetiyê û Quranê, cihê Elî jî li cem endamên van mezheban diguhere. Ji bo Misilmanên Sunî, Elî xelîfeyê çarem e û di mijara xelîfetiyê pirsgirêk nîne. Lê Misilmanên Şiî di vê baweriyê de ne ku di mijara xelîfetiyê neheqî li Elî hatiye kirin û divabû ku xelîfeyê Pêxember Elî bûna. Şiîtî, Elî dixe cihekî gelekî taybet û dixwaze ku bigihe kesayeta mînak a Eliyê ku kesayetekî dîndar û munzewî ye.[71]

Weke ku tê dîtin, begoman pirsa kîbûna xelîfeyê Muhemed di cudabûna Şiî û Suniyan de pirsa sereke ye. Lê wextê ku mijar tê ser Elewiyan jî Elî dibe yek ji mijarên nîqaşbir. Pêwendiya navê Elewî bi Elî re û cihê Elî di baweriya Elewîtiyê de du pirsên sereke ne. Li jorê qala pêwendiya nave Elewî bi Elî re hatibû kirin, dîsa qala kesayeta Elî û rola wî di berbelavbûna Îslamê hatibû kirin. Helbet wextê Elî, komeke baweriyê ya weke Elewîtiya niha û ku bi navê Elewî dihate binavkirin nebû. Lê îro navên çend komên ku ji hinek aliyan ve dişibine hev û ji hinek aliyan ve jev vediqetin Elewî ye. Pêwendiya Elî bi Elewiyên Kurd û Tirk re îro gelekî tê nîqaşkirin. Kesên ku Elewîtiyê bi Misilmantiyê, bi taybetî jî bi Siîtiyê re têkildar dikin Elewiyan rasterast dikine aliyekî pirsgirêka xelîfetiyê û wan li aliyê Şiiyan anku di pozîsyoneke ku dibêjin ku Elî rêberê me ye û neheqî lê hatiye kirin de nîşan didin. Lê divê were îfadekirin ku nêrînên li dijî vê yekê jî hene û kesên ku di navbera Elewîtiyê û Elî de ti eleqeyê nabînin jî hene.

[69] Mohammad Ali Amir-Moezzi, *Teşeyu'Rîşeha ve Baverîhayê Îrfanî,* wer. Nureldînê Elahdînî, Namek, Tehran, 1393 (k.), r.210.
[70] Mohammad Ali Amir-Moezzi, *The Divine Guide in Early Shi'ism The Sources of Esotericism in Islam*, wer. David Streight, State University of New York Press, New York, 1994, r.82.
[71] Hamid Dabashi, *Shi'ism A Religion of Protest*, The Belknap Press of Harvard University Press, London, 2011, r.71.

Koçoglu dibêje: "Di berhêmên ku pêşikiya wan a dîrokî heye -berhemên weke Makâlât û Tefsîra Besmeleyê[72]- de hema bêje Hz. Elî qet cih nagire lê di şîroveyên ku aîdî demên piştretir de ne, car caran li derveyî dem û cihên rasteqîn wesfandinên cuda ên Hz. Elî derdikevine holê."[73] Li gorî Bulut jî, hizra Elewîtiyê ji destpêkê heta bi roja me bi Elî û Ehlî Beytê re ne têkildar e. Elewîtiyê bêyî Elî -Elî yekî ortodoks e- dest pê kiriye.[74]

Dîsa li gorî Bulut têkiliya Elewîtiyê û Elî têkiliyeke çêkirî ye herwiha Elî komên ku li ser navê wî muxalefeta Îslamê kirine şewitandine: "Elewîtî bi rêya Caferîtiyê bi Elî û Îslamê re hatiye têkildarkirin lê têkiliya Elewîtî û Îslamê ji rastiyeke dîrokî zêdetir hewla îdeolojiya nijadperest-umetparêz, dewlet û Îslama Sunî ya mêjîşûştinê ye herwiha di navbera Elî û Elewîtiyê de têkiliyeke rasterast nîne û komên ewil yên ku navê Elî bi kar anîne û li dijî Îslamê derketine qada siyasetê ji aliyê Elî ve di çalên êgir de hatine şewitandin, ti rola Elî di avabûna Elewîtiyê de nîne."[75]

Çinar jî dibêje ku mirov li jiyana Elî û diwazdeh îmam meyzîne ne mimkun e ku ew pêşengê vê baweriyê bin: "Wextê ku di serî de Elî, ji devê diwazdeh îmaman di heqê Elewîtiyê de yek gotina biçûk jî derneketibe, di tiştên ku nivîsandine de Elewîtî nebe û van kesayetên navdar ên Îslamê jiyana xwe weke Elewiyekî bi rê ve nebiribin em ê çawa wan weke avakerên rêya Elewîtiyê qebûl bikin. Em ê vê qebûla dûrîaqilan bi kîjan daneyên zanistî bipeyitînin. Ev angaşta bêkok, destpêkê ji aliyê Elewiyan ve bi armanca xweveşartinê û xweparastinê hate derxistin. Lê heman angaşt îro ji aliyê komên ku bi bişavtina Elewiyan erkdar in ve weke delîlekê tê parastin û dikin ku vê angaştê bi kar bînin."[76]

[72] Ev du berhem bo Hecî Bektaşî Welî têne îstinadkirin.
[73] Kıyasettin Koçoğlu, "Türkiye Diyanet Vakfı Tarafından Yayımlanan Alevî-Bektaşî Klâsiklerinde Hz. Ali", *Çukurova Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi,* 12 (1), 2012, r. 96.
[74] Bulut, *Ali'siz Alevilik*, rr. 512-513.
[75] *h.b.*, rr.12-13.
[76] Erdoğan Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir, Eski Çağ'dan Cumhuriyet'e Alevilik*, Röportaj, Ali Karul, Kalkedon Yayınları, İstanbul, 2009, r.34.

Li gorî Kutlu, alîgiriya Elî tiştekî cuda ye Elewîtî tiştekî cuda. Alîgiriya Elewiyên Qizilbaş a ji bo Elî mijareke siyasî ye û bi xwarina heqê Elî re têkildar e lê Elewîtî ne mijareke siyasî ye, mijara baweriyê ye.[77]

Felakedîn Kakeyî navê Elewî bi Îlyayê di wêjeya Ereban de têkildar dike: "Ti eleqeya Eliyê baweriya me bi Eliyê dîroka Îslamê re nîne. Wextê ku Îslam belav bû hinek ji olên ku beriya wê hebûn hatine Misilmankirin û neşiyan ku hinekan Misilman bikin. Elî di wêjeya Ereban de Îlya ye û ev jî Beyta Xwedê ye. Navê wî ji vir tê, cihe ku Eliyê me jê tê ev der e anku ji Îlya yan jî ji Beyta Xwedê hatiye çêkirin."[78]

Dema ku mirov van nêrînên li ser têkiliya navê Elewî û Elî dide ber hev, tê dîtin ku navê Elewî di destpêkê de ji bo malbata wî û alîgirên wî hatiye bikaranîn. Paşê, gelek komên weke Qizilbaş, Bektaşî, Nuseyrî û hwd. di bin navê sîwanî yê Elewî de hatine îfadekirin. Herçend ku li ser têkiliya di navbera navên Elî-Elewî de nêrînên cuda hebin û bi taybetî kesên weke Bulut, Çinar, Kutlu û Çem vê têkiliyê weke têkiliyeke çêkirî îfade bikin jî îro di pratîkê de Elî di jiyana Elewiyan de cih digire. Gelekên Elewiyan wî weke pîrê xwe dihebînin, di diayên xwe de cih didinê, hewara xwe dibinê. Herwiha Elî, di kilamên kevin û niha yên Elewiyan de gelek caran cih digire. Anku herçîqasî jiyana Elî û kirinên wî li Elewîtiya niha newe jî ew, îro di nava vê baweriyêde di cihekî girîng de ye.

1.3. Dîroka Elewîtiyê

Ji ber ku Elewî ji komeke homojen pêk nayên -weke gelek baweriyên din- diyarkirina dîrokeke teqez ji bo van koman jî ne pêkan e. Lê dema ku qala destpêka Elewîtiyê tê kirin bi giştî du fikir gelekî têne îfadekirin, hinek kes Elewîtiyê bi Hecî Bektaş didine destpêkirin, sedsala sêzdahan. "Nikare were parastin ku di pêvajoya dîrokî de pêşveçûneke serbixwe ya Elewîtiyê hebe. Di

[77] Kutlu, *Kızılbaş Alevilikte Yol Erkan Meydan*, r.398.
[78] Munzur Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği- Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş*, Vate, İstanbul, 2011, r. 231.

sosyo-ekolojiya Anadolê de angaşta serdest Bektaşîtî ye. Çimkî Bektaşîtiyê him ji aliyê kadroyên elît ên li Anadolê û him jî ji aliyê rêvebirên Osmaniyan ve piştgirî standiye. Ji ber vê yekê Bektaşîtî, Elewîtiya bajaran e".[79] Hinek jî dîroka wan bi Safewiyan û Şah Îsmaîl, sedsalên pazdeh û şazdehan, didine destpêkirin. Wextê ku despêka Elewîtiyê weke sedsala sêzdehan were qebûlkirin rola komên Kurd û Erebên ku li Îranê, Sûrî û Iraqê dijîn û îhtimala ku van koman demeke pêştir bandor li Elewîtiya Anadolê kiribe tê piştguhkirin.[80] Ev komên ku qala wan tê kirin beriya Elewîtiyê derketine holê û baweriya wan û Elewiyan gelekî dişibe hev. Wextê ku ev kom neyêne dîtin û Elewîtî weke tiştekî ku hema bi carekê dest pê kiribe were qebûlkirin divê xwediyên van angaştan bifikirin bê ma avakerê vê baweriyê fikrên xwe ji ku standine û dîsa li ser şibahiyên di navbera van civakan de şîroveyekê bikin. Wextê ku mirov li baweriya Kurdên Yarsan, Elewî, Êzîdî û Şebek dinêre bi rastî jî gelek xalên hevpar hene. Ji bo ku destpêka Elewîtiyê bê fêhmkirin divê di lêkolînan de ev nêzîkahî bêne dîtin û îhtimala ku baweriya van civakan ji heman çavkaniyê tê yan jî gelekî bandor li hev kirine neyê piştguhkirin. Lê mixabin ev îhtimal zêde nayê dîtin/naxwazin ku bibînin. Li ser destpêka Elewîtiyê xeyn ji dîrokên ku li jorê amaje bi wan hate kirin hinek nêrînên ku destpêka Elewîtiyê cuda cuda şîrove jî dikin hene. Hinek ji van nêrînan Elewîtiye bi gelên qedîm, hinek bi Kurdan û hinek jî bi Tirkan re têkildar dikin:

Çinar, dîroka Elewiyan heta bi Luviyan dibe: "Gelê Anadolê yê qedîm Luvî ne û Elewîtî ji wê demê ve heye, Elewîtî ji dînên ku niha ji aliyê hinek kes/pergal/îdeolojiyan ve bi ol û mezhebên îroyîn ve tê têkildarkirin kevnartir e û çavkaniya van dîn/mezheban Elewîtî bi xwe ye."[81]

Li gorî Pîr Alî Balî: "Divê li kokên Elewîtiyê li herêma Urmiye-Zagrosê bê gerîn. Piştî ku artêşên Îslamê ev herêm dagir kirine, pevçûnên gelekî mezin rû dane û

[79] Orhan Türkdoğan, *Alevi Bektaşi Kimliği-Sosyo-Antropolojik Araştırma-*, Timaş Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2004, r.402.
[80] Erdal Gezik, "Bu 'Yol' Nereden Gelir? Anadolu Aleviliğinin Başlangıcını Aramak", in ber. Yalçın Çakmak-İmran Gürtaş, *Kızılbaşlık Alevilik Bektaşilik Tarih-Kimlik-İnanç-Ritüel,* İletişim Yayınları, İstanbul, 2016, r.261.
[81] bnr. Erdoğan Çınar, *Dergah'ın Sırrı Aleviliğin Kayıp Hafızası*, rr.60-64, *Aleviliğin Kökleri Abdal Musa'nın Sırrı*, rr.51-52.

kesên ku ji wan deran reviyane li Qers, Dêrsim, Semsûr, Meletî û Helebê belav bûne. Yên li Qers û Helebê, Êzîdî; yên li herêma Meletî-Dêrsimê jî Elewî ne. li gorî angaştekê Şêxên Êzîdî yên Şingalê ji Dêrsimê çûne."[82]

Ev civak, ji wextê jiyana Elî ve heye lê heta bi salên dawî zêde berfireh nebûye. Doktrînên wê nepen mane, pirtûkeke vê civakê ku bawermendên wê bixwînin û bigihînin ber destên nifşên nû nîne.[83] Dîroka Elewîtiyê ta bi wextên ku Tirk bûne Misilman tê birin.[84] Elewîtî bûyereke girîng a guherîneke civakî-çandî ye ku em dikarin vê bûyerê bi pêvojaya Îslamîbûna Tirkan bidine destpêkirin. Têgihiştin û meylên ewil ên ku kakilên Elewîtiyê pêk anîne di vê pêvojoyê de di navbera eşîretên Turkmen ên koçer de derketine holê.[85] Heta bi sedsala şazdehan ti balpişt ji bo hebûna koma sosyo-dînî yan jî polîtîk ku paşê bi navê Elewî hate zanîn nînin. Prensîbên dînî yên bi Elewiyan re eleqedar ên weke diwazdeh îmaman, şehadeta Îmam Hiseyn, Kerbelayê beriya sedsala şazdehan di nefes û kilamên Elewiyan de xwiya nakin. Ji aliyê dîrokî ve Elewîtî sedsala şazdehan ji hinek komên heterodoks ên Asyayî yên ku ji aliyên dînî û leşkerî ve li Îranê têkiliyên wan ên baş bi Safewiyan re hebûn derketiye holê.[86] Pêvajoya pejirandina Îslamê ya Tirkan û mijara meyla Şiîtiyê, ji aliyekî ve bûye sedema şikilgirtina Bektaşîtiyê û ji aliyê din ve ya Elewîtiyê.[87]

Elewîtî-Bektaşîtî yek ji tevgerên herî girîng e ku sedsala 13an li Anadolê derketiye holê. Sazkarê Elewîtî-Bektaşîtiyê Hecî Bektaşî Welî (m.1271) ji navenda sufîzmê –Xoresan- koçî Anadolê kiriye.[88] Derketina holê ya Elewîtî-

[82] Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş,* r. 157.
[83] Stephen Van Rensselaer Trowbridge, "The Alevis, or Deifiers of Ali", *The Harvard Theological Review*, Vol. 2, No. 3 (Jul., 1909), r. 340.
[84] Dalkıran, "Alevi Kimligi ve Anadolu Aleviligi Üzerine Bir Deneme", r.103.
[85] Harun Yıldız, "Gelenek ve Değişim Ekseninde Samsun Yöresi Alevîleri", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, hj.6, Winter 2013, r.2.
[86] Ayhan Erol, "Re-Imagining Identity: The Transformation of the Alevi Semah", *Middle Eastern Studies*, Vol. 46, No. 3 (May 2010), r.375.
[87] Orhan Türkdoğan, *Alevi Bektaşi Kimliği-Sosyo-Antropolojik Araştırma-*, r.389.
[88] Dezfouli, "Alevism-Bektashism From Seljuks to Ottomans and Safavids; A Historical Study", r.33.

Bektaşîtiyê li Anadolê encameke pêşveçûnên polîtîk, civakî, aborî û çandî yên dema Şelçukiyan e.[89]

Weke ku tê zanîn him di raya giştî de him jî di nava gel de, baweriya ku Elewî ji Xoresanê hatine berbelav e. Pêwendiya vê baweriyê bi rastiyê re di kîjan astê de be bila bibe warê Elewiyan ê beriya nava Anadolê, Mezopotamyaya Bakur e.[90]

Gelek şecereyên Qizilbaşan ên ku li ser wan xebat hatine kirin girêdana wan a sedsala yazdehan bi sofiyê Kurd Seyîd Ebûl Wefa û terîqeta sofî a Wefaiyeyê re nîşan didin. Ev terîqet li başûrê Kurdistanê derketiye holê û sedsala sêzdehan li Anadolê di nava êlên Kurd û Tirk de bûye xwedanbandor.[91]

Niha jî rêjeyeke mezin a Elewiyên Anadolê ne Tirk in, Kurd in. Rastiya ku gelek gelek Kurdên Xoresanê ji Qizilbaşên Erzîncanê ne û li pey Şah Îsmaîl ji herêma Erzîncanê çûne Îranê ji aliyê gelek kesan ve nayê dîtin an jî bi zanîbûn tê veşartin.[92]

Sedsala 12an, neh binyatên pîroz ên Elewî, ocax, ên ku muhtemelen ji Xoresan û Daylamê hatine, gihane Dêrsimê. Di encama vê yekê de mirovên li Dêrsimê ji van ocaxan bi yekê ve hatine girêdan û ev ocax weke otorîteya xwe nas kirine. Li gorî kevneşopiyên devkî ji diwazdeh ocaxan neh jê, li Dêrsimê têne temsîlkirin. Ji wî wextî ve pêşengên baweriyê angaşt kirin ku ew, ji nava van neh ocaxan ji yekê tên û ji ber vê pozîsyona wan cihê pêşengên Elewiyan bi rêya pîrozbûna irsî hate qehîmkirin. Ev pozîsyon ji bêv derbasî kurê herî terxanbûyî û lêhatî bû.[93]

Weke ku tê dîtin nêrînên li ser dîroka Elewîtiyê lev nayên, ji hev gelekî cuda û gelek ji wan li dijî hev in. Ji ber vê yekê, ji bo destpêka Elewîtiyê diyarkirina

[89] h.g., r.36.
[90] Hamza Aksüt, *Mezopotamya'dan Anadolu'ya Alevi Erenlerin İlk Savaşı* (1240), Yurt Kitap Yayın, Ankara, 2006, r.171.
[91] Martin van Bruinessen, "Between Dersim and Dâlahû: Reflections on Kurdish Alevism and the Ahl-i Haqq Religion", Shahrokh Raei (ed.), Islamic Alternatives: Non-Mainstream Religion in Persianate Societies [*Göttinger Orientforschungen, III. Reihe: Iranica*, N.F. 16]. Wiesbaden: Harrassowitz, 2017, r.24.
[92] h.g., r.2.
[93] Annika Törne, "Dedes in Dersim: Narratives of Violence and Persecution", *Iran & the Caucasus,* Vol. 16, No. 1 (2012), r. 74.

dîrokeke teqez karekî zehmet û belesebeb e. Lê di dîrokê de têkiliyên Elewiyan û dewletên ku serdestî li wan kirine li gorî berjewendî û pêwistiyên van dewletan guherîne.

1.3.1. Dewleta Osmanî û Elewî

Dewleta Osmanî ya ku desthilatdarî li ser herêmên Elewiyan dikir Sunî bû. Herwiha rêvebirên Osmanî jî Sunî bûn û bi Sultan Selîm (m. 1520) re padîşahên Osmaniyan xwe weke xelîfeyê Îslamê qebûl dikirin. Elewiyên ku him ji aliyê dînî ve ji Osmaniyan cuda bûn û him ji aliyê siyasî ve bi dijminê Osmaniyan re, Safewî, di têkiliyê de bûn ji aliyê Osmaniyan ve weke xetere dihatine dîtin û him rêveberiya Osmanî ew diçewisandin û him jî ji aliyê miletê Sunî ve rastî heqaretên giran dihatin. Wextê ku mirov bi giştî li têkiliyên Osmanî û Elewiyan dinêre - Elewî, hîn zêdetir weke Qizilbaş dihatine binavkirin- tê dîtin ku Qizilbaşan û rêveberiya Osmaniyan li hev nekirine û di navbera wan de gelek caran nakokiyan rû dane. Osmaniyan herçend bergiriyên tund jî standibin nekarîne rê li ber serhildanên Qizilbaşan ên ku di bingeha xwe de ji ber tevna xerabe ya civakê rû dane bigirin.[94]

Siyaseta rêveberiya Osmanî ya ku mafê Elewiyan û azadiya wan asteng dikir û ew diçewisandin civaka Elewî xistiye nava hewlên lêgerîna pergaleke nû û dîroka vê civakê ji bo avakirina pergaleke nû seraqet bi serhildanan tiji bûye. Sedema sereke ya vê rewşê helwesta dewletê ya çewsîner e. Bingeha bûyerên Elewiyan xwe dispêre helwesta Osmaniyan a Sunî-şerîetparêz. Dewleta Osmanî ji pêvajoya împeretoriyê ve bûye dewleteke tundrew a Sunî-şerîetparêz û vê helwesta dewletê rê li ber serhildanên Elewiyan vekiriye.[95] Di wextê Osmaniyan de kêmaneyên Yahûdî û Mesîhî yên ku weke milet hatibûne pênasekirin ji Qizilbaşan rihettir û di rewşeke baştir de bûn.[96] Lê bi taybetî piştî ku Selîmê Yekem zora hevbendên

[94] Esat Korkmaz, *Pir Sultan Abdal*, Yön Matbaacılık, İstanbul, 2002, r.12.
[95] Baki Öz, *Osmanlı'da Alevi Ayaklanmaları*, Ant Yayınları, İstanbul, 1992, r.16.
[96] Mehmet Bayrak, *Êzidî-Kızılbaş, Yaresan Kürtler- Belgelerle Kürdistan'da Gizli Dinler*, rr. 352-353.

Safewî-Qizilbaşan bir, 1514, Elewiyên Anadolê tûşî zextên dînî bûn. Ne statuyeke wan î qanûnî hebû ne weke van kêmaneyên Mesîhî û Cihû bi xweşbînî hatin qebûlkirin ne jî weke şaxekî bênîqaş ê Îslamê.[97]

Weke niha, wextê Osmaniyan jî serhejmara Elewiyan pir zêde bû. Ji ber ku vê nifûsa zêde doza mafên xwe yên civakî û siyasî dikir û dixwest ku di rêveberiyê de cih bigire têdikoşiya seraqet serhildan derdiketin.[98] Elewiyan di dema Osmaniyan de gelek caran serhildan kirine. Baki OZ cih daye 15 heb serhildanên Elewiyan.[99]

Piştî ku Şah Îsmaîl li Îranê hate ser hikm him wî û him jî Osmaniyan siyaseta berbelavbûnê dane meşandin. Ev her du dewlet, Safewî-Osmanî, li rojhilatê Anadolê berpikî hev bûn. Piştî şerê Çaldiranê,1514, yê ku Osmanî bi ser ketin dijminantiya van her du hêzan giha lûtkeyê. Qizilbaşan li ser hev serî li ber Osmaniyan radikirin û Safewiyan bi awayekî zelal piştgirî didan van serhildanan. Gelek Qizilbaşan, erdnîgariya Osmaniyan dixistine bin destê Safewiyan. Osmaniyan guhdariya tixûbên di navbera xwe û Safewiyan de kirin û bergiriyên qehîm standin. Cezayên giran ên weke cezayê kuştinê, nefîkirina malbatan, cezayê girtinê û di kêştiyên şer de karê zêde sext dane Qizilbaşan. Ji bo ku ev her du dewletên Misilman argumanên şerkirinê di navbera du dewletên Misilman de ava bikin dest pê kirin ku dêhnê xelkê bikşînin ser cudahiyên olî yên di navbera her du dewletan de, bi vî şiklî Sunitiya Ortodoks derkete holê.[100] Her ku sedsala şazdehan gefa Safewiyan li rojhilat meztir bû toleransa dewleta Osmanî ji bo şaxên Îslamê yên ne Sunî kêmtir bû. Civakên Elewî ji vê demê pê ve tûşî zextên siyasî bûn. Li gorî Osmaniyan, Elewî hevkarên Safewiyan bûn û ji ber kumên sor ên leşkerên Safewiyan Elewî jî bi navê Qizilbaş dihatine zanîn. Ji hingê were Elewî bes ne ji aliyê dewletê ve tûşî zextan hatin êdî civaka Sunî jî ji wan hez

[97] Törne, "Dedes in Dersim: Narratives of Violence and Persecution", r.72.
[98] Öz, *Osmanlı'da Alevi Ayaklanmaları*, rr.120-121.
[99] bnr. *h.b.*, rr. 152-204.

[100] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", rr. 439-443.

nekir. Gund û şûnwarên wan weke dinyaya 'yên din' hatin binavkirin.[101] Hîletê Tirkên Osmanî, dijminên Safewiyan, ji Qizilbaşan diçû. Gelek navên nelirê li wan dikirin. Ev heqaretên ku li Qizilbaşan dihatine kirin îro jî di nava piraniya Tirkan de têne dîtin.[102]

Baweriya Elewîtî/Qizilbaşiyê encameke olî ya têkoşîna civakî-siyasî ya eşîretên Turkmen ên li Anadolê ye ku li dijî Osmaniyan sedsalên 15 û 16an hatiye dayîn.[103] Çend heb analîzên sosyo-antropolojîk nişan dane ku heterodoksiya Qizilbaşî-Elewîtiyê pêkan e ku encameke berxwedanên eşîretên Turkmenan ên li dijî Osmaniyan be ku veguhezîbe şiklê baweriyekê.[104]

Piştî ku dewleta Safewî li Îranê hate avakirin, Osmaniyan hewcedariya kontrolkirina tixûbên xwe û Safewiyan hîs kir. Şêniyên Osmanî derbasî nava Safewiyan dibûn û Şiîtî qebûl dikirin. Beyazîdê Duyem (m. 1512) ji parêzgarên xwe dixwest ku tixûban baş kontrol bikin û destûra derbasbûnê nedin. Wextê ku têkiliya kesekê/î bi Qizilbaşan re bihatana peyîtandin cezayê wê/wî mirin bû.[105] Gelek şopînerên Şah Îsmaîl beşdarî wî bûn, lê hinek jî li Anadolê man. Li Anadolê gelek serhildanên Qizilbaşan rû dan û ev serhildan ji aliyê Osmaniyan ve bi awayekî xwînane hatin çewisandin. Ji ber ku Qizilbaş weke aligirên Safewiyan hatin qebûlkirin di sedsalên din de jî tûşî zext û zorê hatin. Cîranên wan ew bi tiştên zayendî yên ku gotina wan zehmet e tawanbar kirin. Van tiştan, Qizilbaş naçar kirin ku vekişin herêmên ku kes nikaribe zû bi zû xwe bigihîne wan. Dêrsima li bakur-rojavayê Kurdistanê, herêmeke wilo bû.[106]

Sedsalên pazdeh û şazdehan gelekî qala serhildanên Qizilbaşan tê kirin lê piştre, ji ber zextên dijwar hêdî hêdî dengê wan kêm dibe. Herçiqasî ku belgeyên sedsala 16an qala Qizilbaşan bikin jî tê dîtin ku di navbera sedsalên 17an û 19an de qala

[101] Erol, "Re-Imagining Identity: The Transformation of the Alevi Semah", r. 375.
[102] Moosa, *Extremist Shiites The Ghulat Sects*, r.34.
[103] Nilgün Dalkesen, "Alevi Kızılbaş Kimliğinin Oluşumunun Tarihsel Arka Planına Bir Bakış", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, , hj.3, Summer 2012, r. 242.
[104] Albert Doja, "A Political History of Bektashism from Ottoman Anatolia to Contemporary Turkey", *Journal of Church and State*, Vol. 48, No. 2 (Sprıng 2006), r.434
[105] Resûlê Caferiyan, *Safeviyye der Erzeê Dîn, Ferheng ve Siyaset*, b.1, Intîşaratê Pijuheşkedeê Huzeê Danîşgah, Qûm, 1379 (k.), rr.36-37.
[106] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", r.10.

wan nayê kirin. Ji ber zextên tund naçar mane ku vekişin herêmên çolter ên başûr û başûrrojhilatê Anadolê.[107] Dema Evdilhemîdê Duyem (m. 1918) xebatên ku Elewiyan bikine Sunî dest pê kirine.[108] Li gorî raporên Osmaniyan armanca ku Qizilbaşan bikine Sunî armanca sereke ye. Ji ber ku şêxên Nexşîbendiyan bi zimanê wan zanin xwestine ku şêxên Nexşîbendiyan ên ku li herêmên Kurdan e bişînin nava Qizilbaşan, ji wan re medreseyan vekin û wan ji baweriya wan dûr bixin. Lê divabû neyê zanîn ku ev şêx, ji aliyê dewletê ve hatine şandin.[109] Dîsa di raporeke din de hatiye îfadekirin ku divê hikûmet, pêşengên Qizilbaşan bikişîne aliyê xwe, bike ku ev kes û zarokên xwe îbadetên dînî bikin û li gundên wan medrese û mizgeft bêne çêkirin.[110]

1.3.2. Dewleta Safewî û Elewî

Navê Safewî, ji navê Şêx Safiyedîn Erdebîlî tê[111] û dewleta Safewî, dewleta ku bi Qizilbaşan re di nava têkiliyên herî baş de ye. Herçiqasî ku kêm bubin jî gelek angaştên ku dibêjin dewleta Safewî dewleteke netewî ya Îranî ye hene. Lê Sumer, li gorî agahiyên ku ji Ehmed Kesrevî radigihîne dibêje ku ti eleqeya vê xanedanê bi seyîdiyê re nîne û teqez e ku ev xanedan, ji bintaya Kurdekî Şingalî yê bi navê Fîrûz Şah hatiye.[112] Li gorî gelek çavkaniyan di dema Şêx Cuneyd û Şêx Heyder de piraniya gelê Îranê Sunî bû. Şah Îsmaîl û Qizilbaşên Tirk ên Anadolê yên ku di bin emre wî de bûn bi xwînê û bi êgir, Şiîtî bi gelê Îranê dane qebûlkirin û hêmana ku dewleta Safewî ava kiriye û ji pê girtiye Tirkên Anadolê ne.[113] Li gorî

[107] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", r.445.
[108] Selahattin Ali Arik, *Alevilik ve Tarihi*, r.295.
[109] Alişan Akpınar, "II. Abdülhamid Dönemi Devlet Zihniyetinin Alevi Algısı", in ber. Yalçın Çakmak-İmran Gürtaş, *Kızılbaşlık Alevilik Bektaşilik Tarih-Kimlik-İnanç-Ritüel,* İletişim Yayınları, İstanbul, 2016, r.223.
[110] Murat Alandağlı, "Kızılbaşlara Dair İki Rapor: 19. Yüzyılın Son Çeyreğinde Osmanlı İdarecilerinin Gözüyle Kızılbaşlar", in ber. Yalçın Çakmak-İmran Gürtaş, *Kızılbaşlık Alevilik Bektaşilik Tarih-Kimlik-İnanç-Ritüel,* İletişim Yayınları, İstanbul, 2016, r.237.
[111] Emîr Hoseynê Xencî, "Şah Îsmaîlê Safevî Feslê Noxost: Xandanê Safevî ve Pedîdeyê Qizilbaş", file:///C:/Users/CASPER/Downloads/d8b5d981d988db8c1.pdf, r.7, (d.g., 11.06.2020).
[112] Faruk Sümer, *Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü,* Güven Matbaası, Ankara, 1976, r. 1.
[113] *h.b.*, rr. 2-3.

rîwayetekê, Şêx Heyder, bavê Şah Îsmaîlê Yekem, di xewna xwe de ji Hz. Elî ferman standibû ku kumên bi rengê xwe cuda yên ku diwazdeh îmaman temsîl dikin bidine serên xwe. Piştî vê bûyerê dev ji kumên Moxolan berdan û kumên bi vî şiklî dane serên xwe. Piştî ku ev kum dane serên xwe Tirkan ji Safewiyan re gotin Qizilbaş anku kesên sersor, navê Qizilbaş bi vî şiklî derkete holê.[114] Melikoff jî xwedanê heman nêrînê yê û li gorî wê jî, ji ber ku mirîden Şêx Heyder kumên sor didane serên xwe navê Qizilbaş li wan hatiye kirin û tevgera Qizilbaşiyê wilo dest pê kiriye.[115] Gulten, dibêje ku navê Qizilbaş ji Şêx Heyder tê û dema Şah Îsmaîl wateyeke berfirehtir hewandiye: "Navê Qizilbaş, ji bavê Şah Îsmaîl, Şêx Heyder, tê. Şêx Heyder bi wateya ku diwazdeh îmaman temsîl dike taceke qizil ku ji diwazdeh qetîtan pêk hatiye daye serê xwe; şaşika qizil li serê xwe pêçaye, kiriye ku mirîden wî jî li gorî pileya xwe bi heman awayî cilân li xwe bikin.[116] Ev navê, Qizilbaş, ku dihate wateya alîgirên Şêx Heyder bi propagandaya Şah Îsmaîl ji bo tevên alîgirên Safewiyan hatiye bikaranîn û ji bo binavkirina civakeke berfireh hatiye gotin."[117] Onat jî dibêje ku ev nav, xwe dispêre Şêx Heyder: "Qizilbaşî, di dîroka Tirkan de ji bo îfadekirina komekê, di pêvajoya avakirina Dewleta Safewiyan de ji aliyê bavê Şah Îsmaîl, Şêx Heyder ve hatiye bikaranîn."[118]

Qizilbaş, di dema Safewiyan de yek ji girîngtirîn unsûrê xwedanhêz bûn û hezrê qirnekî peywirên siyasî û leşkerî yên herî girîng di bin kontrola wan de bûn.[119] Sadiqbûna Qizilbaşan bo Safewiyan ew di dadgehan de, di artêşê de, li bajaran kirin xwedîdev. Di heyamên klasîk de ev pozîsyon bûne pozîsyonên taybet ên

[114]Ebasê Îzedî, Muhemedê Xezayî, Heseneliyê Purmend, "Baznemayiyê Qizilbaşha Der Nîgarehayê Şahnameyê Tehmasbî", *Neşriyeyê Hunerhayê Zîba-Hunerhayê Tecessûmî*, Dovreyê 22, Şomareyê 4, Zimistanê 1396 (k.), r.44.
[115] Melikoff, *Hecî Bektaş Efsaneden Gerçeğe*, r.187.
[116] Gülten, "Osmanlı Devleti'nde Alevî Sözcüğünün Kullanımına Dair Bazı Değerlendirmeler", r. 28.
[117] h.g., r. 28.
[118] Onat, "Kızılbaş Farklılaşması Üzerine", http://www.hasanonat.net/index.php/101-k-z-lbasl-k-farkl-lasmas-uezerine-2, (d.g., 08.01.2020).
[119] Îzedî, Xezayî, Purmend, "Baznemayiyê Qizilbaşha Der Nîgarehayê Şahnameyê Tehmasbî", r. 43.

Qizilbaşan.[120] Qizilbaş bi giştî şervan bûn, xwe ji bo dewleta Safewî feda dikirin, cilên wan ên ku ew ji xelkên din cihê dikirin hebûn, riha xwe diqusandin lê simbêlên xwe berdidan.[121]

Bihêzbûna Safewiyan a li Îranê dikare weke yekemin şoreşa serkeftî ya Şiitiyê were qebûlkirin. Şah Îsmaîl angaşt kir ku ew Mehdî ye û şopînerên wî yên Tirk ew weke enkarnasyona Xwedê qebûl kirin.[122]

Şah Îsmaîlê ku li Îranê hikûmeteke Şiî ava kiribû, li Îranê weke teşwîkkarê vî mezhebî dihate nasîn. Lê xelîfeyên ku Şah Îsmaîl ew şandibûne Anadolê ew weke Mehdî, weke îmam, anku weke serokekî dînê Îslamê nasandibûn. Bi vî şiklî ji sedsala 15an ve komên Batinî yên li Anadolê û bi taybetî komên ku xwe weke Sufî, Safiyan, Elewî bi nav dikirin, koma ku di nava gel de weke Qizilbaş dihate naskirin, Bektaşiyan û ehlê Futuwwetê Şahê Îran-Safewiyan weke kesayetekî ku bi awayekî meşrû hatibe şopandin qebûl kirine.[123] Şah Îsmaîl, ji bo meşrûbûna xwe seyîdî bi Qizilbaşiyê re têkildar kiriye û bi vî şiklî hîn di destpêkê de rê li ber îtirazan girtiye.[124] Herwiha ji bo ku baweriya wî di nava gelê Anadolê de belav bibe menzûmeyên xwe bi Tirkiyeke zelal nivîsîne, vê politikaya wî cihê xwe girtiye û Şiîtî li Anadolê zehfî bi lez belav bûye. Yavûz ji berê ve hay ji vê xetereyê hebûye lê encix wextê ku zora bav û birayê xwe biriye û bûye padîşahê Osmaniyan, şiyaye li gel Şah Îsmaîl têbikoşe. Ji bo ku rê li ber belavbûna Şiîtiyê bigire pê re şerê Çaldiranê kiriye.[125] Dema Şah Îsmaîlê Yekem pêşengên Faris ji bo ku hêza emîrên Qizilbaşên Tirk bixine bin kontrola xwe hewl didan.[126] Piştî

[120] Kathryn Babayan, "The Safavid Synthesis: From Qizilbash Islam to Imamite Shi'ism", *Iranian Studies*, Vol. 27, No. 1/4, Religion and Society in Islamic Iran during the Pre-Modern Era (1994), r. 139.
[121] Hemîdreza Sefakîş, *Safeviyan der Guzergahê Tarîx*, Intîşaratê Soxen, Tehran, 1390(k.), rr. 51-54.
[122] Said Amir Arjomand, "History, Structure, and Revolution in the Shi'ite Tradition in Contemporary Iran", *International Polittcal Science Reciew* (1989), Vol. 10, No. 2, r.113.
[123] Abdülbaki Gölpınarlı, *Pir Sultan Abdal Hayatı Sanatı Eserleri*, Varlık Yayınevi, İstanbul, 1953, rr. 5-6.
[124] Yılmaz Karadeniz, "Safevi Devleti'nin Kuruluş Meselesi: Kızılbaşların Ortaya Çıkışı", *Amasya Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, (Sayı 3), r. 65.
[125] Baş, "Ahmed Yesevî'nin Bektaşîlik, Alevîlik Üzerindeki Etkileri ve Osmanlı Dini Hayatındaki İzleri", rr.35-36.
[126] Rula Jurdi Abisaab, *Converting Persia Religion and Power in the Safavid Empire*, I.B.Tauris & Co Ltd, London, 2004, r.14.

mirina Şah Îsmaîl, kurê wî Şah Tahmasb (m. 1586) hate cihê wî, dema ku Tahmasb li ser hukim bû Qanûnî Siltan Silêman (m. 1566) gelek caran êrişî Safewiyan kir lê bi şiklê ku dixwest bi ser neket. Bi xêra siyaseta Tahmasb a aqilane piştî peymana Amasyayê li Îranê di qadên çandinî, aborî, û mîmarî de pêşveçûn çêbûn.[127] Di nava padîşahên Safewiyan de kurê Tahmasb ê bi Şah Îsmaîlê Duyem (m. 1577) xwestiye ku Sunî û Şiî bi hev re bijîn û siyaseteke nermtir bi rê ve biriye. [128]

Herçiqasî ku dema destpêka hikûmeta Safewiyan rewşa Qizilbaşan gelekî baş be û wan di rêveberiya dewletê de cih girtibin, kontrola gelek karên siyasî û aborî di destên Qizilbaşan de be jî piştî ku Şah Ebasê Yekem (m. 1629) hate ser têxt, rewşa wan guherî. Qizilbaşan dêya wî û birayê wî kuştibûn û di nava xelkê de belav kiribûn ku Şah Ebas bêjî ye. Ji ber van, Şah Ebas bi ser wan de çû, ew ji rêveberiyê dûr xistin û hinek ji wan jî daleqandin. Dewrên piştî Şah Ebas dîsa rewşa wan edilî û dîsa di rêveberiya Safewiyan de bûne xwedîdev.[129]

1.3.3. Komara Tirkiyeyê û Elewî

Gava ku mirov li heyamên avakirina komara Tirkiyeyê dinêre tê dîtin ku Elewiyan, reformên sekuler ên komara Tirkiyeyê bi hêviya azadî û rizgariyê bi kêfxweşî pêşwazî kirine û li gorî Bruinessen Elewiyên li herêmê, ji ber îmajên wê yên Sunî li dijî serhildana Şêx Seîd, 1925, derketine lê Bruinessen dibêje ku ev yek, nayê wateya ku netewperweriya Kurdan di nava Elewiyan de ji binî nîn bû lê tirsa wan a ji tundrewiya Suniyan ji hizrên wan ên netewî pêşvetir bû. Dîsa Bruinessen dibêje ku Kurdên Sunî piştgirî nedan serhildanên Kurdên Elewî -1920 Koçgirî, 1937-38 Dêrsim- yên ku bi hestên netewî hatibûne destpêkirin.[130] Ev cudabûn û hevnegirtina ku di dema avakirina komara Tirkiyeyê de, di navbera

[127] Faruk Sümer, *Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü,*rr. 66-69.
[128] *h.b.*, r. 116.
[129] Îzedî, Xezayî, Purmend, "Baznemayiyê Qizilbaşha Der Nîgarehayê Şahnameyê Tehmasbî", r.45.
[130] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", r.11.

Kurdên Sunî û Elewî de hebûye di demên beriya komara Tirkiyeyê de jî ji aliyê Selçukî û Osmaniyan ve li dijî Kurdan hatiye bikaranîn. Vê siyaseta ku Kurdan li dijî Elewiyan bi kar bînin dema Selçukiyan dest pê kiriye. Wextê ku Babaiyan sala 1240î serî hildane, rêveberiya Selçukî ji bo ku serhildana Qizilbaşên Tirk têk bibe Kurd bi kar anîne. Osmaniyan jî ev siyaset bi awayekî xurttir bi rê ve birine.[131]

Hêmana ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Kurd û Tirk li hemberî Yewnan û Ermenan digihandine hev Îslam bû. Çima ku tevgera Kemalîst li dijî kafiran şerê Misilmanan dikir gelek Kurdan bi dildarî di nava vê tevgerê de cih girtin. Piştî ku Ataturk Komara Tirkiyeyê ava kir, Îslam piştguh kir û yekîtiya Kurd û Tirkan xera kir.[132] Piştî ku komara nû ya Tirkiyeyê hate avakirin armanca rêvebiran ew bû ku dewleteke sekulertir û di rêya Ewropayê de ava bikin. Ji ber vê, Elewiyan xwe nêzîktirî vê dewletê dîtin. Ji ber ku Osmanî bi Sunîbûna xwe derdiketine pêş, komara nû wê demê hewl da ku ji bo Elewiyan nasnameyeke nû ava bike. Ew weke hilgirên mîrata Tirkan nîşan dan.[133] Xala balkêş ev e ku dema şerê cîhanê Misilmantî derxistine pêş û piştgiriya Kurdên Sunî standine lê piştî şer bi rêya sekulerîzmê Elewî nêzîkî xwe kirine. Kifş dibe hewla ku bi rêya baweriyê civaka Kurd jev cihê bikin heye.

Beriya 1938an, herî kêm ji herkî ku Komara Tirkî sala 1923yan hatibû avakirin, dewletê li ser pîrên Elewiyan dest bi zextan kir û hewl da ku wan asîmîlê bike û Îslama Sunî bi wan bide pejirandin. Piştî sala 1938an her ku pratîkên baweriya Elewîtiyê gav bi gav wenda bûn pêşengên olî jî fonksiyon û statuyên xwe yên berê wenda kirin. Peywirên *dede*yan ên weke mamostetî û dadgertiyê, di cih de ji aliyê dewleta Tirkan ve û pergala wê ya perwerdehiyê ve hatin guhertin.[134] Netewperwerên Tirk, ji salên 1920an û 1930î ve hewl dane ku Elewîtiyê tevlî

[131] Rıza Zelyurt, *Dersim İsyanları ve Seyit Rıza Gerçeği*, Kripto Kitaplar, Ankara, 2010, r.26.
[132] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", r.22
[133] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", rr.449-450.
[134] Törne, "Dedes in Dersim: Narratives of Violence and Persecution", r. 75.

mîrata Tirkan bikin. Angaştên ku Elewîtî dewlemendiya Tirkan e sedsala bîstan ji aliyê van kesan ve hatine parastin. Ev angaşt, tevlî bernameyên Wezareta Karên Dînî bûne û destpêka salên notî Elewîtî weke dewlemendiyeke çandî ya Tirkan hatiye pênasekirin.[135]

Elewî ne dema Selçukiyan ne dema Osmaniyan de ne jî dema Komara Tirkiyeyê him ji aliyê rêvebirên dewletê ve û him jî ji aliyê dewletê ve ti carî weke gel nehatine qebûlkirin, tim zext li wan hatine kirin hatine çewisandin û kêm hatine dîtin. Wextê ku ev tişt dihatine kirin dewletê bi armancên xwe yî mêtinger di nava xelkên hejar ên ji mezhebê Sunî de pistepistên çepel ên bi şiklê "Elewî dê û jinên xwe jev nas nakin, tiştên ku bi destên wan bêne serjêkirin nayêne xwarin, wextê ku Elewî cemê dikin mûmê vedimirînin dê û jinê nas nakin û hwd." belav kirine. Van dewletan, bi vî şiklî him gelê Sunî ji xwe re kiriye mertal him jî doza di navbera xwe û gelên hejar de kirine weke doza di nava gelan de.[136] Suniyan, li Tirkiyeyê koma Misilman a serdest, bi sedsalan pirsa ku Elewî Misilman in an na kirine. Wextê ku komara nû sala 1923an ava bû û reformên wê yî sekuler hatine ragihandin Elewiyan bi hêviya ku di civakê de zêdetir werine qebûlkirin û rola wan zêdetir bibe piştgirî dane serkêşiya Ataturk lê dîsa jî ji bo Elewiyan ti pêşveçûn çênebûne.[137]

Lê wextê ku salên 1970/1980yî xortên Elewiyan nêzîkî rêxistin û saziyên çepgir bûn dewletê ew dîsa bi Komunîstbûnê û nijadperestiya Kurdan tawanbar kirin.[138] Ev tişt ji bo nîjadperestên Tirk nedihate qebûlkirin û sala 1978an li Çorum û Mereşê, sala 1993an jî li Sêwasê êrişî Elewiyan kirin.

[135] Kabir Tambar, "The Aesthetics of Public Visibility: Alevi "Semah" and the Paradoxes of Pluralism in Turkey", *Comparative Studies in Society and History*, Vol. 52, No. 3 (JULY 2010), rr.661-662.
[136] Algül, *Aleviliğin Sosyal Mücadeledeki Yeri*, rr.7-8
[137] Bedriye Poyraz, "The Turkish State and Alevis: Changing Parameters of an Uneasy Relationship", *Middle Eastern Studies*, Vol. 41, No. 4 (Jul., 2005), r.503.
[138] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", rr.449-450.

Hema bêje destpêka salên heştêyî hebûna civaka Elewiyan a ku kokên wê bi sedsalan hene di bîra raya giştî de hatibû jibîrkirin. Salên heftêyî beşeke girîng ji Elewiyan dev ji nasnameya xwe ya olî berdan û berê xwe dane sosyalîzmê. Li her derê Tirkiyeyê, daxuyaniyên ku digotin Elewî bi şiklê civatekê ji holê rabûne dihatine bihîstin lê dawiya salên heştêyî Elewî bi awayekî boş bûne objeya pêvajoya jinûvekeşifkirinê.[139] Jinûvekeşifkirina civata Elewî, girêdayiyê faktorên cuda ye. Em dikarin van faktoran bi şiklê faktorên sosyolojîk û polîtîk îfade bikin. Ji aliyê sosyolojîk ve faktora herî diyarker ji ber şertên aborî û polîtîk koça ber bi bajaran ve ye. Hatina bajaran ji bo Elewiyên ku li çolterê dijiyan rêyên nû yên xweîfadekirinê vekirin. Bi vî şiklî zêdebûna Elewîyên ku perwerde dîtine û çêbûna burjuvayeke Elewî bûye sedema çêbûna çîneke nû ya civakî. Îro hêza dehfîner a li pişt avabûn û belavbûna bilez a saziyên Elewiyan xweajoya parastinê ya li dijî berbelavbûna Îslamîzmê ye. Ev xweajo bi rêya avakirina saziyan rê li ber hewlên yekîtiya siyasî vedike.[140]

Wextê ku piştî salên şêstî polîtikayên Tirkiyeyê bendbendî dibûn, meyla Elewiyan bi taybetî Elewiyên Kurd li ser çepgiriyê bû. Nakokiyên berê yên Sunî û Elewiyan piştî berberiya di navbera çepgir û rastgiran de dijwartir bûn. Tevlîheviyên siyasî yên salên heftêyî, sala 1978an li Mereşê bûne sedema bûyerên gelekî tund ku di wan bûyeran de zêdeyî sed Elewiyî ji aliyên Suniyên tundrew ve hatin kuştin. Rejîma leşkeri ya ku sala 1980yî rêveberî bi dêst xist, bi rêya hinek organîzasyonan xwest ku rê li ber van bûyeran bigire. Cudahiyên di navbera Elewî û Suniyan de hatine kêmkirin, hewlên ku mizgeftan li gundên Elewiyan ava bikin û meleyên Sunî bişînin gundên wan hatine dîtin.[141]

Salên heştêyî dewletê xwest ku dîn anku Elewîtiyê li dijî tevgera netewî ya Kurdan a ku gelekî zû mezin dibû bi kar bîne. Serokatiya Karên Dînî israr kir ku

[139] Reha Çamuroğlu, "Türkiye'de Alevi Uyanışı", in *Alevi Kimliği*, ber. Olsson, E. Özdalga, C. Raudverer , wer. Bilge Kurt Torun, Hayati Torun, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2010, r. 104.
[140] h.g., r.105.
[141] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", r.11.

Elewîtiyê weke şiklekî Îslama Tirkan nîşan bide û bi vê rêyê Elewiyan bike alîgirên dewletê.[142]

Dawiya salên heştêyî her ku bandora PKKyê li nava Kurdên Tirkiyeyê belav dibû li nava Elewiyan jî belav dibû. Vê yekê kir ku rêveberiya hikûmetê nasnameya Elewîtiyê weke alternatîfeke nasnameya Kurdbûnê derxe pêş. Destpêka salên notî dewletê bi awayekî zelal dest bi piştgirîdayîna Elewiyan kir.[143] Herwiha dewletê xwest ku Elewîtiyê weke şaxekî Îslamê nîşan bide. Dewletê piştgirî da merasîmên bîranînên Hecî Bektaşî Welî û sponsoriya fermî ya van festîvalan kir. Di medyayê de qala dewlemendiyên çanda Elewiyan hate kirin, weke ku wêjeya Tirkan bi hêmanên Elewîtiyê xemilîbe hate nîşandan. Pirtûkên ku di salekê de li ser Elewiyan hatine nivîsîn ji yên nîv qirnê bihûrî zêdetir in. Xwestin ku bi rêya van kirinan, meyla ciwanên Elewiyan bidine ser Elewîtiya ku nêzîkî Sunîtiyê hatiye kirin, berê wan ji tevgerên sosyalîst biguherin û tevgera Kurdî ya radîkal a ku Elewî di navê de zêde ne bêtaqet bikin.[144] Wisa xwiya ye ku Kurdên Elewî ji du aliyan ve tûşî çewisandinê hatine. Him ji aliyê nijadî ve ne Tirk in û him jî ji aliyê mezhebî ve ne Sunî ne, diyar dibe ku gelekan ji wan berê xwe dane sosyalîzma tundrew û xwiya ye ku koma penaberan a herî berfireh a ku ji Tirkiyeyê hatiye Ewropayê, bi taybetî Elmanya, ew in. [145]

Elewiyên ku ji dema Selçukiyan ve nedihatine dîtin, dema Osmaniyan bi taybetî piştî bihêzbûna Safewiyan rastî gelek zextên tund, heqaretên nelirê û dijwar hatin. Her carê bi nemisilmanbûnê dihatine tawanbarkirin. Navê wan, Qizilbaş, di wateyên gelekî xerab de dihate bikaranîn. Lê dawiya sedsala nozdehan-destpêka sedsala bîstan navekî nû li wan hate kirin, Elewî, û hewlên ku wan nêzî Îslamê bikin zêdetir bûn. Wextê Şerê Cîhanê yê Yekem rêveberiya Tirk, ji Kurdên Sunî

[142] Karin Vorhoff , ""Let's Reclaim Our History and Culture!": Imagining Alevi Community in Contemporary Turkey", *Die Welt des Islams, New Series*, Vol. 38, Issue 2 (Jul., 1998), r.233.
[143] Bruinessen, "Kurds, Turks and the Alevi Revival in Turkey", r.8.
[144] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", r.12.
[145] Hiroki Wakamatsu, "Transmitting the tradition: An analysis on master-disciple relationship in Alevi Community of Turkey", *International Journal of Social Sciences and Education Research*, b. 1(3), 2015, Accepted Date: 01 / 07 / 2015, r. 642.

piştgirî stand. Lê piştî şer bi rêya sekulerîzmê xwestin ku Elewiyan nêzîkî xwe bikin. Li gorî gelek kesan dema ku Şêx Seîd serî rakir Elewiyan li dijî wî şer kir û wextê ku Kurdên Elewî jî serhildanên Koçgirî û Dêrsimê kirin Kurdên Sunî piştgirî nedan wan. Wextê ku Komara nû rewş xiste bin kontrolê, him Kurdên Elewî û him yên Sunî piştguh kirin. Piştî ku salên heftêyî Elewiyan koçî bajaran kir û li Ewropayê xwiya bûn, nêzîkî tevgerên çepgir û tevgerên Kurdan bûn, dewletê ji bo ku rê li ber vê yekê bigire demildest dest bi polîtîkayên nû kir, ji bo ku Elewî ji çepgiran û tevgerên Kurdan dûr bikevin xwest ku Elewî dîsa bi Elewîtiya xwe bihisin lê ev Elewîtî, Elewîtiyeke li gorî siyaseta dewletê bû. Lêkolînên ku bi destê/xwesteka dewletê û li gorî rastiyên dewletê têne kirin hema bêje dubareya hev in. Elewîtiyê bi rêya Bektaşîtiyê bi baweriyên berê yên Tirkan ve girê didin û Elewiyên Kurd nayêne dîtin. Îro jî siyaseta rêveberiya komara Tirkiyeyê li gorî berjewendiyên rêvebiran diguhere. Nikare were gotin ku îro jî Elewî, bi taybetî Elewiyên Kurd xwedanê statuyekê ne yan jî binbariyên baweriya xwe bi awayekî serbest tînine cih.

1.4. Baweriya Elewîtiyê

Gava ku qala baweriya Elewîtiyê tê kirin gelek nêrîn û angaştên ciyawaz têne dîtin. Li ser gelek xalên baweriya Elewiyan nêrînên hevpar nînin û ji bo vê baweriyê gelek pênaseyên cuda têne kirin. Korkmaz, Elewîtiya Anadolê weke dînekî felsefîk dinirxîne.[146] Ozmen, Elewîtiyê weke rûdaneke Batinî pênase dike û îfade dike ku Elewî, Şertên Îslamê nayînin cih: "Elewî-Bektaşî xwedanê baweriyên Batinî ne. Tiştên weke, nimêj, rojî, Hec ên bi şerîetê re eleqedar bi cih nayînin. Lê zanin ku çar derî –şerîet, terîqet, merîfet, heqîqet- û çil meqam heq in û dizanin ku divabe li gorî van tevbigerin."[147] Li gorî Işik; Elewîtî, baweriyek e ku rehên xwe ji kevneşopiyên kevnar girtine, di nava daîreya Îslamê de bi rêya sadiqbûna Ehlîbeytê teslîmî Xwedê bûye û bi rêya razîbûnê, vê teslîmbûnê nîşan

[146] Esat Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, Berfin Yayınları, İstanbul, 2008, r.16.
[147] İsmail Özmen, *Alevi-Bektaşi Şiirleri Antolojisi*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, b. 1, 1998, r. 20.

dide.[148] Li gorî Çinar; Elewîtî, rêxistineke berfireh a civakî ye ku jiyana endamên xwe li gorî hîmên aşitî û hezkirinê diyar dike û herwiha rêya Elewîtiyê mudaxeleyî tevên beşên jiyana însên dike û ev bawerî komeke hemwelatiyên sondxwarî ye ku ev kom ji canên ku li ser îqrara xwe ne pêk tê.[149] Dîsa li gorî Çinar, Elewî li penava Anadolê li erdnîgariyeke berfireh di şiklê civakên girtî de dijiyan. Xwedanê baweriyeke nepen bûn. Saziyên serbixwe yên ku di nava xwe de xwedan rêxistineke baş bûn û rêz jev re digirtin, baweriya Elewiyan û jiyana wan a civakî sererast dikirin.[150] Uçer jî qebûla "Xweda, Muhemmed, Elî" ya ku bi navê "sisêyan"e weke bingeha Elewîtiyê nîşan dide.[151]

Çend pênaseyên ku bi giştî li ser baweriya Elewîtiye hatine kirin bi vî rengî ne. Lê wextê ku mirov li mijara baweriya Elewîtiyê dinêre pênaseya baweriya Elewiyan û argumanên vê baweriyê li gorî nêrînên lêkolîneran têne nîşandan, gelek caran şîrove û nirxandinên lêkolîneran ji rastiyên vê civakê dûr in. Tê dîtin ku hinek mîsyoner meyldar in hêmanên Mesîhîtiyê di nava Qizilbaşiyê de derxine pêş û Kemalîst jî dixwazin ku vê baweriyê weke mîrata Tirkan nîşan bidin.[152] Gelek misyonerên ku di demên cuda de li nava Qizilbaşan geriyane, hewl dane ku wan weke Protestanan nîşan bidin. Weke mînak wextê ku Herrick çûye nav Qizilbaşan ew weke "Protestanên Kurd" bi nav kirine.[153] Herwiha herçend ku haya akademîsyenên Rojavayî ji nêrînên Suniyan ên neçê yên di heqê Qizilbaşan de hebe jî, wextê ku xebatan li ser Qizilbaşan dikin gelekên agahiyên xwe ji Misilmanên Sunî werdigirin bi vî şiklî fêhmkirina tiştên şaş û rast zehmet dibe.[154] Dîsa metnên dînî yên Yarsanan û Êzîdiyan bi zimanê Kurdî bûn. Lê, *Buyruk*a

[148] Caner Işık, "Alevi İnancında Kadın; Ruhsal Kabullerden Gündelik Yaşama", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, hj.8, Winter 2014, r. 13.
[149] Çınar*, Bahçe Bizim Gül Bizdedir, Eski Çağ'dan Cumhuriyet'e Alevilik*, rr.13-14.
[150] Erdoğan Çınar, *Kayıp Bir Alevi Efsanesi*, Kalkedon Yayınları, İstanbul, 2011, r. 112.
[151] Cenksu Üçer, "Alevî Telakkîde Hz. Muhemed", *C.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi* XIV/1 – 2010, r. 330.
[152] Hans-Lukas Kieser, "Muslim Heterodoxy and Protestant Utopia. The Interactions between Alevis and Missionaries in Ottoman Anatolia", *Die Welt des Islams*, New Series, Vol. 41, Issue 1 (Mar., 2001, r.91.
[153] Moosa, *Extremist Shiites The Ghulat Sects*, r.40.
[154] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", r.446.

Qizilbaşan[155] bi Tirkî bû. Bi awayekî xwezayî yek ji encamên vê yekê ev bû ku xebatên li ser Yarsan û Êzîdiyan ji aliyê kesên ku rabirdûya wan bi Îranê re hebû û meyla wan li ser xebatên Îranî bû ve bêne kirin lê xebatên li ser Qizilbaşiyê ji aliyê Turkologan ve hatine kirin. Bi vî şiklî fikra ku Elewîtî ji Asyaya Navîn hatiye ji têkiliya di navbera Êzîdîtî-Yarsantî û Elewîtiyê de zêdetir hatiye îfadekirin.[156] Ev her du faktor, meylên lêkolîneran û zimanê metnên Elewiyan, ji bo şîroveyên li ser vê baweriyê du faktorên girîng in. Lê wextê ku mirov li şîroveyên li ser vê baweriyê dimeyzîne tê dîtin faktora herî bihêz a ku bûye sedema nêrînên cuda, meylên lêkolîneran in. Gelek lêkolîner, Elewîtiyê rasterast bi Îslamê re têkildar dikin û wê weke şaxekî Îslamê nîşan didin. Lêkolînerên Îranî hîn zêdetir Elewîtiyê bi Şiîtiyê re têkildar dikin û yên Sunî, bi Sunîtiyê re. Weke mînak lêkolînerekî Îranî, Caferiyan, Elewîtiyê weke pîvana Şiîbûnê dinirxîne: "Ji bo Şiîbûnê Elewîbûn pîvan e. Qirnên bihûrî, bi taybetî qirnên şeşem û heftem(k.) Elewî bi Şiîbûna xwe dihatine nasîn. Baweriya ku Elewî Şiî ne lê ne Sunî ne, di nava aliman de serdest e."[157] Lê Ozmen qala nêzîkahiya Elewîtî-Şiîtiyê nake û Elewîtiyê biqasî Sunîtiyê kevnar nîşan dide: "Elewîtî weke Sunîtiyê şaxekî Îslamê ye û bi qasî Sunîtiyê kevn e. Elewîtî li Tirkiyeyê şêweyekî jiyanê ye. Çavkaniya Elewîtiyê Îslam e lê him di hinek doktrînan de û him di pratîkê de cudahiyên Îslamê û Elewîtiyê hene."[158] Dalkiran, Elewîtiyê weke senkronîzasyoneke baweriyên Tirkan ên berê û Şiîtiyê dinirxîne: "Li gorî me Elewîtî ne dînekî cuda ne jî weke mezhebên Îslamê yên din firqeyeke cuda ye. Elewîtî li gel hizrên Îslamê yên tesewufî têkilheviyeke baweriyên Tirkan ên berê û Şiîtiyê ye."[159] Lê heman Dalkiran di heman gotarê de Elewîtiyê weke terîqeteke Sunîtiyê dinirxîne: "Em xwediyê vê baweriyê ne ku Elewîtî bi şêwazê xwe yî taybet di nava Sunîtiyê de weke terîqeteke cuda were nirxandin dê rasttir be." [160] Eroz dibêje: "Herçend ku

[155] Ev pirtûk, ji aliyê her kesî ve weke pirtûka Elewiyan a pîroz nayê pejirandin.
[156] Bruinessen, "Between Dersim and Dâlahû: Reflections on Kurdish Alevism and the Ahl-i Haqq Religion", r.1.
[157] Resûlê Caferiyan, *Tarîxê Teşeyu' der Îran Ez Ağaz Ta Tulu'ê Devletê Safevî*, Neşrê 'İlm, Tehran, 1388(k.), r.79.
[158] Özmen, *Alevi-Bektaşi Şiirleri Antolojisi*, r.45.
[159] Dalkıran, "Alevi Kimligi ve Anadolu Aleviligi Üzerine Bir Deneme", r.116.
[160] h.g., r.95.

nimêjê nekin, rojiyê negirin û mizgeftên wan nebin jî Misilmanbûna Elewiyan bê şik û bê goman e."[161]

Di van şîroveyên ku li ser Elewîtiye hatine kirin de tê dîtin ku nêrînên li ser baweriya Elewiyan ne li gorî rastiyên wan, li gorî berjewendî yan jî armancên lêkolîneran an jî kesên ku ew lêkolîner peywirdar kirine, hatine kirin. Hewla Sunî-Şiiyan ev e ku wan weke Misilmanan nîşan bidin. Mîsyonerên Rojavayî jî hêmanên Mesîhîtiyê derdixine pêş. Bi vî şiklî rastiyên vê civakê têne piştguhkirin û mijara Elewîtiyê tevlîhevtir dibe. Beriya ku em derbasî baweriya Elewîtiyê bibin ku hinekî qala cudahiyên di navbera Qizilbaş û Bektaşiyan de û helwesta rêvebirî û civakên Sunî ya li himberî van civakan bê kirin dê mijar zelaltir bibe. Ji ber ku gelek xebatên ku li Tirkiyeyê hatine kirin Kurdên Elewî piştguh dikin û koka Elewîtiyê bi Bektaşiyan ve girê didin û dixwazin ku Elewîtiyê weke mîrata Tirkan nîşan bidin divê hinek agahî li ser Bektaşiyan bêne dayîn û di pratîkê de qala cudahiyên wan û Qizilbaşan bê kirin.

1.4.1. Cudahî û Şibahiyên di Navbera Elewîtî û Bektaşîtiyê de

Gava ku qala Elewiyan tê kirin bêgoman yek ji kesên ku ewil tê hişê însên Melikoff e. Melikoffa ku bi salan hewl daye ku Elewîtiyê bi Bektaşîtiyê ve girê bide û tê de faktorên Tirkan derxe pêş, paşê bi vê şaşîtiya xwe hisiyaye. Ev yek îfade kiriye lê dîsa jî mikurhatina wê nayê dîtin/naxwazin ku bibînin û ifadeyên Melikoffê yên berê ji angaştên xwe re dikine balpişt. Melikoffê ewil gotiye: "Elewî jî weke Bektaşiyan alîkariyê ji Hecî Bektaşî Welî dixwazin. Di navbera wan de cudahiya bingehîn civakî ye. Elewî, di maweyê sedsalan de bi giştî ji derdorên eşîretî hatine û çiyayî ne; Bektaşî li navendên bajaran civiyane, mirîdên Bektaşiyan ji derdorên xwende hatine û terîqetek ava kirine. Elewîtî ji Bektaşîtiyê nayê veqetandin ji ber ku her du jî girêdayiyê Îslambûna Tirkan in."[162] Li vê derê Melikoff, Elewîtî-Bektaşîtiyê bi Îslam û Tirkîtiyê ve girê dide. "Wextê ku min şibahiyên di navbera Elewî, Yarsan û Êzîdiyan de ferq kirin ez piçekî şaş bûm.

[161] Mehmet Eröz, *Türkiye'de Alevilik ve Bektaşilik*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990, rr. 147-148.
[162] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevîlik-Bektaşîlik Araştırmaları*, r.29.

Heta wê demê min bawer dikir ku Bektaşîtî teqez ji Tirkan hatiye. Lê niha min xwe bi faktorên Kurd ên ku nehatine lêkolînkirin re rûbirû didît." Lê li vê derê tê derxistiye ku faktorên Kurd di nava vê baweriyê de zehf in û îfade kiriye ku Elewî-Yarsan û Êzîdî dişibine hev.

Girêdan û eleqeya di navbera Qizilbaş û Bektaşiyan de hîn baş nayê zanîn.[163] Li gel ku ev eleqa baş nayê zanîn jî kesên ku dixwazin di Elewîtiyê de faktorên Tirkan derxine pêş angaşt dikin ku ev bawerî yek in lê belê Elewî gundî ne, Bektaşî bajarî ne û Bektaşîtiyê dispêrine Tirkan. Eroz dibêje: "Mirov dikare tevên Bektaşiyên ku li gundan dijîn di bin navê Elewî-Qizilbaş de bicivîne."[164] Algul jî dibêje ku "Elewîtî û Bektaşîtî ne du cereyanên cuda yên hizrî ne yan jî ev civak ne du civakên cuda ne, ji eslekî ne û şiklê yek cereyana hizrî ya ku bi awayekî kifş û nepen hatiye rêxistinkirî ne. Piştî zilma Osmaniyan gelek Elewî hilkişiyane serê çiyayên bilind û li wan deran bi cih bûne. Lê hinek li bajaran mane û xebatên xwe bi dizîka bi rê ve birine. Elewî, gundî/çiyayî; Bektaşî, bajarî ne." [165] Noyan jî xwedanê heman nêrînê ye: "Civaka Caferî li Tirkî du şax in: Şaxê Esas Babagan (Bektaşî), şaxê Dedegan (Elewî) ne. Ji Bektaşiyên ku li gundan dijîn re Elewî tê gotin."[166]

Yalman, Erol û Azar bi nêrîneke cihê, cudahiyeke di navbera Bektaşî û Elewiyan tînine zimên: Elewiyên li rojhilatê Tirkiyeyê, li gel ku rîtuel û baweriyên wan hema bêje weke hev in ji Bektaşiyan cuda ne. Di nava Elewiyan de pêşengên olî ji malbatên kifş in, van mîsyonan ji mezinên xwe distînin. Lê li cem Bektaşiyan pêşengên olî bi hilbijartinê têne diyarkirin ji bav bo kur derbas nabin.[167] Her kesê ku bixwaze dikare bibe Bektaşî, lê kesek paşê nikare bibe Elewî divê mirov ji

[163] F.R. Haslok, *Bektaşilik Tedkikleri*, wer. Râgıp Hulûsî, Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, İstanbul, 2000, r.1.
[164] Eröz, *Türkiye'de Alevilik ve Bektaşilik*, r.80.
[165] Algül, *Aleviliğin Sosyal Mücadeledeki Yeri*, rr.25-26.
[166] Bedri Noyan, *Bektaşilik-Alevilik Nedir?*, Ant/Can Yayınları, İstanbul, 1995, r. 10.
[167] Nur Yalman, "Islamic Reform and The Mystic Tradition in Eastern Turkey", *European Journal of Sociology / Archives Européennes de Sociologie / Europäisches Archiv für Soziologie*, Vol. 10, No. 1, Survivances et permanences or Continuity and Reenactment (1969), r.57.

zikmakî ve Elewî be.[168] Bektaşîtî terîqeteke sufî ye û xwedan prensîp û ayînên bîngehîn e lê Elewîtî nasnameyek e ku girîngiyê dide ji dûndebûna Elî. Bektaşîtî berê ji bo her kesî vekirî bû lê ji bo Elewîtiyê veşartîbûn bingehîn e. Di Elewîtiyê de binyat girîng e, divê mirov ji malbateke Elewî be lê di Bektaşîtiyê de ev nîne. Mirov dikare piştre bibe Bektaşî, lê nikare bibe Elewî.[169] Divê bê îfadekirin ku li ser vê xalê nîqaş hene. Ne tiştekî teqez e. Li gorî Çinar, kesek ji zikmakî ve dînê xwe diyar nake, piştî ku mirov bîrewer bû dikarê dînê xwe hilbijêre. Kesê ku xwest bibe Elewî îqrara xwe dide û dibe Elewî.[170]

Azar cudahiyeke din a di navbera Elewî û Bektaşiyan de wisa îfade dike: "Elewî destûrê nadine Bektaşiyan ku tevlî cemên wan bibin, Bektaşî jî nahêlin ku Elewî bikevine meydanên wan. Di terîqetê de –Bektaşîtî- kî bixwaze ku bi kîjan şêxî re întîsabê bike dikare lê di Elewîtiyê de bav talibê kîjan ocaxê be divê zaro jî bibe talibê wê ocaxê, nikare ocaxeke cuda hilbijêre. Di Bektaşîtiyê de pêşengên terîqetê ji nav kesên biperwerde têne hilbijartin lê di Elewîtiyê de rêbertî û pîrtî ji bêv derbasî kur dibin. Destbiraktî –biratiya axretê- di nava Elewiyan de saziyeke gelekî girîng e lê ev tişt di nava Bektaşiyan de nîne."[171] Melikoff jî dibêje ku kevneşopiya destbiraktiyê li cem Elewiyan gelekî girîng e lê ev kevneşopî li cem Bektaşiyan nîne.[172]

Erdogan, Bektaşîtiyê weke terîqeteka Tirkan a ku li Anadolê bi pêş ketiye û berbelav bûye dinirxîne û dibêje ku felsefe, kevneşopî û çanda vê terîqeta ku di bin bandora tesewifê de maye taybetiyên ku mexsûsî Tirkan in nîşan dide.[173]

[168] Erol, "Re-Imagining Identity: The Transformation of the Alevi Semah", r. 376.
[169] Birol Azar, "Benzerlik ve Farklılıklar Ekseninde Alevî Bektaşî İnançları Üzerine Bir Değerlendirme", *Fırat Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi* 10:2 (2005), r. 82.
[170] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir, Eski Çağ'dan Cumhuriyet'e Alevilik*, r.14
[171] Azar, "Benzerlik ve Farklılıklar Ekseninde Alevî Bektaşî İnançları Üzerine Bir Değerlendirme", rr. 83-84.
[172] Melikoff, *Hacı Bektaş Efsaneden Gerçeğe*, r.271.
[173] Kutluay Erdoğan, *Alevilik Bektaşilik*, İletişim Yayınları Cep Üniversitesi, İstanbul, 1993, r.41.

Xeyn ji van cudahiyên ku heta niha hatin nîşandan, di nava van her du baweriyan de tiştên weke diwazdeh îmaman, baweriya Xweda-Muhemmed- Elî, meha Muharremê, ayîna cemê tiştên hevpar in. [174]

Weke ku tê dîtin di navbera Bektaşî û Elewiyan de cudahiyên zelal hene. Lê ji bo ku mijarên Bektaşîtî û Elewîtiyê hinekî din werine fêhmkirin divê mirov li têkiliya Hecî Bektaş û Elewîtî-Bektaşîtiyê binêre. Wextê ku qala Bektaşiyan tê kirin kesê ku rasterast qala wî tê kirin Hecî Bektaşî Welî ye. Lê ev kesayet jî di lêkolînên ku ne ji aliyê kesên ku Elewîtiyê dispêrine Tirkan ve hatine kirin de bi rengekî cuda xwiya dike.

Çinar dibêje ku eleqeya Hecî Bektaşî Welî û Elewîtiyê hatiye dîzaynkirin. Ev dizayn, vehûnandineke bi nezanî ye û hewl dide ku Elewîtiyê ji kokên wê qut bike aliyekî wê bi beyarên Asyaya Navîn û aliyê wê yî din bi çolên Erebîstanê ve bide girêdan. Qebûlkirina Hecî Bektaşî Welî weke avakerê rêyê û tevgera Babaiyan weke destpêka Elewîtiyê înkarkirina hebûna Elewîtiyê ya berî sedsala sêzdehan û rabirdûya wê ya bi hezaran sal e. Armanca vê teza ku tê xwestin ku li ser Elewiyan bê vehûnandin ev e. Bi senaryoya ku ji Elewiyan re dibêjin dîroka we ev e dixwazin ku dîroka Elewîtiyê ya deh hezar salî bidine jibîrkirin.[175] Angaşta ku dibêje Hecî Bektaşî Welî çavkaniya Elewîtiyê ye herçiqasî weke tevên derewên ku li ser Elewiyan hatibine kirin, hatibine nivîsandin, hatibine dubarekirin û bi gelemperî hatibine qebûlkirin be jî pejirandina wê ne rast e.[176] Dibe ku angaştên Çinar ji bo Elewiyên ku ne Bektaşî ne rast bin lê divê were îfadekirin ku ti balpiştên ku hebûna Elewiyan a beriya niha bi deh hezar sal bipeyitînin li ber destan nînin.

Angaşta ku dibêje ku Sultan Sehak (m. sedsala 15an), Hecî Bektaşî Welî weke xelîfeyê xwe ji bo ku terîqeta Ehlê Heqiyê li Anadolê ava bike şandiye wê derê jî heye. Wî terîqetek li gorî hêmanên Ehlê Heqiyê ava kir û paşê navê vê terîqetê bû

[174] Azar, "Benzerlik ve Farklılıklar Ekseninde Alevî Bektaşî İnançları Üzerine Bir Değerlendirme", r. 84.
[175] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir, Eski Çağ'dan Cumhuriyet'e Alevili*k, , r.36.
[176] Çınar, *Dargah'ın Sırrı Aleviliğin Kayıp Hafızası*, r.55

Bektaşî.[177] During jî dibêje ku "Li gorî kevneşopiyê te qebûlkirin ku Sultan Sehak baweriya Yarsantiyê li Îran, Kurdistan û Loristanê ava kiriye, piştî ku li Kurdistana Îranê sed salî hikimdariya arişî kiriye ji holê wenda bûye paşê li Anadolê bi navê Hecî Bektaş derketiye holê."[178] Li gorî van angaştan, bingeha Bektaşîtiyê ji Yarsantiyê tê lê mixabin ev angaşt li Tirkiyeyê nayêne nîqaşkirin. Bektaşîtî weke bûyereke ku rasterast bi Hecî Bektaş re dest pê kiribe tê nîşandan û kokên wê weke baweriyên kevn ên Tirkan têne nîşandan, lê mijara ku Hecî Bektaş di bin bandora kîjan cereyanên wê demê de maye zêde nayê nîqaşkirin. Dîsa tê angaştkirin ku rola Hecî Bektaşî Welî di Misilmanbûna Anadolê de zehf e. "Hecî Bektaşî Welî lehengek û pêşengekî manewî ye ku di Misilmanbûn û Tirkbûna Anadolê de xwedan roleke girîng e."[179] Li vê derê jî tê îfadekirin ku Bektaşî Welî di Misilmanbûn û Tirkbûna şêniyên Anadolê de xwedanrol e.

Helbet ji bo ku cudahiyên di navbera Bektaşî û komên Elewî yên din de çêtir bêne fêhmkirin divê têkiliyên di navbera rêveberiyên serdest û van civakan de jî bêne analîzkirin. Babaî, Qizilbaş û Rafiziyên ku îro bi şiklê Elewî têne binavkirin him wextê Selçukiyan him jî wextê Osmaniyan di pozîsyoneke muxalif de bûn. Lê tekyayên Bektaşiyan ên ku sedsala pazdehan bi destûra Osmaniyan hatibûne avakirin hevalbendên Osmaniyan bûn.[180] Bektaşîtiya ku sedsalên çardeh û pazdehan bi lez berbelav dibû bi bandora Hecî Bektaşî Welî hema bêje tevên terîqetên Şiî Batinî di nava xwe de hebandine. Padîşahên Osmaniyan piştgirî dane vê yekê û tekyayên Bektaşiyan ên ku salên avabûna Osmaniyan piştgirî dane wan parastine û guhdariya wan kirine lê bi ser Elewiyên ku serhildan kirine de çûne. Wextê ku dokumentên dîrokî têne analîzkirin tê dîtin ku Bektaşî ji Qizilbaşan cihê hatine dîtin. Qala ku Bektaşî tevlî serhildanan bûne nayê kirin. Li gorî dîrokzanên Osmanî, yên ku serhildan kirine Qizilbaşên Tirkmen ên ku li pey kesekî

[177] Hecî Bektaşî Welî, *Makalatê Xeybiye ve Kelamatê Eyniye*, ber. Seyîd Ihsanê Şukirxuda, Weşanger: Nivîskar, Tehran, 1381 (k.), r.4.
[178] Jean During, "Avrupa ve İran'daki Ehl-i Hak Araştırmalarının Eleştirel Bir Değerlendirmesi", in *Alevi Kimliği*, ber. Olsson, E. Özdalga, C. Raudverer, , wer. Bilge Kurt Torun, Hayati Torun, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 2010, r.138.
[179] Ali Yılmaz-Mehmet Akkuş-Ali Öztürk, *Alevî-Bektaşî Klasikleri 2, Makâlât*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, 2007, r. 13.
[180] Bayrak, "İnanç ve Kültür Kaynaklarıla Kürt Aleviliği", r.545.

xwedanenas, nezan, jirêderketî çûne ne.[181] Xeyn ji van çavkaniyên ku nêrîna dewletên serdest a ji bo Bektaşî û komên Elewî yên din nîşan didin nêrîna ku Osmaniyan, bixwe Bektaşîtî ava kiriye jî heye: "Li gorî Îslamîstên Şiî wextê ku tehdîda Şah Îsmaîl û mirîden wî hebû Osmaniyan ji bo ku rê li ber belavbûna wî bigirin Bektaşîtî ava kirin."[182]

Sala 1919an 185 heb gotar ji aliyê Baha Saîd Bey ve di rojnameya *Memleket*ê de hatine weşandin di gotara bi navê "Rûyê Hundirîn ê Welêt: Li Anadolê Perestgehên Veşartî" de tê dîtin ku Bektaşî û Qizilbaş ji hev cuda hatine nîşandan. Hatiye îfadekirin ku Elewî-Bektaşî ji dehan sisiyê nifûsa gelê Anadolê pêk tînin. Dîsa di van gotaran de mezhebên li Tirkiyeyê weke firqeyên Îsmailî, Îbadî, Tawusî, Êzîdî, Tahtaci, Surek, Qizilbaş, Sufiyan û Bektaşî hatine îfadekirin.[183]

Di çavkaniyên ku heta niha hatine nîşandan de tê dîtin ku Bektaşî û Qizilbaş ji hev cihê ne û herwiha qala ti nokakiyên di navbera dewletên serdest û Bektaşiyan de nayê kirin. Lê wextê ku mijar dibe Qizilbaş an jî Elewî rewş ji binî diguhere. Qizilbaş, ji aliyê dewletên serdest ve seraqet weke unsûreke xetere hatine dîtin. Markoff, vê rewşê wisa ifade dike: "Elewiyên ku berê bi navê Qizilbaş dihatine nasîn, ji ber ku xwedanên meyla serhildanê bûn û çalakiyên nepen dikirin li cem otorîteya Osmanî ne ewle bûn û Osmaniyan bawerî bi wan nedîanîn."[184] Karolewski dibêje: "Hema bêje di tevên lêkolînên ku têne kirin de qala du hêmanên dijqizilbaş tê kirin: Kêmkirina wan bi binbarîtiya Îslama Sunî, bawerî û tevgerên wan ên neexlaqî û lewitî."[185] Divê were îfadekirin ku civaka Qizilbaş bes ne ji aliyê dewletên serdest ve weke xetereyê hatiye dîtin. Ev civak, ji aliyê civaka Sunî ve jî hatiye reşkirin, heqaretên dijwar li vê civakê hatine kirin û ev civak, bi

[181] Atilla Özkırımlı, *Alevilik Bektaşilik Toplumsal Bir Başkaldırının İdeolojisi*, Cem Yayınevi, İstanbul, 1996, r.183.
[182] Tahire Erman and Emrah Göker, *Alevi Politics in Contemporary Turkey*, Middle Eastern Studies, Vol. 36, No. 4 (Oct., 2000), rr. 105-106.
[183] Baha Said Bey, *Türkiye'de Alevi-Bektaşi, Ahi ve Nusayri Zümreleri*, r.33.
[184] Irene Markoff, "Introduction to Sufi Music and Ritual in Turkey", *Middle East Studies Association Bulletin*, Vol. 29, No. 2 (December 1995), r.158.
[185] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", r.449.

tiştên giran hatiye tometbarkirin. Nimêjnekirina wan, rojînegirtina wan, eraqvexwarina wan hemû bûne bingeha pîskirina wan. Tawanbarkirina herî berbelav ev bû ku digot Qizilbaş bi şevê dicivin û di van civînên xwe de bi hev re dikevine nava têkiliyên zayendî. Navê Qizilbaş, hêdî hêdî hate wateya kesên ku dicivin û jixweremere seksê dikin. [186]

Oz jî îfade dike ku him rewşenbîrên Osmanî him jî yên Îslamê, Elewîtî misêwa reş kirine. Şerîetvanên Osmaniyan li dijî Elewîtiyê kampanyayên kirêtkirinê bi rê ve birine. Îrana Şiî weke dijminê herî gewre hatiye îlankirin, Elewiyên li Tirkiyeyê bi şiklê kafirî, xwedanenasî, Qizilbaşî, Rafizîtîyê hatine binavkirin. Bi hincetên ciyawaz, gelê Elewî hatiye kuştin û nefîkirin. Elewîtî bi ti şiklî weke Îslamê, rêyeke Îslamê nehatiye dîtin.[187]

Markoff hinek tiştên ku ji bo Elewiyan têne gotin rêz kirine û îfade kiriye ku ev tişt ne rast in: "Ji ber ku Elewî ji aliyê siyasî ve tawanbar bûn, mîtên li ser jirêderketina wan jî her ku çû mezintir bûn. Ew; weke kesên bêexlaq, eraqvexwer, îmanşistên ku îbadetên rojane nakin, bêrojî, kesên ku naçine Hecê, kesên ku jinan tevlî ayînên xwe yên dansê, eraqê û seremoniya 'vemirandina mûmikê' dikin, mirovên lewitî yên ku piştî têkiliya zayendî xwe helal nakin û nimêjê jî dilewitînin, kesên ku ewlehiya dewletê tehdîd dikin têne pênasekirin. Lê kelecana ku rastiya meselê dide kêmtir e, cihê serxweşî û tevgerên neexlaqî yên zayendî di ayînên Elewiyan de nîne."[188]

Erman û Goker hinek şîroveyên li ser Elewîtiyê bi vî şiklî dinirxînin: "Hinek şîrovekerên nijadperest ên Elewîtiyê, Şamanîzma di nava senkretîzma Elewîtiyê bi awayekî bihêz derdixine pêş û angaşt dikin ku Elewîtî Sunîtiya Tirkmenan a dema ku Îslam pejirandine- an jî naçar mane ku bipejirînin- ye. Elewîtî, li gorî van şîrovekerên nîjadperest, bûye baweriyeke ku endamên wê rîtuelên Sunîtiyê

[186] h.g., rr.442-443.
[187] Öz, *Osmanlı'da Alevi Ayaklanmaları*, r.13.
[188] Irene Markoff, "The Role of Expressive Culture in the Demystification of a Secret Sect of Islam: The Case of the Alevis of Turkey", *The World of Music*, Vol. 28, No. 3, Islam (1986), rr.43-44.

pêk nayînin, bawer dikin ku Elî Xweda ye, jinên xwe lev parve dikin, û bûye jirêderketineke ku bi awayekî hêsan dikeve şiklê Komînîzmê."[189]

Qizilbaş ne bi tenê ji aliyê dewlet û civakên Sunî ve rastî heqaretan hatine, hinek lêkolîneran jî di xebatên xwe de ji bo Qizilbaşan îfadeyên giran bi kar anîne. Weke mînak, di ferhenga Meydan Larousse de Qizilbaşî bi şiklê "Têkiliya zayendî bi xizmên xwe re" hatiye îfadekirin. Di ferhenga Elmanî-Tirkî (Wörterbuch) ya ku Prof. Dr. Cemal Koprulu-Dr. Karl Stewrwald amade kirine de: Qizilbaşî (Bulutschande): Zinêya di nava xizman de; Qizilbaş: Kesê ku bi xizmên xwe re zinê dike. Di ferhenga Ahmet Karaahmetoglu ya Frensî-Tirkî, Tirkî-Frensî ya ku weşanên Fonoyê de çap kiriye de ji bo peyva "inceste"[190] du wate hatine diyarkirin. Ya ewil zinêya bi xizman re, ya diduyan Qizilbaşî.[191]

Dîsa tiştekî ku mirov gelekî lê rast tê piştguhkirina Kurdên Elewî ye. Erdogan, bêyî ku ti çavkaniyan nîşan bide Kurdên Elewî weke Tirkên tisî nîşan dide: "Di nava Elewiyan de yên Zaza û Kurd jî hene. Lê Elewîtiya Anadolê xwe dispêre nijadê. Bi Kurdî axaftina wan nabe nîşaneya Kurdbûna wan. Ew kes, Tirk in lê ji ber îhmalkariya Osmaniyan bûne Kurd. Teqez e ku Elewiyên Kurd bi eslê xwe Tirk in. Yên ku li Anadolê Elewî ne û dibêjin em Kurd in ne Kurd in, Tirkên tisî ne."[192]

Tê dîtin ku him destpêka Bektaşîtiyê him jî kesayeta Hecî Bektaş nîqaşbir in. Lê ev mijar, di gelek lêkolînên ku li Tirkiyeyê hatine kirin de weke ku esihiyên dîrokî bin têne qebûlkirin. Weke ku li jorê hate îfadekirin Bektaşî tevlî serhildanan nebûne, wan û dewletê lev kirine, navên xerab li wan nehatine kirin. Lê Qizilbaş rastî heqaretên pir dijwar hatine û naçar mane ku gelek caran serî hildin. Dîsa ferqên di navbera wan de li jorê hatin îfadekirin. Gelo êdi çawa dibe ku hewl bidin wan weke hev nîşan bidin û bêjin Bektaşî bajarî ne lê Qizilbaş gundî ne. Dîsa xaleke girîng Hecî Bektaş e. Gelekên lêkolîneran angaşt dikin ku ji Xoresanê hatiye û baweriyên berê yên Tirkan û Misilmantî kelijandine. Lê baş tê zanîn li

[189] Erman û Göker, "Alevi Politics in Contemporary Turkey", r.107.
[190] Ev peyv di Frensî de tê wateya "ensest"ê.
[191] Akman, *Onaltıncı Asır Osmanlı Toplumunda Bellibaşlı Kızılbaş İsyanları*, r.15.
[192] Erdoğan, *Alevilik Bektaşilik*, rr.45-46.

cihê ku ew jê hatiye, Îran-Xoresan, baweriya Yarsantiyê hebûye. Gelo nabe ku bingeha fikrên wî Yarsantî be. Jixwe li jorê me angaştên bi vî şiklî diyar kirin. Divê li ser vê îhtîmalê jî were fikirîn û wextê ku mirov şibahiyên di navbera Yarsantî û Elewîtiyê de dide ber hev ev îhtimal bihêztir dibe.

Weke ku di beşên jorî de jî hatibû îfadekirin Elewîtî ne komeke xwerû ye. Komên Qizilbaş, Bektaşî, Nuseyrî, Tahtaci, Ehmedî, Îsmaîlî, Çepnî, Işik, û hwd. weke Elewiyan têne binavkirin. Helbet wextê ku hewl bê dayîn ku ji bo van koman bi navê baweriya Elewîtiyê heman tişt bêne îfadekirin dê şaşîtî derkevine holê. Ji ber ku mijara me Kurdên Elewî ne -bi bêjeyên weke Qizilbaş, Rêya Heqiyê, Çarek têne binavkirin- agahiyên di vê beşê de di heqê Kurdên Elewî de ne. Tiştên ku di lêkolînan de herî zêde derdikeve pêş hewla nêzikkirina Elewiyan û Misilmanan e. Di van hewldanan de argumana herî bihêz xelîfe Elî ye. Di beşên berê de qala Elî û Elewîtiyê hatibû kirin. Ji bo ku pêwendiya Elewîtî û Misilmantiyê baştir were fêhmkirin divê pratîkên Îslamê û yên Elewîtiyê bêne berawirdkirin.

1.4.2. Pratîkên Baweriyê yên Îslamê û Elewîtiyê

Tevên dîn û baweriyan li ser mensûbên xwe hinek tiştan ferz dikin û bi hinek taybetiyên xwe ji dîn û baweriyên din cuda dibin. Wextê ku Elewîtî dibe mijar nîqaşên herî xurt li ser Misilmanbûn-nemisilmanbûna wan in. Ji bo ku têkiliya di navbera Misilmantî û Elewîtiyê were fêhmkirin ku pratîkên dînî yên van her du baweriyan bêne zanîn dê nêrîneke zelaltir derkeve holê. Weke ku berê jî hatibû îfadekirin Elewî ji komeke homojen pêk nayên ji ber vê yekê mirov nikare ji bo tevên Elewîyan qala heman hêmanên baweriyê jî bike. Di vê beşê de agahiyên ku hatine dayîn li ser pratîkên baweriya Kurdên Elewî ne anku pratîkên Kurdên Elewî û Îslamê hatine berawirdkirin.

1.4.2.1. Kelîmeya Şehadetê-Îqrar

Ji bo ku ferdek bibe Misilman, divê bi devê xwe bêje ku Xweda yek e û Muhemed qasidê wî ye û bi dilê xwe bawer bike. Lê ne di xebatên ku me li qadê kirin de ne jî di lêkolînan de ji bo Kurdên Elewî qala tiştekî wilo nayê kirin. Ji bo Elewîbûnê şertê ewil îqrar e. Wextê ku mirovek bîrewer dibe û dixwaze ku Elewîtiyê hilbijêrê diçe cem pîrekî îqrara xwe didiyê û bi vî şiklî dibe Elewî. Ji bo ku ew ferd îqrara xwe bide Cema Îqrarê tê lidarxistin. Cema Îqrarê ji bo ku ferd bikeve "rê"yê yekem îqrara mezin e. Kesekî ku îqrara xwe nede nikare bibe Elewî.[193] Kesê ku dixwaze îqrara xwe bide diçe hizûra pîrekî û qewl dide ku dê pêdiviyên Elewîtiyê bi cih bîne û îqrara xwe xera nake. Bi îqrardayînê him ferd dikeve rêya Elewîtiyê û him jî dest ji dinê dikşîne. Wextê ku ev ferd îqrara xwe xera bike biqisûr tê hesibandin û ji civakê tê dûrxistin.

1.4.2.2. Nimêj-Cem

Şertê Îslamê yê diduyan nimêj e. Divê her ferdê Misilman ê ku balix bûye rojê pênc caran berê xwe bide Kabeyê û nimêjê bike. Lê di nava Elewiyan de tiştekî wilo nîne. Jixwe li jorê gelek caran hate îfadekirin ku ji ber ku nimêjê nakin hatine tawanbarkirin. Îbadeta Elewiyan a bingehîn cem e. Li ser destpêka cemê û pêkanîna wê gelek angaşt û nîqaşên cuda cuda hene.

Mizgeft ji bo Misilmanan û dêr ji bo Mesîhiyan çi be ji bo Elewiyan jî cem ew e.[194] Îbadeta eslî ya Elewiyan cem e. Herçiqasî ku cem weke ayîna bingehîn a Elewiyan be jî di heqê wate û destpêka ayîna cemê de nêrînên cuda hene. Li gorî kevneşopiyê kesê ku cara ewil cem organîze kiriye Behlûl e.[195] Cem, nasnavê Silêman Pêxember û Skenderê Zilqerneyn e û navê bayê ku Silêman Pêxember

[193] Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, r.373.
[194] Shahab Vali, *Kurdên Yarsan*, Avesta, wer. Sevda Orak Reşitoğlu, Stembol, 2018, r. 102.
[195] *h.b.*, r. 102.

hikim lê kiriye jî Cem e.[196] Vali, cemê bi padîşahê mitolojik ê Îranî, Cemşîd, re têkildar dike.[197] Li gorî Korkmaz, koka bêjeya cema Elewiyan bi Farisî ye, herwiha di efsaneyên Îranê de Cem navê padîşahê ku eraq dîtiye û civînên ku di wan de eraq tê vexwarin li dar xistine, Kîsra, ye.[198] Li gorî Omarkhali peyva cemê bi cem'a Erebî ya ku tê wateya kombûnê re têkildar e. Mimkun e ku bi pêyvên cem û cum ên Kurdî ku têne wateya dan (danên rojê) jî têkildar be. Ev tekabulî cema Yarsanan a ku xwarin tê xwarin û tê pîrozdîtin jî dike. Xeyn ji van, peyva cemê ya ku xwe dispêre xwendina helbestên pîroz, Cemşîdê ku teceliya Sultan Sehak û muhtemelen Baba Yadgar e temsîl dike.[199]

Herçend ku di heqê destpêk û pênaseya cemê de nîqaş hebin jî ayîna cemê ji bo Elewiyan xwedan cihekî girîng û taybet e. Gelek fonksiyonên cûrbicûr tîne cih û di ayinê de her pirsgirêk çareser dibe.[200] Hinek ji van fonksyonên ayîna cemê ev in: îbadet, perwerdehî, civakîbûna olî, kontrola şexsî, kontrola civakî.[201] Di van ayînan de li gel îbadetan perwerdehî jî tê kirin; armanca ayîna cemê bes ne nîşandana Elewîtiyê ye. Weke tevên ayînên olî armanca van ayînên cemê jî perwerdehiya mirovan e ku dixwaze wan bike evdê kamil. Ferdê ku beşdarî ayînê dibe îbadeta xwe bi cih tîne û di maweyê ayînê de perwerde dibe dîsa ayîn bi rêya perwerde û modelbûnê rê li ber kontrola şexsî û kontrola civakî jî vedike.

Herçîqasî ku cem ayîna sereke ya Elewiyan be jî li ser pênase û destpêka wê lihevkirin nîne. Rençer ji bo cemxaneyê vê pênaseyê dike: "Cemxane îro cihê ku Elewî Bektaşî erkanê xwe lê dikin, îqrara xwe didin, fêrî çar derî çil meqamî dibin e. Bêjeya cemxaneyê piştî salên 1970yî di wateya cihê ku Elewî rîtuelên xwe lê

[196] Ahmet İshak Demir- Yaşar Şanlı, "Cem Dergisi'nin Sunumuyla Alevi Gelenekte İbadetler", *e-makalat- Mezhep Araştırmaları Dergisi* 11, h. 1, Bahar 2018, r. 24.
[197] Vali, *Kurdên Yarsan*., r. 93.
[198] Esat Korkmaz, *Alevilik ve Bektaşilik Terimler Sözlüğü*, Anahtar Kitaplar Yayınevi, İstanbul, 2005, r. 149.
[199] Partow Hooshmandrad, "Ayinsel olarak Hayat: Guran bölgesindeki Kürt Ehli Hak'ın İbadet Uygulamaları", in Haz. Khanna Omarkhalı, *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*, Avesta Yayınları, wer. İbrahim Bingöl, İstanbul, 2014, r. 116.
[200] Vali, *Kurdên Yarsan*., r. 102.
[201] Ramazan Uçar, "Bir Fenomen Olarak Ayin-i Cem (Sosyolojik Bir Yaklaşım)", *Dini Araştırmalar,* b. 7, hj. 19, rr. 78- 81.

dikin hatiye bikaranîn."[202] û rabirdûya ayînên ceme ji du hezar salan zêdetir nîşan dide: "Ayînên cemê civînên ku herî kêm du hezar sal rabirdûya wan heye û veguhestine rengekî îslamî ne."[203] Rençber dîsa îfade dike ku Daru'l Erkan cemxane ye: "Hinek nivîskarên Elewî angaşt dikin cemxaneya pêşî di salên ewil ên Îslamê de hatiye avakirin. Piştî ku Hz. Muhemed li Mekihê dest bi teblîxa wehiyan kiriye bi çend salan rêxistineke nepenî ava kiriye. Ev der, ji bo rêvebirina cimetê û pêkanîna îbadetan weke baregehekê hatiye bikaranîn. Ev cimeta bi navê Daru'l Erkan cemxaneyeke veşartî ye. Ev kuliyeya ku paşê weke Mescîd-î Nebevî hatiye binavkirina cemxaneyê bixwe ye."[204] Dîsa Rençber, pêkanîna cema birêkûpêk heta bi dema Şah Îsmaîl dibe: "Wextê ku em li çavkaniyên dîrokî dinêrîn mimkun e ku mirov pêkanîna ayîna cemê ya birêkûpêk heta bi dema Şah Îsmaîl bibe. Em dikarin bibêjin gelek diayên ku di cemê de têne kirin, tewhîd, gulbang, naat, û mîracan ji aliyê Şah Îsmaîl ve hatine nivîsîn.[205]

Li gorî hinek Elewiyan, erkanên cemê xwe dispêrine axaftinên dema ku Hz. Muhemed ji mîracê vegeriyaye û di rê de Meclîsa Çilan ziyaret kiriye û bi kesên ku li wê derê ne kirine. Her erkana cemê bîranîn, zindîkirin û ji aliyê giyanî ve jinûvejiyankirina vê bûyerê sembolîze dike. Elewî angaşt dikin ku cema ewil li vê derê hatiye kirin.[206] Lê belê Korkmaz, van angaştan qebûl nake û dibêje ku: "Cema Çilan û rêwîtiya Mîracê tiştên dûrîaqilan e û bi temamî hatine vehûnandin. Felsefeya Elewî-Bektaşiyan mucîzeyan qebûl nake. Ev feslefe xwe dispêre êqil."[207]

Cemê kengî dest pê kiribe û cemxane bi çi şiklî ava bubin bila bibin îro ayîna cemê ayîneke taybet e û ji gelek aliyan ve ji ayînên civakên derdora Elewiyan vediqete. Kaptan, hesabdayînê weke taybetiyeke vê ayînê dinirxîne: "Tiştê ku

[202] Fevzi Rençber, "Alevi Geleneğinde "Cem Evinin" Tarihsel Kökeni", *Dinbilimleri Akademik Araştırma Dergisi*, b. 12, hj. 3, 2012, r. 80.
[203] *h.g.*, r. 76.
[204] *h.g.*, r. 81.
[205] *h.g.*, r. 76.
[206] *h.g.*, r. 77.
[207] Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, r.49.

îbadeta cemê ji îbadetên baweriyên din cuda dike ev e: Kesên ku beşdarî cemê dibin divê hesêb bidine civakê. Kesên ku beşdarî cemê bûne divê ji hev razî bin. Ku dilên du kesên ku beşdarî cemê bûne bi hev nexweş be heta ku ew, li hev newin cem dest pê nake."[208] Dîsa xaleke girîng a ayîna cemê ev e ku jin jî tevlî ayînan dibin. Ev xal, li cem hinek komên ku weke Elewî têne binavkirin û ceme li dar dixin diguhere lê îro di cemên Kurdên Elewî de jin-mer, piçûk-mezin, bi hev re beşdarî ayînan dibin.

Wextê ku qala cemê tê kirin dibe ku weke yek ayîna standart were fêhmkirin lê divê were zanîn ku cem, ne ayîneke ku her demê li gorî heman armancê û bi heman şêweyî pêk tê ye. Li gorî armanca kombûnê cûreyê cemê û ayînê jî diguhere. Munzur Çem li gorî agahiyên ku ji Pîr Alî Balî girtine û lêkolînen xwe cûreyên cemê bi vî şiklî dane: [209]

Cema Deriyê Rêber û Ketina Rêyê: Ev cem bi pêşengiya rêber pêk tê. Du kesên ku biryar dane ku bibine birayên axretê bi rêya vê merasîmê vê pêywendiya di navbera xwe de qewîn dikin.

Cema Îqrarê û Deriyê Pîr: Du kesên ku bûne birayê axretê piştî zewacê vê carê li gel hevserên xwe tên û ev pêywendiya di navbera wan de formeke malbatî digire. Ev cem bi pêşengiya pîr pêk tê.

Cema Merîfetê: Deriyê merîfetê murşîdê kamil temsîl dike. Murşîd, şertên deh meqamên ku divê talib fêr bibe jê re dibêje. Ji bo ku kesek karibe beşdarî vê cemê bibe divê diwazdeh salan diwazdeh cemên îqrarê dîtibin. Di vê cemê de murşîd talib diceribîne.

Cema Tazî (Uryan), Sirra Heqîqetê: Pêpelûka herî bala ya ocaxên Elewiyan e. Ji kesên ku gihane vê mertebeyê re, qutbê arifan, heq uryan, pêşengê çilan tê gotin. Divê kesê ku gihabine vê mertebeyê tevên xizmetên çar derî û çil meqamî dîtibin û dest ji dinyayê kêşabin û bi her awayê xwe bûbine evdê kamil.

---

[208] Remzi Kaptan, "Alevi Duaları Gülbanklar", http://www.alevitentum.de/Gulbanklar.pdf, (d.g. 14.03.2020), r.8.
[209] Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş,* rr. 29-31.

Cema Xizir: Ev cem ji bo Xizir tê kirin.

Cema Şînê: Ji bo hezkirina 12 îmaman piştî diwazdeh roj rojî tê lidarxistin. Çavkaniya vê rojiyê qetilkirina Hz. Hiseyn e.

Cemên Muhabbetê: Ji bo ku rihên mezinê baweriyê şad bibin têne kirin. Can-Elewî-, vê cemê di rêbertiya pîr de li gorî xwesteka dilê xwe pêk tînin.

Xeyn ji van Cema Gaxanê, Cema Çewreşan an jî Qilxeran, Cema Newrozê Martî yan jî Qere Çarşemeyê Martî jî hene.

1.4.2.3. Rojî

Şertê sisiyan ê Misilmantiyê rojî ye. Divê her Misilmana/ê ku balix bûbe miha Remezanê rojiyê bigire. Rojî ji şeveqê heta ku roj here ava dewam dike. Divê di vî wextî de tiştek neye xwarin û vexwarin. Xeyn ji rojiya Remezanê yî ku ferz e rojiyên sinet jî hene. Meha Recebê sê roj, meha Şabanê jî sê roj rojî sinet in, rojiya şeşekan jî heye. Şeşek roja piştî Eyda Heciyan dest pê dikin û heta ku ew meh biqede ku şeş roj rojî bêne girtin sinet bi cih tê. Rojiya Eşûreyê jî heye. Heyamê Nebî Silêman zilamekî nan dibir li ser kunemîroyan difiridand da bixwin. Roja Eşûreyê jî nan firidandiye lê mîroyan dest nedane firdikên nên. Zilêm, ji Nebî Silêman pirsiye bê çima mîro firdikên nên naxwin Nebî Silêman gotiye tevên ajelan roja Eşûreyê bi rojî ne. Wextê Pêxember, Cihûyan jî ev rojî roja şemiyê girtine êdî Pêxember gotiye sala pêşiya me em dê şemî û yekşemê bigirin da ku ya me û ya Cihûyan ne weke hev be. Lê wê salê rehmet kiriye. Rojiyên Misilmanan, Misilmanên Sunî, bi vî şiklî ne. Helbet rojî ne bes li def Misilmanan, di gelek dînan de bi şiklê cihê cihê heye. Niha em dê li gorî çavkaniyên cuda qala rojiya Elewiyan bikin û bi rojiya Misilmanan re berawird bikin.

Muherem meha ewil a salnameya Koçî ye. Beriya Îslamê jî roja dehan a Muheremê pîroz dihate hesibandin û rojî dihate girtin. Dehê Muharrema Koçî neviyê Pêxember û kurê Hz. Elî, Hz. Hiseyn, li Kerbelayê bi emrê Yezîd, xelîfeyê

Emewiyan, hate şehîdkirin. Rojiya Muheremê xwe dispêre van bûyerên Kerbelayê.[210]

Elewî meha Muheremê diwazdeh rojan rojiyê digirin. Li gorî gelek kesan ev rojî ji bo şîna Kerbelayê tê girtin. Lê Çinar vê yekê qebûl nake û angaşt dike ku deh hezar sal rabirdûya vê rojiyê heye. Gelên Asyaya Rojava, bawer dikirin ku piştî rojên xelayê û tarîtiyê dê rojên xweş werin. Ev gel, ji bo ku van rojên zehmet di bîra xwe bînin ji deh hezar salan were rojiyê digirin. Ev rojî ne şîn e, spasî ye. Spasiya ji bo filitîna ji xelayê û ji rojên zehmet. Piştî rojiyê, bi qûtê ku di binê kîsên wan de dimîne weke sembola rojên xelayê ji nû ve xwarinê çêdikin. Navê vê xwarinê Eşûre ye. Tê gotin ku ev rojî piştî Kerbelayê derketiye holê û bo şîna diwazdeh îmaman tê girtin. Hz. Hiseyn îmamê sêyem e. Çima piştî mirina Hiseyn, şîna neh îmamên ku dê werin bê girêdan, beriya ku ev mirov bêne dinyayê çawa dihate zanîn ku dê bibine îmam û bi şiklekî trajik dawî li jiyana wan bê?[211] Bêgoman ev pirs ji bo pêwendiya rojiya Muheremê û diwazdeh îmaman pirseke girîng e, wextê ku vê rojiyê piştî rûdanên Kerbaleyê dest pê kiribe nabe ku şîna diwazdeh îmaman be, çikû Hiseyn îmamê sêyem e û neh îmam piştî wî hatine lê dibe ku bi çûyîna zemên re wate û armanca vê rojiyê şikil guherîbe herwiha peyitandina angaştên Çinar ên ku rabirdûya vê rojiyê dibe heta bi deh hezar sal berê, karekî qurs e. Helbet rojiya Elewiyan ne bes rojiya Muheremê yê, rojiyên wan li gorî armanc û wateya xwe diguherin. Bi şiklekî giştî Li cem Kurdên Elewî rojî bi vî şiklî nê:

Gaxan: Weke Noela Mesîhiyan e. Tê gotin ku berdewama rojiya Gaxanbarê ya Zerdeştiyê ye. Sê rojan rojî tê girtin roja çaran cejn e. Ev cejn bi heman şêweyî li cem Êzîdiyan bi navê Cejna Êzî û li cem Yarsanan bi navê Cejnî Merrnewî jî heye.

[210] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, *Alevi-Bektaşi İnancının Esasları*, r.52.
[211] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir*, r.35.

Rojiya Xizir: Dema wê hinekî biguhere jî bi gişti ji nîvê rêbendanê heta bi dawiya sibatê wextê wê heye. Sê rojan rojî ye roja çaran cejn e, cejna Xêrdlas. Lê li her cihî weke hev pêk nayê. Hinek sê rojan li ser hev digirin hinek jî sê çarşemban li ser hev digirin. Lê rojî çawa jî were girtin pêwist e ku cejna Xêrdlasê rastî roja çarşemê were.

Rojiya 12 Îmaman û Eşûreyê: Ev rojî ji bo 12 îmaman tê girtin û piştî wê eşûre tê çêkirin. Ev rojî di eslê xwe de şîn e. Di rojiyên Gaxan û Xizir de ji hilatina rojê û heta ku roj here ava xwarin-vexwarin nîne lê di vê rojiyê de venexwarin esas e. Ev jî ji bo ku Hz. Hiseyn li Kerbelayê wextê ku têhn bûye hatiye qetilkirin ew jî tiştekî venaxwin.[212]

1.4.2.4.Zikat

Şertê Îslamê yê çaran Zikat e. Divê her Misilman her sal beşekê ji malê xwe bide feqîran. Bê zikat çawa li tiştan dikevî û rêjeya zikatê li gorî tiştan diguhere. Di Elewîtiyê de qala zikatê nayê kirin.

1.4.2.5.Hec-Ziyaret

Şertê Îslamê yê pêncan Hec e. Her Misilmanê balix û azad be, heta ku here Hecê û were ku qutê mala wî hebe divê di emrê xwe de herî kêm carekê here Hecê. Wextê ku rewşa tenduristiya şexs xerab be ew kes bi çûyîna Hecê ne mesul e. Ji dêlva Heca Misilnanan ve Elewî jî diçin cihên xwe yên pîroz ziyaret dikin. Misilman ji bo Hecê diçine Kabeyê lê Elewî naçine Hecê ji dêlva wê ve diçine Kerbeleyê.[213] Hz. Hiseyn, ji aliyê şopînerên xelîfeyê Emewiyan, Yezîd, ve li Kerbelayê hatibû kuştin. Ji ber vê yeke Kerbela cihekî taybet e. Divê were îfadekirin ku çûna Kerbelayê di nava Kurd û Tirkên Elewî de ne berbelav e; ev yek hîn zêdetir li cem Şiiyan tê dîtin. Helbet ji aliyê ferzbûna wan ve mirov nikare ji bo Misilmanan çûyîna Hecê û ji bo Elewiyan serdana ziyaretan weke hev binirxîne lê ji bo Elewiyan berpirsiyariyeke weke çûyîna Hecê nîne, gelek

[212] Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş,* rr. 60-65.
[213] Arslanoğlu, "Alevilikte Temel İnanç Unsûrları ve Pratikler", r. 53.

ziyaretên wan hene û ew girîngiyê didine serdana ziyaretan. Ev ziyaret bi giştî nêzîkî herêmên wan in. Ziyaretên li herêmên Kurdên Elewî ji bo herkesî pîroz in. Salê carekê çûyîna ziyaretan ji bo Kurdên Dêrsimê pewyireke olî ye.[214]

Bi taybetî li cihên ku nifûsa Elewiyan boş e ji tirbeyan re gelekî rêz tê girtin. Gorên kesên ku gel ji wan hez dike bûne weke tirbeyên pîroz.[215] Serdana cihên gorên kesên pîroz li cem civaka Elewî gelekî girîng e.[216] Divê were gotin ku serdana ziyaretan bes ne li cem Elewiyan girîng e. Ev yek di gelek baweriyan de herwiha di Îslamê de jî xaleke girîng e. Misilman jî girîngiyê didine serdana zêw, ziyaret, tirbeyên şêx û ewliyayên xwe. Herçiqasî ku serdana ziyaretan him ji bo Sunî û him ji bo Elewiyan xaleke girîng be jî cihên ziyaretên wan bi piranî cihê ne. Weke mînak li herêma Semsûrê tirbeyên Sunî û Elewiyan ji hev cuda ne.[217] Anku Elewî û Sunî ji bo ziyaretên xwe diçine ser tirbeyên cuda.

Wextê ku mirov li van pênc şertên Îslamê û baweriya Elewîtiyê dinêre tê ditîn ku Elewî yek şertê bi tenê yê Îslamê jî bi şiklê ku Îslam dixwaze pêk nayînin. Wî çaxî angaştên van kesên ku hewl didin ku Elewîtiyê weke şaxekî Îslamê nîşan bidin pûç dibin. Xeyn ji van tiştan, hinek tiştên ku di Elewîtiyê de taybet in û Elewiyan ji civakên din cuda dikin jî hene.

1.4.2.6. Mirin

Mijara mirinê di Elewîtiyê de yek ji mijarên herî taybet e. Li gorî Îslamê, mirov piştî mirina xwe careke din sax dibe û li gorî kirinên xwe ya bi bihiştê tê xelatkirin an jî bi dojehê tê cezakirin. Lê di Elewîtiyê de ne baweriya mirinê ne jî baweriya axretê heye. Bi îfadeya Aktaş "Di Elewîtiyê de ne xeyalê çûna bihiştê heye ne jî fikra di agirê dojehê de sotinê."[218]

---

[214] Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş*, r. 89.
[215] Fevzi Rençber, "Adıyaman Alevîlerinde Türbe veya Yatır Ziyareti", *Türk Kültürü ve Hecî Bektaş Velî Araştırma Dergisi* / 2014 / 71, r.217.
[216] *h.g.*, r.210.
[217] *h.g.*, r.211.
[218] Ali Aktaş, "Alevilerde Ölüm, Cenaze, Yas İlgili İnanış ve Ritüeller", *Alevilik-Bektaşilik Araştırmaları Dergisi*, 2015 / 12, r.24.

Çinar dibêje ku: "Di Elewîtiyê de tê bawerkirin ku giyana mirovî perçeyek ji perçeyên hêza bêdawî ye, bi wateyeke din hêza bêdawî bixwe ye, ti carî wenda nabe. Laşê însên dimire lê rih namire, tiştê ku bingehîn e rih e. Ji ber ku rih çavkaniya xwe ji hêza Îlahî distîne û perçeyekî wê hêzê ye, ti carî namire. Ji ber ku ne ji tunehiyê bûye heyîn ji heyînê jî nabe tunehî."[219]

Er, ji bo mijara mirinê qala bandora hinek baweriyên din dike: "Tê dîtin ku di Elewîtiya Anadolê de fikrên mirinê û jiyana piştî mirinê di bin bandora çanda Tirkan, baweriyên Îslamê, felsefeya Serdema Ewil, Budîzm û Tesewifê de mane û bi bandora çanda xwemalî ya Anadolê weke şîroveyeke taybet a Anadolê derketine holê."[220]

Aktaş, îfade dike ku hizrên piştî mirinê li cem Elewî û Suniyan cuda ne: "Elewiyên ku xwedanên baweriyeke dinyaya din a berovajiyê baweriya Sunî ne, li dijî tirsên ku di Sunitiyê de hene, baweriya bihiştê û dojehê û Ezraîl derdikevin."[221]

Weke ku tê dîtin di Elewîtiyê de mirin bi şiklekî cuda tê îfadekirin. Lê di vê baweriyê de cûreyekî mirinê heye ku ew jî ferd bi dilê xwe vê biryarê dide û dest ji dinê dikêşe. Ev mirin bi şiklê "Mirina beriya mirinê" tê îfadekirin û bi îqrardayîna însên dest pê dike. Bi gotina Aktaş, "Di Elewîtiyê de du şîroveyên mirinê hene. Yek mirina biyolojîk e. Bawer dikin ku ev mirin ne dawî ye, destpêkeke nû ye. Laş betiliye, pîr/kal bûye an jî lêş xisar dîtiye, ji ber vê, rih ji bo ku bigihe Heq dev ji lêş berdide. Mirina diduyan mirina wextê îqrarê ye. Bi terma "mirina beriya mirinê" tê îfadekirin. Ev mirin, mirineke bidilxwazî ye. Ev pêngav weke pêngava herî zehmet a perwerdehiya Elewîtiyê tê pejirandin."[222] Korkmaz jî dibêje ku: "Mirina beriya mirinê tê wateya beriya ku mirov ber bi Xwedê ve here ji bo terîqetê dev ji her tiştê dinyayê berde, bi zanîbûn bibe berdevkê her tiştê

[219] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir,* r.24.
[220] Piri Er, *Geleneksel Anadolu Aleviliği*, Ekip Grafik Matbaa Hizmetleri, Ankara, 1998, r. 114.
[221] Aktaş, "*Alevilerde Ölüm, Cenaze, Yas İlgili İnanış ve Ritüeller*", r.24.
[222] h.g., r.20.

li xwezayê û xwe ji bo rastiyê feda bike."[223] Bi şîroveyeke giştî, ji bo Elewiyan, wextê ku ferd dev ji axûnên xwe, xwestekên xwe û tiştên bi dinyaya derbasdar ve têkildar berdide û biryarê dide ku xwe bo rastiyan bike fedayî, bikeve rêyê, îqrarê dide. Ev mirina beriya mirinê ye. Ferdê/a ku îqrar daye weke ku jinûve hatibe dinê tê hesibandin û ev bûyer "bûna duyem e."[224]

Mijara mirina beriya mirinê ji aliyê gelek lêkolînerên ku li ser Elewîtiyê dixebitin ve weke mijareke ku taybetî Elewiyan e tê nirxandin lê divê were zanîn ku ev mijar di gelek baweriyan de herwiha di Îslamê de jî cih digire. Hedîsa Muhemed a bi şiklê "Bimirin, beriya ku hûn bimirin" herçiqasî ku sehîhbûna wê mijara nîqaşê be jî îro ji aliyê gelek terîqetên sofî ve tê parastin û li gorî gelek terîqetên Îslamî yên sofî divê mirov destê xwe ji axûnên dinyayî bikêşe, nefsa xwe bikuje û xwe fedayî xwedayê xwe bike. Dîsa ev nerîn gelek caran di tesewifa Îslamî te jî tê dîtin.

1.4.2.7. Perwaz-Kirasguhertin

Li jorê hate îfadekirin ku li cem Elewiyan fikra ku mirov dimire û rihê mirovî li gorî kirinên wê/wî diçe bihiştê yan jî dojehê nîne. Wextê ku rih nemirê divabî rêwîtiyeke rih hebe. Ev rêwîtiya rih di baweriya Elewîtiyê de bi şiklê perwaz û kirasguhertinê tê îfadekirin. Bi îfadeyeke giştî baweriya tenasuhê (perwaz) tê wateya ku rihê însên di laşekî din de jiyana xwe bidomîne. Baweriyeke kevnar e û li cîhana kevn bi reng û têgihiştinên cihê hatiye dîtin. Gelek cûreyên vê baweriyê hene ku dibêjin rih koçî laşên mirovan, ajelan, nebatan û bêcanan dike. Cihê ku ev bawerî lê herî berbelav e Hindistan e. Budîzm, li Hindistanê derketiye holê û perwaz kiriye hîmê doktrîna xwe.[225] Baweriya perwazê, herçiqasî ku Hindistanê derketibe jî di nava baweriyên weke Yarsantî, Êzîdîtî, Nuseyrîtî de cih digire û ji aliyê dînên weke Musewîtî, Mesîhîtî û Îslamê ve tê redkirin. Li gorî Yarsanan,

[223] Esat Korkmaz, *İmam Cafer Buyruğu*, Anahtar Kitaplar Yayınevi, İstanbul, 2013, r.161.
[224] Aktaş, "Alevilerde Ölüm, Cenaze, Yas İlgili İnanış ve Ritüeller", r.21.
[225] Ahmet Yaşar Ocak, *Alevi ve Bektaşi İnançlarının islam Öncesi Temelleri*, lletişim Yayınları, İstanbul, 2002, rr. 183-184.

teslîmkirina rih weke ku werdek noqî avê bibe ye. Werdek çawa di cihekî re noqî avê dibe û di cihekî cuda ve derdikeve mirov jî dimire û di şiklê yekî din de tê dinê.[226] Elewî jî di nava van komên ku ji koça rih bawer dikin de ne û dixwazin ku hinek ayetan ji vê re bikine balpişt.[227] Di Elewîtiya Anadolê de mirin nîne. Rih ji laşekî diçe laşekî din. Ev rihê ku diçe û tê xeyn ji herikîna enerjiyê ne tiştekî din e. Çûyîna cem Heq derbasbûna vê enerjiyê bo laşekî din e. Ev enerjî ji ronahiyê tê û divê paşê bibe ronahî.[228]

Ji ber ku Elewî ji mirinê bawer nakin, di Elewîtiyê de mirin, bi biwêja "çûyîna cem Heq" tê îfadekirin. Di Elewîtiyê de rihê her tiştî heye û her tişt vedigere eslê xwe, baweriya koça rih heye. Baweriya bihişt û dojehê ya ku pergala xelatkirin-cezakirinê ye nîne.[229] Xeyn ji vê îfadekirinê, biwêjên "Yekbûna bi Heq re", Heqbûn Bi Heq re", "Em ji Heq tên, em dê biçine Heq" jî têne bikaranîn. Elewî, Nabêjin kesek "mir" dibêjin "Çû cem Heq" an jî "Kiras guhert."[230]

Çinar, însên weke enerjîyekê dinirxîne û dibêje ku: "Di Elewîtiyê de mirov enerjiyeke ku ketiye lêş e. Di termînolojiya Elewiyan de navê vê enerjiya ku ketiye lêş 'can' e. Tê bawerkirin ku ev can, heta ku vegere çavkaniya hêzê ya ku jê hatiye dê ji xwe re di formên cuda de qadên jiyanê yên cuda peyde bike û dê di nava çerxa jinûvebûnê de ji laşekî derbasî laşê din bibe."[231]

Ev baweriya kirasguherînê herçiqasî ku yek ji hîmên Elewîtiyê be jî îro di jiyana pratîk de ber bi kêmbûnê ve diçe. Baweriya perwazê li Dêrsimê sed sal berê di

[226] Shahab Vali, "Anadolu Alevileri ve Guran Yarsanları Arasında Edebi- Kavramsal Bir Köprü Olarak Türkçe Kelamlar: Kuşçuoğlu Kelamlarında Dûnadûn/ Don Değiştirme Kavramı" *Dil Bilimleri Klasik Sorunlar - Güncel Tartışmalar*, r.692.
[227] İbrahim Arslanoğlu, "Alevilikte Temel İnanç Unsûrları ve Pratikler", r. 20., malpera înternetê: http://www.hbvdergisi.gazi.edu.tr/index.php/TKHBVD/article/view/453, (d.g., 13.12.2018).
[228] Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, r.41.
[229] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, *Alevi-Bektaşi İnancının Esasları*, r.53.
[230] Aktaş, "Alevilerde Ölüm, Cenaze, Yas İlgili İnanış ve Ritüeller", r.19.
[231] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir*, r.25.

nava xelkê de hatiye qeydkirin lê niha tê dîtin ku bîranînê vê baweriyê kêm dibin.[232]

1.4.2.8. Baweriya Xwedê

Baweriya Xwedê, li cem Elewiyan ji dînên monoteîst cuda ye. Di baweriya Elewîtiyê de afirîner, ne hêzeke serdest a li derveyî tiştên ku hatine afirandin e ku her tiştî taqî dike, xelat dike, dadimezirîne yan jî ceza dike. Hebûn yek e, eslê wê hezkirin e. Cihêkirina hebûnê bi şiklê afirîner û yên ku hatine afirandin tê wateya ku perçeyek ji perçeyê din balatir be. Ev jî tê wateya tênegihiştina eslê afirandinê.[233] Felsefeya Elewiyan, têkiliya Xweda-xweza-mirov bi şiklê çerxeke ku ji Xwedê dest pê dike û dîsa vedigere Xwedê ye. Ronahiya ku ji zatê Xwedê difûre tûşî hinek transformasyonan dibe û li xwezayê dikeve formên cuda û ji xwe biyanî dibe. Di vê felsefeyê de xweza Xweda ye. Xwedayekî din î ku çarenûsa insên bi destê wî ye, nîne. Mirov azad e, azadiya însên bi destê însên e. Bi vî şiklî rê li ber serweriya Xwedayê ku di dînên yekxwedayî de ye hatiye girtin. Wextê ku Xweda di kirasê însên de were ser rûyê erdê Xweda û mirov dibine weke hev, mirov bi mirovî re tê pêşberî hev, êdî hêza wan weke hev e.[234] Xweda, serdestiyê li xwezayê jî nake, xwezayê jî azadiya xwe bi dêst xistiye û çarenûsa xwezayê jî bi destê xwezayê ye.[235]

Di Elewîtiyê de ferd û Xweda ji hevdû ne cihê ne, bi gotina Kaygusuz: "Di civaka Elewî de cihê kesê tebat ên ku gotinên bipistepist dikin û nizanine bi wateya gotinên xwe nîne. Ferdê Elewî çalak e. Ji bo ku perestin kirine tiştekî civakî jin-mêr, kal/pîr-ciwan tev di nava hev de ji kêmasî û tawanên xwe yên salane şûştî, weke yek bedenê ne. Xwedayê wan jî dibe yek ji wan û Xwedayê xwe yî ku bûye

[232] Bruinessen, "Between Dersim and Dâlahû: Reflections on Kurdish Alevism and the Ahl-i Haqq Religion", r.6.
[233] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir*,r.25.
[234] Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, rr. 28-32.
[235] *h.b.*, r.61.

yek ji wan dihebînin."[236] Çinar jî tevên heyînan bi ronahiyê re têkildar dike û li gorî wî haveynê her tiştî ronahî ye: "Di Elewîtiyê de tê bawerkirin ku tevên giyandarên li serzemînê ji rojê hatine, ji ronahiyê çêbûne eslê wan şewq e, ronahî ye."[237]

Di van şîroveyan de Xweda-xweza-mirov yek in û di asta hev de ne. Savaşçi, însên ji heyînên din balatir dibîne. Li gorî teolojiya Bektaşî-Elewiyan, Xwedê her tişt ji eslê xwe afirandiye. Hatin ji Heq e, veger jî ber bi Heq ve ye. Xweda, gencîneyeke veşartî bû, ji bo ku were zanîn gerdûn û mirov afirandine. Ji ber vê yekê, mirov eşreful mexlûqat e.[238]

Ev nêrînên ku Xwedê û însên yek dibînin di gelek terîqetên Îslamî de jî xwiya dike. Nêrîna ku dibêje "Enel Heq" anku "Ez Xweda me" di serî de ji aliyê kesên weke Xelacê Mensûr (m. 922) û Nesîmî (m. 1417) ve hatiye parastin û îro jî ev hizr, di gelek ekolên tesewifa Îslamî de tê dîtin. Di van şîroveyên ku ji bo Elewîtiyê hatin dayîn de xwedayekî ku bi şiklê xwedayê Îslamê afirîner be nîne. Di Îslamê de hebûna Xwedê mutleq e, lê hinek terîqet însên weke rengvedana Xwedê dinirxînin.

1.4.2.9. Destbiraktî-Misawtî

Di baweriya Elewîtiyê de yek ji saziyên herî girîng û bingehîn saziya destbiraktiyê ye. Du kesên ku bi xwînê ne xizmên hev in weke destbirakê hev têne qebûlkirin.[239] Divê destbirakê her Elewiyekî hebe, kesekî bêdestbirak nikare beşdarî ayînan bibe. Divê destbirak, di dawet, şîn, mirin, di her kêlîka girîng de li kêleka destbirakê xwe be.[240]

---

[236] İsmail Kaygusuz, *Alevilikte Dâr Dârın Pirleri*, Alev Yayınları, İstanbul, 1993, rr.7-8
[237] Çınar, *Bahçe Bizim Gül Bizdedir*, r.23.
[238] Özgür Savaşçı, "Günümüzde Bektaşilik/Alevilik", *Türk Kültürü ve Hecî Bektaş Veli Araştırma Dergisi*, / 2010 / 55, r.409.
[239] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevilik Bektaşilik Araştırmaları*, r.90.
[240] h.g., r.48.

Destbiraktî, di nava Elewiyên Anadolê de bi taybetî di nava komên Elewî/Qizilbaş de kevneşopiyeke gelekî girîng e. Lê di hinek lêkolînan de hewla ku vê kevneşopiyê bi hinek deveran re têkildar bikin ji hewla ku vê kevneşopiyê bidine naskirin pêşvetir e. "Teqez e ku destbiraktî bi kevneşopî û baweriyên Tirkan re têkildar e lê bi demê re rengekî Îslamî lê hatiye barkirin." [241] Ev, yek ji wan hewlan e. Uzum, dibêje ku destbiraktî bi kevneşopî û baweriya Tirkan re têkildar e lê weke gelek angaştên ku li Tirkiyeyê di xebatên "akademîk" de cih digirin ev jî bê balpişt e. Ti çavkaniyên vê angaştê jî nînin. Lê weke ku tê zanîn ev çand li nik Kurdên Yarsan jî heye. Piraniya Yarsanan, ne Tirk in û Yarsantî beriya Elewîtiya Tirkan, Bektaşîtî, hebûye lê çawa dibe ku ev şexs vê yekê nabînin û meyla wan li ser tiştên bêbingeh e. Melikoff weke Stig Wikander bawer dike ku ev çand çandeke Îran-Hindistanî ye û li nava Kurdên Yarsan heye. Divê her Yarsanê ku balix bûbe xeyn ji malbata xwe ji xwe re malbateke din hilbijêre.[242]

Ji bo destpêka vê kevneşopiyê nêrîn û angaştên cuda hene. Uçer dibêje ku: "Destbiraktî di Elewîtiyê saziyeke zor girîng e. Weke şiklekî biratiya axretê ye û di jiyana civakî ya Elewiyan de xwedan rolên girîng e. Qebûlkirina destbiraktî/ biratiya axretê ya Hz. Pêxember û Hz. Elî weke destpêka vê saziyê tê pejirandin."[243] Xeyn ji vê nêrîna ku Elî û Muhemed weke destbirakên hev qebûl dike, nêrînên ku hebûna vê kevneşopiyê di Îslamê de jî qebûl dikin hene. Li gorî van nêrînan, di navbera du Misilmanan de peymanek tê girêdan û ev du kes dibine birayên hev. Mînaka herî binavûdeng a destbiraktiyê peymana ku Muhemed di nava Ensar û Mihaciran de çêkiriye û ew kirine destbirakên hev e.[244] Lê Korkmaz, van angaştan qebûl nake li gorî wî divê li koka vê kevneşopiyê di şiklê piştgiriya civakên koçber, yên beriya jiyana dêmanî, bê gerîn.[245] Dîsa Korkmaz destbiraktiya Elî û Muhemed weke efsaneyekê dinirxîne: "Saziya destbiraktiyê di

[241] İlyas Üzüm, *Günümüz Aleviliği*, Türkiye Diyanet Vakfı İslam Araştırmaları Merkezi Yayınları, İstanbul, 1997, r.12.
[242] Melikoff, *Uyur İdik Uyardılar Alevilik Bektaşilik Araştırmaları*, r.92.
[243] Üçer, "Alevî Telakkîde Hz. Muhemed", r. 334.
[244] 'Eqdî Exewat: http://fa.wikishia.net/view/%D8%B9%D9%82%D8%AF_%D8%A7%D8%AE%D9%88%D8%AA, (d.g. 10.06.2020).
[245] Korkmaz, *Anadolu Aleviliği*, rr.330-331.

Elewîtiyê de şiklê ewil ê piştgiriya civakî ye. Pêpelûkeke ewil a ku çalakbûna Elewiyan xwedî kiriye û gelê Elewî birêxistin kiriye ev e. Efsaneya ku Hz. Muhemed û Hz. Elî destbirak bûne çîroka înkarkirina nasnameya Hz. Muhemed a şerîetvan, jê re avakirina nasnameyeke batinî ye."[246]

Weke gelek mijarên Elewîtiyê li ser mijara destbiraktiyê jî levkirin nîne. Lê îro ev kevneşopî herçiqasî ku kêm bûbe jî di nava civaka Elewî de zêdetir li ber çavan e û zêdetir tê parastin. Wextê ku mirov li van şîroveyan li ser destbiraktiyê dinêre mimkun e ku destbiraktî weke saziyeke ku di nava du şexsan de ye were fêhmkirin lê ne wilo ye. Malbat bi hev re dibine destbirak. Wextê ku ferdên Elewî dizewicin malbatekê ji xwe re weke destbirêk hildibijêrin û ev malbat dibine destbirakên hev. Mehra zarokên wan jî li hev nabe.

Di vê beşê de heta niha li ser gelek hêmanên baweriya Elewîtiyê agahî hatin dayîn. Xeyn ji van binbeşên ku di heqê wan de agahî hatine dayîn, divê li ser baweriya Elewîtiyê qala çend tiştên din jî were kirin. Mijareke ku gelek nîqaş li serê hene mijara pirtûkên pîroz e. Hinek kes û saziyên ku Buyruk û Makalatê weke pirtûkên pîroz ên Elewiyan nîşan didin hene. Dibe ku hinek grubên Elewî, weke Bektaşiyan, van pirtûkan weke pirtûkên pîroz bihebînin lê di nava Elewiyên Kurd de qala van pitûkan nîne. Kilamên wan û tembûra wan pîroz in. Baweriya xwe bi rêya kilamên xwe û çanda devkî bo nifşên nû vedigûhêzin. Di lêkolînên ku li Tirkiyeyê têne kirin de hewla ku Quranê weke pirtûka Elewiyan jî nîşan bidin heye. Lê tiştê ku di rastiyê de heye rêzdayîn e. Elewî rêzê ji tevên pirtûkên dînî re digirin. Doktrîna Elewî li aliyê batinî yên Tewrat, Incîl, Quran û hwd. û peyamên wan ên exlaqî xwedî derdikeve.[247] Civaka Baweriya Elewiyan a Denmarkê agahiyeke bi vî rengî daye: "Elewî bawer dikin ku piştî mirina Hz. Muhemed hinek tişt li Quranê hatine zêdekirin, dîsa bawer dikin ku Qurana ku îro heye kêm e û ne orîjînal e. Quran piştî mirina Hz. Muhemed ji aliyê xelîfe Osman ve hatiye

[246] *h.b.*, 325-326.
[247] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, *Alevi-Bektaşi İnancının Esasları*, rr.7-8

komkirin û kopyayên wê yên sixte hatine belavkirin."[248] Dibe ku ev agahî ji bo hinek komên Elewî yên Tirk derbasdar bin, dîsa ev nîqaşên li ser Quranê hîn zêdetir nîqaşên Sunî û Şiiyan e. Kurdên Elewî, zêde beşdarî van nîqaşan nabin. Di nava Kurdên Elewî de xeyn ji rêzdayînê, qebûleke ku Quran ji bo wan pirtûka pîroz be nîne.

Mijareke ku ji bo Elewiyan gelekî taybet e û wan ji civakên derdora wan cudatir dike mijara jinê ye. Jin, di baweriya Elewîtiyê de xwedan cihekî û roleke taybet e. Wekheviya jin û mêran bingehîn e. Li gorî Korkmaz, ev nêrînên bi rûmet û êrênî yên bo jinan çavkaniya xwe ji civakên ku di wan de çînên civakî û dewlet nêbûn û hiqûqa jinan serdest bû digire.[249]

Mijara zewacê jî li cem Elewiyan mijareke taybet e. Elewî, nikare keçê bide yên ku ne Elewî be, nikare bi jina ku ne Elewî be re bizewice. Ku van tiştan bike ji Elewîtiyê derdikeve.[250] Divê bê zanîn ku ev tişt di pratîkê de gelekî kêm bûye. Ferdên Elewî îro bi kesên ku ne Elewî ne re jî dizewicin. Jinberdan tiştekî qedexe ye, bes wextê ku jin zinê bike berdana wê qebûl dibe. Wekî din ê ku jina xwe berde li gorî kevneşopiyên Elewiyan tê cezakirin.[251] Pozîsyona wan çi dibe bila bibe yên ku di navbera wan de têkiliya pîr-talib, rêber-talib, murşîd-talib hebe bi ti awayî nikarin bizewicin. Di teoriyê de pirjinî jî qedexe ye.[252] Jinberdan nayê qebûlkirin, encix wektê ku lehebandin hebe tê qebûlkirin. Yekjînî esas e, encix wextê ku zarokên jinê çênebin û jin bixwaze, mêrê wê dikare yeke din bîne.[253] Kevneşopiya Bektaşiyan pirjinî qedexe kiriye. Yên ku belesebeb jina xwe berdin biqisûr têne hesibandin û civak wan hermonî dike.[254] Murat, ev tişt li ser navên Bektaşiyan îfade kiriye bes li cem Elewiyên Kurd jî bi vî şiklî ye.

---

[248] *h.b.*, r.24.
[249] Esat Korkmaz, *Alevilere Saldırılar*, Pencere Yayınları, İstanbul, 1997, r.134.
[250] Türkdoğan, *Alevi Bektaşi Kimliği-Sosyo-Antropolojik Araştırma-*, r.396.
[251] Dinçer, *Alevi-Sünnî Ayırımının Tarihsel Nedenleri*, r.147.
[252] Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş*, rr. 38-40.
[253] Peter Andrews, Hıdır Temel, "Hubyar", *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 37, No. 3, Heterodox Movements in the Contemporary Islamic World: Alevis, Yezidis and Ahmadis (DECEMBER 2010), r.308.
[254] İbrahim Murat, *Hecî Bektaşı Veli'nin 14 Sırrı*, İlgi Yayınları, İstanbul, 2006, r.18.

Weke kevneşopiyên Suniyan nixûmandin nîne. Jin servekirî tevlî civînên xwe dibe û dikare bi vî şiklî di nava diwazdeh peywirdaran de cihê xwe bigire. Carinan di ayînên cemê de tê dîtin ku jin kofiyan didine serê xwe yan jî cilûbergên Elewiyan dişibine yên herêmên ku Elewî li wan dijîn. Dive were zanîn ku ev tiştên çandî ne. Di nava Elewîtiyê de gunehbûna servekirin an jî pêwistiya nixûmandinê nayê nîqaşkirin, pêwistiyeke bi vî şiklî nîne.

Weke ku li jorê hatibû îfadekirin li cem Elewiyan baweriya axretê û xelat-ceza nîne. Pergela cezakirinê bi şiklekî din e. Kesê/a ku tiştekî li derveyî rêyê bike li gorî tiştê ku kiriye ji civakê tê dûrxistin. Civak wî/ê kesî/ê hermonî dike. Ew kes "biqisûr" tê hesibandin. Kesên ku di nava Bektaşiyan de sûcdar bibin nikarin bikevine meydanê. Weke mînak, kuştin, zinê, kurkurane (lîvata), dizî, jinberdan sedemên biqisûrbûnê ne. Ev kes ji rê derdikevin. li gorî pilêya sûcê xwe demekê nikarin beşdarî ayînan bibin, nikarin herin cem hevser, xizm, heval û hogirên xwe, kes gotinên xweş ji wan re nabêje. Ev cezayên arişî ji wan re berdêleke giran in. Ev şexs li nik herkesi evdên ku Xwedê ew naletî kirine ne. Ku ev şexs bêne efûkirin jî divê dîsa îqrarê bidin.[255] Ev pergal li cem Elewiyên Kurd û Tirk heman pergal e.

Li cem Elewiyan qurban jî ne bi şêweyê Îslamê ye. Yên ku qeweta wan hebe bi rêya qurbanê dikarin îbadetên xwe yên aborî pêk bînin. Yên ku qeweta wan negihiyê dikarin dîkekî ser jê bikin, yên ku nikarin dîkekî jî ser jê bikin dikarin li gel diayekî sêvekê bikine qet. Ji aliyê îtibarê ve di nava gel de di navbera kesê ku qeweta wî nîne û sêv kiriye qet û qeweta wî heye beran ser jê kiriye de ti cudahî nîne.[256]

Wextê ku li ser baweriya Elewîtiyê lêkolîn têne kirin têgeheke ku gelek caran derdikeve pêşiya mirovî têgeha "heterodoksî"yê ye. Elewî têgeheke sîwanî ye ku çend heb civakên heterodoks ên ku bawerî û pratîkên wan ji hev cuda ne dihebîne.

[255] M. Tevfik Oytan, *Bektaşiğin İçyüzü, Dibi, Köşesi, Yüzü ve Astarı Nedir?,* İstanbul Maarif Kitaphanesi Matbaası, İstanbul, 1979, r.22.
[256] Demir û Şanlı, "Cem Dergisi'nin Sunumuyla Alevi Gelenekte İbadetler", r. 23.

Li Qersê civakên ku bi Tirkiya Azerî diaxivin dişibine Elewiyan û Şiîtiya Îranê hene. Civakên Elewî yên li başûrê Tirkiyeyê ku bi Erebî diaxivin (bi taybetî li Edenê û Hatayê) ji aliyê nijadî ve perçeyekî Elewiyên Sûrî (Nuseyrî) ne û ti girêdanên wan î dîrokî bi civakên din ên Elewî re nînin. Komeke berfireh ya Elewî Kurdî û Tirkîaxêv in, her du jî weke neviyên êlên serhildêr ên bi Safewiyan re têkildar xwiya dikin.[257]

Li gorî hinek lêkolîneran ev têgeh, heterodoksî, weke rêyeke xweparastinê derketiye holê. Ji dêlva ku xwe weke mensûbên dînekî ku tûşî gelek heqaretan dibe bidine nasîn xwe weke şaxekî ji şaxên dînê serdest nîşan didin. Îro heta bi Elewiyan jî ji bo binavkirina xwe, ji bo ku Elewîtiyê ji ortodoksiyê (Îslama Sunî) baştir nîşan bidin û xwe weke hilgirên çanda Tirkan nîşan bidin têgeha heterodoksiyê bi kar tînin. Ji ber ku navên wan ên din di wateyên xerab de têne bikaranîn bi taybetî Elewî dikarin bikaranîna vê têgehê tercih bikin.[258]

Xeyn ji behsa heterodoksiya Elewiyan gelek caran qala bandora dîn û civakên din jî li ser baweriya wan tê kirin. Korkmaz qala bandora Manî, Mazdek, Buda û Zerdeşt kiriye. Manîîzmê bandoreke mezin li ser Elewîtiyê kiriye. Rêzika ku di Elewîtiyê de bi şikle " li destê xwe, li zimanê xwe, li pişta xwe xwedî derkeve" tê îfadekirin bingeha xwe Manîîzmê ji distîne. Manî dibêje "li devê xwe, li destê xwe li dilê xwe xwedî derkeve." Armanca Mazdek ew bû ku wekheviyê ava bike û gelê hejar ji bin mêtîngeriya rêvebiran rizgar bike. Baweriya Mazdek ji bo avabûn û şekilgirtina pergala perwerdehiya Elewîtiya Anadolê bûye çavkanî. Xewna gundiyên hejar a ku Mazdek xwe spartiyê ji bo Elewiyên Anadolê bûye utopyayeke siyasî ya ji sosyalîzmê jî wêdetir û di şiklê projeyeke civakeke gihiştî ya ku dê rizgariya xwe pêk bîne de şênber bûye.[259] Pirsgirêka Buda ya *jêpaqijbûnê* di Elewîtiyê de ketiye şiklê terkkirinê. Sê cûreyên terkê hene: Terka dinyayê, terka ukbayê -bihuşt û axret jî weke dinyayê têne dîtin divê mirov bi van

[257] Bruinessen, "Kurds, Turks and the Alevi Revival in Turkey", r.7.
[258] Karolewski, "What is Heterodox About Alevism? The Development of Anti-Alevi Discrimination and Resentment", r.437.
[259] Esat Korkmaz, *Alevi Felsefesi*, Pencere Yayınları, İstanbul, 1997, rr. 75-77.

ve neyê girêdan- terka terkê, li gel terka vê dinyaya ku ne mayînde ye divê dinyaya din jî were terkkirin, di kesayeta mirov de divê tenê şewqa Xwedê bimîne.[260] Baweriya Zerdeşt li Anadolê, yan rasterast bû çavkaniya avabûna felsefeya Batinî yan jî navcîtiya fikr û baweriyên ku ji Şamanîzm û Budîzmê hatine kir.[261] Li erdnîgariyeke ku gelek dîn, civak û çandên cuda lê jiyane/dijîn ihtimala ku ev civak bandorê li hev bikin gelekî zêde ye û ev, tiştekî zehfî xwezayî ye. Xwiya ye ku Elewîtiyê him bandor li derdora xwe kiriye û him jî di bandora derdora xwe de maye.

Piştî ku di heqê baweriya Elewîtiyê de agahî hatin dayîn mirov dikare bi awayekî hêsantir nêrînên li ser têkiliya Elewîtiyê û Îslamê binirxîne. Korkmaz li ser vê têkiliyê dibêje: "Elewîtî li ber çavan e. Cem, diwazdeh peywirdar, meclîsa çilan, yekîtiya heyînan, semah, nefes, tembûr, çar derî, çil meqam, ocax, destbiraktî, biqisûrî… gelo kîjan ji van di Îslamê de heye. Weke ku tiştên bingehîn ên Elewîtiyê di Îslamê de nînin ên Îslamê jî di Elewîtiyê de nînin.[262] Divê were gotin ku ev têgehên ku Korkmaz amaje bi wan kiriye bi tevahî ne dûrî Îslamê ne. Li ser hinekan nîqaş hene û hinek ji wan, têgehên Îslamî ne jî. Dibe ku Elewîtî û Îslam ji hev cuda bêne nîşandan lê nabe ku van baweriyan bandor li hev nekiribin. Ji dêlva angaştên ku bi vî şiklî gelekî tund têne parastin, ku bandora ku van baweriyan li hev kiriye newe pişt guhkirin dê encamên rasttir derkevine holê.

Bruinessen jî li ser cudahiya Îslam û Elewîtiyê nêrînên xwe wisa îfade dike: "Baweriya Elewîtiyê herçend ku hatibe Îslamîzekirin jî ji Îslamê gelekî cuda ye. Tiştên weke nimêjê, rojiya Remezanê, zikatê û Hecê ji bo civaka Elewî tiştên biyanî ne. Li şûna van, ayînên wan ên ku ji aliyê pîran -kesên pîroz ku di asta rahiban de ne- ve têne meşandin hene."[263]

[260] *h.b.*, r.86.
[261] *h.b.*, r.70.
[262] Çınar, Bahçe Bizim Gül Bizdedir, r.33.
[263] Bruinessen, "Kurds, Turks and the Alevi Revival in Turkey", r.7.

Civaka Baweriya Elewiyan a Denmarkê jî Elewîtiyê ji Îslamê cuda nîşan dide: "Bêjeya Elewîtiyê di cîhana Îslamê de bi giştî bi Hz. Elî re tê têkildarkirin û gelekî li bêjeya Elewî û terîqetên bi Elî re têkildar tê rasthatin. Lê Elewîtî-Bektaşîtiya Anadolê herçend ku hinek têgeh û çavkaniyên Îslamî bi kar bîne jî him ji aliyê baweriyê ve him jî ji aliyê îbadetan ve ji Îslamê bi timametî cuda ye. Weke mînak Elewî pênc şertên Îslamê bi cih nayînin, bawerî û îbadetên wan xisûsî wan in. Saziyên weke cemê, semahê, destbiraktiyê û hwd. di Îslamê de nînin. Em dikarin Elewîtiyê weke têgihiştineke civakî û baweriyê ya xweser pênase bikin.[264] Dîsa li gorî Elewiyan ji bo îbadetê hewcehî bi rêzikên şerîetê yên şiklî nîne. Mirov berê xwe bide ku Xweda li wir e."[265]

Şiî û Sunî Misilman in, nîqaşên wan li ser xelîfetî, Quran û hwd. hene. Her du alî jî teqez qebûl dikin ku Quran pirtûka Xwedê ye.[266] Lê hewlên ku Elewîtiyê bi Şiîtiyê re têkildar bikin hene. Ev argumanên ku hatin nîşandan kifş dikin ku divê Elewî dûrî van nîqaşan bin. Ev nîqaşên di navbera mezhebên Îslamê de ne.

Bruinessen îfade dike ku gelek xalên kêm ên hevpar di navbera Şiîtiya Îranê ya îroyîn û Elewiyên Tirkiyeyê de hene. Elewî nimêjê nakin, bo Hecê naçine Mekihê, rojiya wan ne weke ya Misilmanan e, remzên wan ên darişî ne li gorî Quranê ne û rastiyeke wan a bibandor ev e ku jin tevlî ayînan wan dibin. Kurdên Qizilbaş ên Dêrsimê ji tevên komên din heterodokstir bûn. Gelek bermayiyên îbadeta ji xwezayê (roj û heyv, rim, teht, dar) re hene, asimilasyona gav bi gav a Ermenên xwecihî li ser Kurdan şopên zelal hiştine.[267]

Dema ku mirov li baweriya Elewîtiyê dinêre tê dîtin ku berovajiyê gelek weşanên ku di heqê wan de hatine kirin têkildarkirina wan bi Îslamê yan jî bi Mesîhitiyê re ne pêkan e. Ji ber ku destpêka vê baweriyê ne kifş e mirov nikare bi hêsanî

[264] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, Alevi-Bektaşi İnancının Esasları, rr.6-7.
[265] *h.b.*, r.12.
[266] Haydar Özdemir, *Kimliklerimiz Alevi Kime Denir? Mum Söndü İftirasının Tarihçesi*, Hoşgönül Matbaası, İzmir, 1967, r. 37.
[267] Bruinessen, "Religion in Kurdistan", rr.10-11.

şîroveyan bike lê tiştê teqez ev e ku argumanên ku li ser Misilmantiya wan an jî hewlên ku wan weke mîrata Tirkan nîşan bidin bêbingeh in û ji rastiyên dîrokî bêpar in. Divê mirov nêzîkahiyên di navbera baweriya Elewîtiyê û baweriyên weke Yarsantî, Êzîdîtî, Şebektiyê de bibîne û li ser van mijaran jî lêkolînan bike, helbet bi awayekî xwezayî, Îslamê û baweriyên din ên erdnigariya derdora Elewiyan jî bandor li vê baweriyê kirine.

Heta niha di heqê beşa ewil a lêkolîna me de- Elewîtî: Nav, Dîrok, Bawerî- li gorî çavkaniyên cuda agahî hatine dayîn û ev agahî hatine berawirdkirin û nirxandin. Tevên van agahiyên teorîk di serî de ji bo têgihiştina Elewîtiyê û piştre jî ji bo nirxandina kilamên Elî Sîzer a li gorî baweriya Elewîtiyê pêwist in. Bêgoman bêyî ku haya me ji Elewîtiyê hebe em dê nikaribin analîza kilaman li gorî baweriya Elewîtiyê bikin. Piştî van agahiyên teorîk dê di beşa duyem de li ser jiyana Elî Sîzerê ku kilamên wî yên mijara lêkolîna me ne agahî bêne dayîn û kilamên wî bêne nivîsin.

2. JIYANA ELÎ SÎZER Û KILAMÊN WÎ

Dema ku mirov li ser berhemên kesekî dixebite wextê ku ew kes bê naskirin bêgoman dê berhemên wî jî çêtir bêne fêhmkirin. Çikû çavkaniya berhemên wî şexsî di jiyana wî de ye. Civaka ku şexs di navê de mezin dibe, şert û mercên malbatê, zaroktî û perwerdehiya şexs; çand, kevneşopî û baweriyên civakê hemû di jiyana wî mirovî de dibine nexş û şopên xwe li ser her awayê jiyana wî xêz dikin. Herwiha ji bo ku em kilamên Sîzer baştir fêhm dikin dê naskirina wî ji bo me sûdmendtir be. Di vê beşê de jiyana Elî Sîzer û kilamên wî hatine dayîn û kilamên wî ji aliyê teşe, şêwaz û naverokê ve hatine nirxandin.

2.1. Jiyana Elî Sîzer[1]

Navê wî yê nav malbatê Aço ye, Açê Usivê Elê Laşê. Navê murşîdê wî Açê Mamê ye, navê Aço ji murşîdê xwe girtiye. Elî navê wî yê fermî ye. Him malbata wî him jî kesên li derdora wî bi navê Aço bang dikinê. Li gundê Çeqelê yê Semsûrê hatiye dinê. Heta ku dibistana seratayî li gund qedandiye jî nasnameya wî tune bûye, piştî ku dibistana seretayî xelas kiriye azayê gund ji bo dîplomeyê çûye nasnameyên zarokên gund bi hev re derxistine. Di nasnameya wî de sala bûna wî 1967 hatiye nivîsîn lê sala ku ew bûye li nav erdekî wan birkeke avê çêkirine û li ser wê birkê 1968 nivîsîne ji ber vê, zane ku sala 1968an hatiye dinê û li gorî gotina dêya wî wextê ku darên behîvan kulîlk vekirine çêbûye, sibat-adar. Çar xwişkên wî hene, sê jê meztir in û yek jî jê biçûktir e. Bi rêncberiyê mezin bûye û rêncberiya wan jî bi giştî li ser tûtinê yê. Bavê wî Usivê Elê Laşê, dêya wî Eyşê ye. Niha meqamê bavê wî li gund heye û li wê derê jî miraz têne kirin.

Ji Eşîra Belekan e. Belekî şaxek ji şaxên Eşîra Reşîyan e. Li Semsûrê derdora sed gundên Reşiyan hene, li Meletî, Sêwasê, Koçgiriyê û Dêrsimê jî Reşî hene. Li gorî Sîzer, ji sedî heştêyê Qizilbaşên Kurmanc Reşî ne. Heta beriya niha bi şêst heftê salî jî eşîra wan koçer bûye. Sîzer vê koçeriyê bi zextên derdorê ve girê dide. Li gorî wî, ti sîsteman ew qebûl nekirine û ji ber ku nikarîbûn ji binî li cihekî

[1] Elî Sîzer, *Hevpeyvîn*, Gundê Çeqelê- Semsûr, 06.08.2019.

bimînin berê xwe ji deştê dane çiyayan û şikeftan, naçar mane ku seraqet koç bikin.

Du caran zewiciye. Cara sifte, wextê ku bîst salî bûye bi dotmama xwe re zewiciye, piştî zewaca wan bi şeş mehan hevsera wî ji ber nexweşiya giran bar kiriye. Piştî koça hevsera wî yî pêşî bi du sal û nîvan cara diduyan zewiciye, 1991. Çar zarokên wî hene, du keç û du kur. Keçên wî zanîngeh qedandine kurên wî hîn zanîngehê dixwînin.

Wextê ku 26 salî bûyê bavê wî çûye ser dilovaniya xwe. Koça bavê wî bandoreke pir mezin lê kiriye û ew vê yekê, weke ku ezman bi ser de hatibe xwarê rave dike. Ew, têkiliya di navbera xwe û bavê xwe de weke têkiliyeke biyolojîk nabîne û bavê xwe weke rêber û pîrê xwe dibîne. Ji mal û milkê xwe bigire heta bi gotinê kilamên xwe weke sermayeyeke ku ji bavê wî jê re maye dibîne. Beriya niha bi sê salan jî dayika wî bar kiriye. Piştî çûna dêya xwe, xwe weke sêwiyan hîs kiriye û dibêje ku sêwîtî bi çûna dayikê kifştir dibe. Dêya wî di rêya Qizilbaşiyê de xizmeteke zêde kiriye. Wisa bawer dike ku perwaz kirine lê wê dîsa werin û tevlî wan bibin.

Kesê ku herî zêde jê piştgiriyê distîne Ap El e. Ap El, îro ne li jiyanê ye lê dîsa jî wilo hîs dike ku ew piştgiriyê didiyê, jê hêzê distîne. Ap El, ne apê wî yê bi xwînê ye. Wî weke bavê xwe, weke xwedayê xwe dibîne.

Sêcan, mexlesê Sîzer e. Sê keçên dê û bavê wî hebûne lê kurên wan nebûne. Ji bo ku kurek ji wan re bibe Ap El, Xalê Aç, Usivê Laşê himet kirine û Elî Sîzer hatiye dinê. Bawer dike ku van her sêkan can danê, ji ber vê, mexlesê xwe kiriye Sêcan.

Ev çend sal in ku ji axa xwe dûr ketiye, carinan dikare were welêt. Her tim bi hesreta axa xwe ye. Li gorî Sîzer, di dinyayê de tiştê herî xweş ku mirov li ser axa xwe bimîne û bi çanda xwe kilaman bistrê ye. Xeyala wî ya herî mezin belavkirina felsefeya Qizilbaşiyê ye. Li gorî wî, ku ev felsefe li dinê belav bibe dê şer xelas bibe.

2.1.1. Zaroktî û Perwerdehî

Sîzer, zaroktiya xwe li gundê xwe di nava dem û muhebetan de derbas kiriye û gelekî di bandora van muhebetan de maye. Herî zêde cimatên ku li malê dibûn bandor lê kirine. Gotinên cimatê, çanda xwing û biralixiyê, parvekirina cimatê, bi taybetî gotinên Ap El, rabûn û rûniştinê û lihevxwedîbûnê bandoreke mezin lê kirine. Çanda ku di zaroktiya wî de hebû çandeke jiyana hevbeş e, li gorî Sîzer. Di wê jiyanê de "Ez nebû em hebû, ya min nebû, ya me hebû. Çi kêmasiyên kê hebana di nava xwe de çareser dikirin kesek bi xwe nedihisandin. Yên ku vê rêyê û yolaxê diajonin ti carî nabêjin ez, dibêjin em. Di wan cimatan de pere nebûn, rik û qehr nebû, her kes weke hev bû, her tişt yê her kesî bû. Ku yek bi teyareyê, yek jî bi peya bihata teyare dibû ya peya û xwediyê teyareyê peya jî diçû. Piştgirtin zehfî zêde bû. Ti caran dost û hevalên xwe bernedidan, kesek bi malê dinê xera nedibû. Ku pêdiviya kesekî hebana digotin ev, îsal di kirasekî teng de ye û em alikariya wî bikin. Paleyî bi hev re dikirin, cot bi hev re dikirin. Berê, kesê ku zehmetî didît, ked dida ji yê dewlemend biqedirtir bû. Digotin bila ev dest tiştên ku vî destî da nebîne." Sîzer dibêje ku ev çanda ku dema zarokiya wî hebû îro guheriye, tiştê ku jê re pir dilşewat e jî guherîna vê çandê ye.

Bavê wî mirovekî xwenda bûye, bi Tirkî û zimanê Osmanî zanibûye û tim gotiye ez ê te bişînim xwendinê lê piştî ku pênc salan li gund dibistana seretayî xwendiye bûyerên dawiya salên hefteyî rû dane, bi taybetî komkujiya Mereşê ya sala 1978an, û ji ber tirsê ew neşandine dibistanê. Dibistana nîvetayî ji derve ve kuta kiriye û dîplome wergirtiye. Lîse jî ji derve ve xwendiye lê neqedandiye. Sîzer, ji zaroktiya xwe û bi vê de di nava xebatên *rê*yê de ye.

2.1.2. Destpêka Muzîkê û Kilamgotinê

Pêwendiya wî bi muzîkê re hîn wextê zaroktiyê dest pê kiriye. Apê wî Meelî, Apê Al, û Elê Cunê li tembûrê dixistin, wê demê hez ji tembûrê kiriye û xwestiye ku ew jî lê bixe. Lê bi taybetî dilketiyê tembûra Apê Meelî ye. Hîn ji van salên zaroktiyê ve bi tembûrê re eleqedar e û piştî bîst saliya xwe çûye kursê, pênc mehan perwerdehî dîtiye. Li ber destê Hesen Ekincî fêr bûye û bi awayekî

profesyonel li tembûrê xistiye. Her du kilamên xwe yî pêşî li kursê nivîsîne: Belgesela Goçera, Sewda.

Cihê muzîkê û kilaman li cem Sîzer gelekî taybet e, muzîkê weke rêya belavkirina felsefeya Qizilbaşiyê dibîne. Him ji bo parastina çandê û him jî bo parastina baweriyê girîngiyê dide muzîkê û muzikê weke rêya îfadekirina xwe dibîne.

Sîzer, girîngiyê dide zimên jî, ji ber vê bi taybetî dixwaze ku bi Kurmancî bistirê. Ji bo Kurmancî qet perwerdehî nediye. Dibejê berê zimanê dem û muhebetan Kurdî bû lê paşê guherî dixwaze ku vê çandê dîsa zindî bike. Tevên kilamên xwe bi devoka herêmî dibêje.

2.1.3. Xebatên Televîzyonê

Sîzer, sala 2001ê, li Semsûrê di Mercan TVyê de dest bi xebatên TVyê kiriye. Li wê dere kilam û helbest gotine, paşê dest bi amadekirina bernameyan kiriye. Şeş heft salan li wir xebitiye. Sala 2012an di TV 10ê de dest bi kêr kiriye. Di vê kanalê de çar salan bernameya *Riya Nurheqê* amade kiriye. Di çarçoveya vê bernameyê de li gundên Semsûrê, Mereşê, Qeyserî-Sarizê, Meletiyê û Sêwasê geriyaye û kilam û gotinên Qizilbaşan berhev kirine. Dibêje ku bi saya van geran bi kêmasiyên xwe hisiyaye û dîsa bi xêra van geran civaka Qizilbaş baştir nas kiriye.

Sala 2018an navê TV 10ê bûye Can TV, wî jî xebatên xwe di Can TVyê de domandine. Îro jî xebatkarê Can TVyê ye û bernameyên dem û muhebetê li ser navê Can TVyê li dêr dixe. Sîzer, Can TVyê weke mala xwe dibîne, dibêje ew televîzyon ne ya kesekî ye, ya me tevan e, dergeha me ye, bi loqmeya heqîqetê çêbûye. Li gorî wî, bi rêya bernameyên televizyonê civaka Qizilbaş hay ji hev çêbû, hev nas kir û li hev xwedî derket.

Piştî ku bi awayekî profesyonel li tembûrê xistiye û kilam nivîsîne di serê wî de fikra albûmê çêbûye. Sîzer, sala 2006an dest bi xebatên albûmderxistinê kiriye. Sala 2008 an albûma xwe yî pêşî bi navê Kilamek Du Kilam derxistiye. Sala 2012 an albûma wî ya diduyan derketiye. Heta îro çar heb albûm derxistine. Navên

albûmên wî: Kilamek Du Kilam, Sûreg, Şîna Husên, Çira. Niha albûma pêncan jî amade ye lê hîn derneketiye. Navê albûma pêncan Axîn e.

Ayetên baweriya Qizilbaşiyê kilam in. Ev kilam, bi hezaran salan bi awayekî devkî hatine gotin lê hêdî hêdî ber bi wendabûnê ve diçin. Sîzer, ji bo ku rê li ber vê yekê bigire xwestiye ku van kilaman bi rêya albûman biparêze û belav bike. Dixwaze ku ev kilam ji bo kesên ku baweriya Qizilbaşiyê meraq dikin li ber dêst bin û ku hinekan xwestin ku di heqê vê baweriyê de agahiyan bi dest bixin karîbin serî li van kilaman bidin. Ji bo van albûman ti dahata aborî bi dêst nexistiye û armanca wî parastin û danasîna çand û baweriya Qizilbaşiyê ye. Sîzer, kilamên xwe hîn bêhtir bi Kurmancî dibêje him dixwaze Kumanciyê biparêze him jî çanda Qizilbaşiyê.

2.1.4. Çûna Ewropayê û Planên Pêşerojê

Dema ku di TV 10ê de dixebitî dewletê gef li vê kanalê xwarine, hinek ji xebatkarên televîzyonê hatine girtin ew jî naçar maye ku koç bike. 11 Tîrmeha sala 2016an, çûye Wêlsê. Ji hingê ve li wir dijî, carinan tê welêt û vedigere. Li wê derê jî xebatên Qizilbaşiyê didomîne û di komeleyan de çalak e.

Dixwaze ku pêşerojê hinek xebatên cuda bike. Niha du projeyên wî hene: Çar Derî Çel Meqam, Bajarê Rizalixiyê. Çar Derî Çel Meqam şanoyeke muzîkal e. Di vê şanoyê de çar enasir –av, ax, ba, ar- têne temsîlkirin. Her unsûrek ji van deriyekî temsîl dike: Av, deriyê merîfetê; ax, deriye heqîqetê; ba deriyê şerîetê; ar, deriyê terîqetê. Xeyn ji van, derwêşek û rêwiyek hene. Rêwî li ser heyînê, pirsan dike û derwêş li gorî baweriya Qizilbaşiyê pirsên wî dibersivîne. Ev proje li ber xelasbûnê ye.

Bajarê Rizalixiyê jî şano ye. Bajarek tê temsîlkirin, li vî bajarî pere naçin, her kesek tiştekî tîne: yek sêvan, yek bacanan, yek gênim, yek nokan… Van tiştan pev diguherin. Jiyana ku îdeala Qizilbaşiyê ye tê temsîlkirin. Ev fikir hîn di asta projeyê de ye. Sîzer, heta niha ev bawerî bi rêya kilamên xwe, dem û muhebetan û tembûra xwe bo xelkê vediguhest lê niha dixwaze bi rengekî din, bi rêya şanoyan

baweriya Qizilbaşiyê nîşan bide. Dîsa dixwaze ku bernameyên dem û muhabetê bidomîne.

Ji bilî van, dixwaze ku Dergeha Dîwana çêbike. Li gundê wî, erdeki bavê wî heye. Dixwaze ku li nav vî erdî dîwaneke diwazdeh jûrî çêbike. Jûrek ji van mezin be, tê de dem û muhebet bêne lidarxistin û jûrên din ji bo pêdiviyên cuda cuda bin: yên ku li ser dîrokê bixebitin, yên ku li ser felsefeyê, yên ku dinivîsin, yên ku dixwînin… Dê her kes karibe were li vê dîwanê rêya xwe bajone.

2.2. Kilamên Elî Sîzer

Di çarçoveya vê xebatê de sih û heşt kilamên Elî Sîzer hatine berhevkirin û ev kilamên ku hatine berhevkirin di vê beşê de hatine dayîn. Kilamên ku di malperên înternetê de hatine peydekirin weke ku ji devê Elî Sîzer derketine hatine nivîsîn, di kilaman de ti guhertin nehatine kirin. Kilamên ku destxetên wî ne, bes ji aliyê rastnivîsê ve hatine sererastkirin. Kurmanciya Sîzer herçiqasî ku ji aliyê rêzimanê ve rast be jî ji ber ku Sîzer perwerdehiya Kurmancî nedîtiyê di rastnivîsa wî de xeletî hene û ji bo ku kilam bêne fêhmkirin ev xeletî hatine sererastkirin. Kilam bi tevahî bi devoka Semsûrê hatine gotin û nivîsîn.

2.2.1. Lîsteya Kilaman

Çar Derî Çel Meqam[2]

Li çar derî çel meqamî

Pîrê pîran miqam danî

Ez bi heyran wî siltanî

Hu Ellah hu eywellah

Li şerîetê bûnî rêber

Xwing û bira me da xewer

[2] https://www.youtube.com/watch?v=twYHRFq4c24&list=PLKM7uGs3FxyQM_9ks0pGIfG4dDCXkZHmg&index=6 (d.g., 24.10.19).

Xeq jî li me dikir nezer

Hu Ellah hu eywellah

Derbas bûn li bin tarîqan

Bûn talibê pîrê pîran

Can li hev ra me kir qurban

Hu Ellah hu eywellah

Giştik bûnî rê û l'riyan

Can li hev ra me kir qurban

Xizir li me diwû mîvan

Hu Ellah hu eywellah

Ketnî deryê marîfetê

Muhemmed Elî ve tev tê

Husên xwadyê şefaetê

Hu Ellah hu eywellah

Heft qat erd heft qat jî ezman

Ser bedenê kirin temam

Haqîqet bû sir û zeman

Hu Ellah hu eywellah

Çar anasir bûn çar derî

Çel meqamî bi xewer î

Sêcan dibê Elî qurban ti î serdar î

Hu Ellah hu eywellah

Jin û Cîhan[3]

Wextak erd gî av bû ezman dûman bû

Li navbera her duya xanek çêdibû

Li nav wê xanê jî Fatma mîvan bû

Ji bo wê em diwên cîhan wek jin e

Siya xwa girtiye erdê him jî ezmên e

Min ra li Hacerê, Sehra digotin

Tofana Nuh da wan îqrar dajotin

Hatin bi Mûsa ra jî tev pez dohtin

Ji bo vê em diwên cîhan wek jin e

Siya xwa girtiye erdê him ji ezmên e

Kîbelê li xwa da xwa peyda dikir

Him jin û him mêr û giya lê îna kir

Hîvê û royê jî ser ra perê xwa vekir

Ji bo vê em diwên cîhan wek jin e

Siya xwa girtiye erdê him ji ezmên e

[3] https://www.youtube.com/watch?v=_kEab47Zbhs&list=PLKM7uGs3FxyQM_9ks0pGIfG4dDCXkZHmg&index=4 (d.g, 24.10.19).

Ew arê Nemrûd, Zelîxê vemirand

Xetîcê Muhemed reng reng xemiland

Hezret Zeynew erd û ezman gî heland

Ji bo vê em diwên cîhan wek jin e

Siya xwa girtiye erdê him ji ezmên e

Qizilbaş[4]

Eger pirsa we jê hewe em kî ne

Navkî me erd, yek ezman e yek av bû

Nêçe hezar salan em li hev çex bûn

Wê wextê jî navekî me melek bû

Me li hev îna kir û îman anî

Li nav xwa da me xwa ra sermyan danî

Sulba Adêm hîv ro li me peyde bû

Sed bîst çar hezar cara ruh perwaz kir

Dawûd, Mûsa, Îsa, Muhemed va bang kir

Heftê hezar carî me hal beyan kir

Wê wextê jî navekî me tofan bû

Sulba Şît ra em bûn gurûhu Nacî

Heftêw du miletî ra bûn sertacî

Dilê me'l Muhemed ra bû mihracî

Ela, Ilî, Îlya, Elî hate dîn li çar derî

Meqam danîn li nav dilê çel merî

Deh û heft bacyan xizmet girtin wî derî

[4] https://www.youtube.com/watch?v=p0I9sd2SdHA (d.g., 24.10.19).

Wê wextê jî navekî me çelan bû

Li nav me da tine bû jin û mêrî

Yekî me çel çelî me yek hate dîn

Sira Elî sulba me da hat zimên

Wê wextê jî navê me Qizilbaş bû

Rêya Heqîqetê[5]

Rêka heqîqetê pirî kûrîn e

Ê bi merîfetê perçîn kirine

Milletê bê îqrar gişt kî dûrî ne

Herkes nikan bajon rêya heqîqetê

Di qal û bela da hîmê wê danîne

Can kirine qurban li me ra wanîne

Ne bi dê û bava ye ne pir zanîn e

Herkes nikan bajon rêya heqîqetê

Her car di nav xwa da xwa pêda kiriye

Bûye erd û ezman eysan çêkiriye

Li nav dil da xwa ra derî vekiriye

Herkes nikan bajon rêya heqîqetê

Rêka heqîqetê sirra emîn e

Li ser pelên spî spî jî dinivsîne

Navê wê xwandin e ilmê ledun e

Herkes nikan bajon rêya heqîqetê

[5] Wêne_1

Sêcan li vê rêkê miraz helanî

Barê nefsê rakir li dûr xwa danî

Bûme heyran vê rêkê, zarî, zimanî

Herkes nikan bajon rêya heqîqetê

Delîl[6]

Ew noqteya Heq bû di xwa da dagirt

Bûn şewq li cîhanê delîl vêxistin

Îsrafîl, Cebraîl, Mîkaîl, Ezraîl

Bûn melek li me ra delîl vêxistin

Çar anasir kirin hevîr histiran

Li neslê Adêm re delîl vêxistin

Navkî xwa ba û ax, navkî xwa ar û av

Çar derî Heq gotin delîl vêxistin

Li Şît û Naciya ra nefis rakirin

Bi nefesê li me ra delîl vêxistin

Hezretî Îbrahîm û Xelîlullah

Îshaq ra qurban hat delîl vêxistin

Tewrat, Zebûr, Încîl, Quran ku hatin zimên

Ehlîbêtê Muhemed delîl vêxistin

Xetice li Fatmê ra ku bûwû dayîk

Jinên çelan li me ra delîl vêxistin

[6] Wêne_2

Îlim kir xel Elî di xwa da veşart

Hesen Husen bûn yek, delîl vêxistin

Zênel Abdîn kirin zindana tarî

Biroşa baqir da delîl vêxistin

Bi îlim îrfana Caferî Sadiq

Musa, Kazim, Riza delîl vêxistin

Taqî, Naqî hele Hesenul Esker

Bi sirra Mehdî ra delîl vêxistin

Sêcan bûm heyrana rê û yolaxa wan

Giş hev ra misaw in ewna can bi can

Ê tengiyê Xizir lê diwe mîvan

Xizir, bi Elî Selmên ra delîl vêxistin

Bizanin[7]

Ê diwên qey dem û dewran rakirin

Em veşirîn wana neçê fêhm kirin

Rûniştin, li xwa û xwa ra falik vekirin

Em heyînî heyîn jî ê li me ye bizanin

Em ê li Heq in Heq jî li me ne yî dûr e

Ne bi zimên e ew halkî, rêka pir kûr e

Dijminê me nefs bû me kuşt, ew li me ra ne sur e

Dem ya me dewran jî ê li me ye bizanin

Eysanê bê dost li cîhanê yî der e

Li cemalê î mehrûm e merîfetê bê xewer e

Dêst bigirin li kamila bira emrê we boşê nere

Kemal ya me ye, kamilî jî ya me ye bizanin

Me ya Heq go Heq jî li me bû mîvan

Merîfet li herd cîhana bû siltan

Em bûnî ax hêlek me jî bû asûman

Erd û ezman ew siya me ye bizanin

[7] Wêne_3

Hûn ê biwên Sêcan tu çima wir diwê

Tu li himber Heq asî diwî har diwî

Gotin ne ya min e riyê me wir diwê

Em ê li rênî rê jî ê li me ye bizanin

Gula Meqama[8]

Gulê min jî keko gula meqama

Gul vediwe heyra li ser niqama

Êk nizane ê bê kanî gul kî ye

Gul dayika Heyder deh û du îmama

Hu hu hu pîrê min Elî

Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gî dizanî

Heyder Heyder Heyder derd ra derman î

Gulê min jî keko guleka zer e

Vediwe li cîhanê ku daye der e

Êk nizane ê bê kanî gul kî ye

Gul dayika Heyder tim pêxember e

Hu hu hu pîrê min Elî

Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gî dizanî

Heyder Heyder Heyder derd ra derman î

[8] https://www.youtube.com/watch?v=xwJun4yhK_s&list=PLKM7uGs3FxyQM_9ks0pGIfG4dDCXkZHmg&index=5 (d.g., 24.10.19).

Gulê min jî keko gula sipî ye

Li îqrara saxa ê dawistiye

Êk nizane ê bê kanî gul kî ye

Gul Selman e Heyder li ber Elî ye

Hu hu hu pîrê min Elî

Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gi dizanî

Heyder Heyder Heyder derd ra derman î

Gulê min jî keko guleka sor e

Vediwe li nav dila qe ne yî dûr e

Êk nizane wê bê kanî gul kî ye

Gul şivika Heyder li dest Xizir e

Hu hu hu pîrê min Elî

Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gî dizanî

Heyder Heyder Heyder derd ra derman î

Ew kanya dîwana Ap Şikriyê Çamê

Çel diwe yek qurba radiwin demê

Şale li me nebire gundê Qereqûçê

Ap Açê Mamê, Ap Elê Gulikê, xwadiyê temamê

Hu hu hu pîrê min Elî

Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gi dizanî

Heyder Heyder Heyder derd ra derman î

Qerebêl[9]

Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra

Mîvan hatin li Sêwasê lê dixine tembûr saz e

Meqam girtin heqîqetê Ulu Baba ul niyaz e

Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra

Deşt û zozan xweş xemilîn

Xweziya min dihat vî dilî

Êk li Heq ra songi anîn

Lê diyarî bû zerbana gulî

Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra

Sê siwar hatin xana gir da

Av deranîn li zinêr da

Mirazxwaza miraz danîn

Di saya Xocê Xizir da

Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra

[9] https://www.youtube.com/watch?v=R1V9rofdmSc&list=PLKM7uGs3FxyQM_9ks0pGIfG4dDCXkZHmg&index=2 (d.g., 24.10.19).

Kal û Ap El tev rûniştin

Ûsivê Laşê li xwa niştin

Bûn mîvanê Elê Tatê

Nefsa zalim li ortê kuştin

Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra

Dem Bû Dem[10]

Va çi xem e û çi xeyal e

Cemal Heq e û Heq cemal e

Li cemalê kekê min jî

Qet tu cara nawêw qal e

Şeva îşev saeta hazir

Bira li me ra songiyê wîne

Serê xwa jî li me werîne

Kekê Hesen qurbaw Husen

Êrê Fatimê, Eliyê zelal e

Dem dem mala min demêy

Dem dem halê min demêy

Gelîr gêçer dunya xemêy

Dido dila Heq î li cemê

Dema kekêm dem giran e

Dem digere her du piyan e

Bira li me ra songiyê wîne

[10] Wene_4

Serê xwa li me werîne

Î comerd e Demîr Dede

Yar tixtorê tixtora ne

Ûmdiya kela û kura ne

Bê mexelê xezalan e

Xwadiyê feqîr fuqera ne

Şeva reş bû teng û tarî

Rama Heq li dilê saxa

Perîşanda bol bol barî

Were tu ya xwa bi ya me mede

Ro li nîvro serê kesa

Qurba nekî şev û tarî

Loy comerd e gola tarî

Bira li me ra songiyê wîne

Yar çîplaxê tengîw tarî

Diwêm yanê kekê min yanê

Hiro dinya ye siwe dîwan e

Bi destên boş bi rûyê reş

Em nerin hizûra wan e

Yar tembûrê tel û perda

Loy aşiq û bextê te da me

Carkê rale wî sazî

Tu him biwê him jî lêxe

Yar aşiq û kul û derda

Bibexşîn[11]

Tu nemînî li kêm û qisûriya me

Bi kemal û cemala xwa kî bibexşînî

Em ê bi ling win bê te tune serê me

Dilê saxa îqrara sadiqa kî bibexşînî

Minnet dikim li te nakim bazarê

Amma tu me li ker nekî zirarê

Bira vewin kesera li dû keserê

Tê nalîna Zênel Abidîn kî bibexşînî

Eyan e li te ra her halikî min

Tê gumanê derxî li nav dilê min

Bira vewe li nav dilê te gula min

Tu bi zarê bilbila kî bibexşînî

Rica dikim bibîze hewarya min

Bes e biwêne dil gudarya min

Bê navê te qet nagere zarê min

Tu bi hewesa dila kî bibexşînî

[11] Wêne_5-6

Heyrana te aman li me neqarî

Îna dikim tu him av î him ar î

Werî keremê bi gul wî li me bibarî

Tu bi nergizê Selmên kî bibexşînî

Heftêw du milet in ew gişt in tevna te

Rengê biharê para min ra xemla te

Hîv roj erd ezman cemala te

Tu bi Teraziya Mêrzîn kî bibexşînî

Sêcan rica dikim navê tey ezîm

Bi şev bi roj li riya te diwezim

Mirazdar î ez li te mirazxwaz im

Tu bi kaniya miraza kî bibexşînî

Dewrêşane[12]

Te ez kirim riya dewrêş û dîwana

Gotin ya te himmet ya te rê ya te

Rêça te çex diwim ez wek perwana

Çexbûn ya te hatin ya te çûn ya te

El eman dilê min li xwa dûr nedî

Cemala xwa van çavê min kur nekî

Rêw yolaxa li serê min pir nekî

Cîhan ya te cemal ya te eşq ya te

Para min ra tu yî kanya miraza

Bê te tune qe umdiya mirazxwaza

Xwas û tazî millet li çol û gaza

Kiras ya te miraz ya te can ya te

[12] Wêne_7

Axîn[13]

Sewra dilê min lawko lo

Bê lo lawo huy lawko lo delal lo

Xemla malê min lawko lo

Huy lawko lo bê lawo xwang qurbawo

Goça lêwik bi rê xistin

Bê lo lawo huy lowko lo delalo

Ar jî bi dilê min xistin

Huy lawko lo bê lawo xwang qurbawo

Lawkê delal bi sal çûk e

Bê lo lawo huy lawko lo delalo

Şûnda hiştiye rehla bûkê

Huy lawko lo bê lawo xwang qurbawo

Sêcan dilêm mij duman e

Bê lo lawo huy lowko lo delalo

Dilêm bû behra kulan e

Huy lawko lo bê lawo xwang qurbawo

[13] Wêne_8

Anasir[14]

Di qal û bela da em ê bi tev bûn

Erd û ezman tunebû em hebûn

Bûnî bask û pî em ruh û beden in

Bes e mekin bes e

Va Heq înkarî ye

Me tu cara nego ê te û ê min

Ne bajar ê te wû ne jî gund ê min

Mîna xwang û bira em ê tim tev wûn

Bes e mekin bes e

Va Heq înkarî ye

Min cemalê te da xwa dî

Ez bûme qurbanê rê

Îqrar da te qet nediçûm derî rê

Bes e mekin bes e

Va Heq înkarî ye

[14] Wêne_9

Bîlligî[15]

Ê ki dixwazin zulum rawe

Her çar aliya gul û bax we

Cumle cîhan hev ra yar we

Bigirin meqamê bîlligiyê

Em ê bibin yek zulm ê rawe

Dilê mezlûma ê şa we

Hewes û hesretî ê sax we

Bigirin meqamê bîlligiyê

Ey milletê bindestî

Ger hûn dixwazin aşitî

Gişt hev ra diwên biratî

Bigirin meqamê bîlligiyê

Sêcan em li hev ra yar bin

Li hember zulmê dîwar bin

Soz bidin û bi dil û can bin

Bigirin meqamê bîlligiyê

[15] Wêne_10

Birin[16]

Birin birin sewra dilêm birin

Birin birin roniya çavêm birin

Xanê me xira kirin

Konê me bela kirin

Em macir kirin dilo

Ji xwa ra xerîw kirin

Birin birin sewra dilêm birin

Birin birin roniya çavêm birin

Gundê me gî ar kirin

Navê me li xwa kirin

Em macir kirin dilo

Ji xwa ra xerîw kirin

Birin birin sewra dilêm birin

Birin birin roniya çavêm birin

[16] https://www.youtube.com/watch?v=PsRmKjuPFHM (d.g., 02.04.2020).

Namûsam paymal kirin

Malê me li xwa par kirin

Em macir kirin dilo

Ji xwa ra xerîw kirin

Birin birin sewra dilêm birin

Birin birin roniya çavêm birin

Dema Elî[17]

Elî qurba tî comerd î, rindo rindo tî comerd î

Tu comerd î meriyê merd î

Werin keremê û îhsanê

Me jî li va tenga wer dî

Werin demê bi dewran kin

Meriyê gêrçek hûn in werin

Heval qurba li min mîvan kin

Mal û canê min bi qurban kin

Ulu Baba ulu çiyan e,

Uzêr Xefarî li çatê riyan e

Ez qurban Mehmûd Hesarî

Ew dermanê derdan giyan e

Va Mereş e xweş Mereş e

Pîrêm tê da tim dimeşe

Elîf Anê temenna ne

Elê Qut babay î serbaş e

[17] https://www.youtube.com/watch?v=gyP6jwYary4 (d.g., 24.10.19).

Xwezika ku dilê me yî payî bûya

Î bi hev ra tim xayî bûya

E ku bi saxa gotî ya pîr

Axuçan jî lê diyarî bûya

Kal û Ap El min diyarî bûya

Ha Yaro[18]

Ha yaro yaro tu yarê min î

Kesê bêkesa xwadiyê neçara

Ha yaro qurba perginda giyan î

Ha yaro ha yaro yaro yaro tu yarê min î

Lê tême tême loy yaro tême

Ew qewmê zalim qewmê Yezîdan

Em macir kirin lo yaro qurba ez te nagîme

Ho yaro yaro ez te nagîme

Ha yaro yaro tu yarê min î

Ha yaro yaro tu kekê min î

Ha yaro qurba bi çûnê û bi hatinê

Ha yaro yaro bi çûnê û bi hatinê

Ez bi heyrana dêv û gotinê

Ti car têr nebûm qet ûsan nebûn

Ha yaro qurba li rûniştinê

Ha yaro yaro tu yarê min î

[18] https://www.youtube.com/watch?v=qYnR4PgtdkI (d.g., 24.10.19).

Gotinê pîrê min gî heqîqet e

Qapiyê pîrê min gî heqîqet e

Ew pîrê pîran Îmam Husên xwediyê îrfanê

Şale li me ra bike şefqetê

Ha yaro yaro bike şefqetê

Ha yaro yaro tu yarê min î

Ha yaro yaro tu kekê min î

Konê yarê min qe ne yê gir e

Li ser dinê ra kiriye çadir e

Alî çalî û çirpî ye heval

Ar hêwir nawe lê nahêwire

Ha yaro yaro tu yarê min î

Ha yaro yaro tu kekê min î

Sewda[19]

Lo mere lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Lo lo lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Ne go erê ne go nao lo lo lo sewdao

Sewa xatrê soza saxa dimame li deştê Kerbelê

Me îna kir îman anî canê xwe kir qurban rêo

Lo mere lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Lo lo lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Gelek caran şên î şa yî gelek caran li min qariyayo

Sewa xatrê dara Mansûr, Nesîmî ki post hat guranê

Me îna kir îman anî serê xwe li rêya wan danî

Lo were lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Lo lo lo sewdao sewdayik Xwedê dao

Ew sermiyana bav û kala hele qurban li me ra mao

Sewa xatrê soza saxa êk li hev ra songi anîn

Me mirazê xwa jî qurban li nav dilê wan hilanî

[19] https://www.youtube.com/watch?v=eJdzx8RFCbg (d.g., 24.10.19).

Girê Elî daxê kon e

Çar hêlê xwa gul û giyan e

Sî û du derdan re derman e

Ew meqamê sê sed şêşt û şeş ewliyan e

Erê ew li deştê û çiyan e

Diwim qurban rê û yolaxê ku wan gerçeka li me ra danî

Şale ew jî li me nebire bavê me yî kal Dewrêş Ûsiv

Çû bi seradê av anî

Wan ku em henî li vî sewdayî ên tineye dike heyî

Ên di xew da dike payî ew sermiyanê bav û kala

Rê û yolaxa ku li me ra mayî

Ellah Ellah Ellah Ellah

Ellah Ellah Ellah Ellah

Bi vî sewdayî ketim çerxê

Gumanê li nav dilan derxe

Canê me qurbanê rê ye

Qurban ne kar û berx e

Baba Tahîr, Baba Mansûr

Ew li dilê me bûne nûr

Dibim heyran Ebul Wefa

Bû taca serê arifa

Ellah Ellah Ellah Ellah

Ellah Ellah Ellah Ellah

Baba Îshaq, Baba Resûl

Serî rakirin li Semsûrê

Ew bûne rêberê welî

Ew li me ra bûn şewq û rê

Şêx Bedredîn û Çelebî

Pîr Sultan ruhê xwa li wan dî

Elîşêr derket meydanê

Seyîd Riza li dar û dîwanê

Ellah Ellah Ellah Ellah

Ellah Ellah Ellah Ellah

Kal û Ap El bûn sirra wan

Li derdan ra bûne derman

Ya Ûsivê Laşê el eman

Sêcan im ez qurbana wan

Şîna Husên[20]

Hûn qalê kekê min mekin

Qala malê bavêm mekin

Êr bermedin nav dilê min

Kul û birînê min vemekin

Ax kekê min can Husêno

Tu gênco ayîn girano

Ax pîrê min tim Husêno

Lo gênco ayîn girano

Hen kekê min li min ra wînin

Hen pîrê min li min ra wînin

Canê min bi qurbana pîr kin

Serê min li ber linga dînin

Ax kekê min can Husêno

Tu gênco ayîn girano

Ax pîrê min tim Husêno

[20] https://www.youtube.com/watch?v=yMvJrW0_P6E (d.g., 24.10.19).

Lo gênco ayîn girano

Meta Zeynew carkê ban kir

Bê Xwedêo hana nawe

Destê bûkê zavê hene

Qet tu cara li hev nawe

Ax kekê min can Husêno

Tu gênco ayîn girano

Ax pîrê min tim Husêno

Lo gênco ayîn girano

Mal û mewalê me nîştin

Xwing û bira hev ra kuştin

Li Kerbelê meyîtên me

Î bi xwînê têne şûştin

Ax kekê min can Husêno

Tu gênco ayîn girano

Ax pîrê min tim Husêno

Lo gênco ayîn girano

Ya Xwedê[21]

Va niyaza êk xwa nas kir

Qurban canê êk navê te

Bêqerez û li xwe ferz kir

Îşte ew dila bêt e kabe ye ya Îlahî

Ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî

Em ê di xew da tu tim payî

Tu her cah î ne cah cah î

Tu ostayê tim rasta yî

Ne hevalê derewa yî

Solixa dilê westiyayî

Ya Îlahî ya Îlahî

Şevê û royê ra şenziya yî

Pirî rind î bêheya yî

Mîna saya hîvê û royê

Pirî turab î bêpeya yî

Îşte ew dawa ye ya Îlahî

[21] https://www.youtube.com/watch?v=cJ2rC5XtHyM (d.g., 24.10.19).

Ya Îlahî ya Îlahî

Ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî

Em ê di xew da tu tim payî

Tu her cah î ne cah cah î

Tu ostayê tim rasta yî

Ne hevalê derewa yî

Solixa dilê westiyayî

Ya Îlahî ya Îlahî

Îslam im îmamê tu

Merheba û silava me tu

Noqsan im temamê tu

Sebir qinyat famê me tu

Ez jî li vî qulî û zemanî

Sûndxwariyê ya Îlahî

Ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî

Em ê di xew da tu tim payî

Tu her cah î ne cah cah î

Tu ostayê tim rasta yî

Ne hevalê derewa yî

Solixa dilê westiyayî

Ya Îlahî ya Îlahî

Were Mala[22]

Tu çûyî em bê te manî

Me tiştek qe fam nekir

Ne li vê gotinê rindo

Ne jî li vî zemanî

Uy delal were mala

Loy qurban were mala

Ez heyran te û hevala

Ez qurban we hevala

Delal were mala loy qurba were mala

Destê xwa destî min ke

Bigernî li bexçê gula

Em biwên şora dila

Tu li dûr min dadiwistî

Bê te em macir bûnî

Tenê man bûn berdestî

Uy delal were mala

Loy qurban were mala

[22] https://www.youtube.com/watch?v=smNok4WD_Ss (d.g., 24.10.19).

Ez heyran te û hevala

Ez qurban we hevala

Delal were mala loy qurba were mala

Destî xwa destê min ke

Bigernî li bexçê gula

Em biwên şora dila

Uy delal dûr min mere

Ez qurba ber min were

Dilê min bûye gerokcî

Bi şev ro te digere

Uy delal were mala

Ez qurban te û hevala

Delal were mala loy qurba were mala

Destî xwa destê min ke

Bigernî li bexçê gula

Em biwên şora dila

Oy delal oy rindo tu min ra biwî heval

Rindo[23]

Pîrê xwa ra rawim darê

Kekê xwa ra rawim darê

Ew gotina wa jî rindo

Ew gotina wa jî rindo rindo rindo rindo rindo rindo rindo

Ti caran li bîra min nare

Uy delalo uy hevalo

Kula dilê min jî qurban eman eman eman eman eman eman

Bi ro bi şev tim delal e

Ew heval e uy delal e

Ew heval e tim delal e

Hele li eşqê vî sewdayî

Hele li eşqê vî sewdayî

Diwim qurban wî Xwadêyî

Diwim qurban wî Xwadêyî ku rindo rindo rindo rindo rindo rindo

Para mi ra ku tu dayî

Uy delalo uy hevalo

[23] https://www.youtube.com/watch?v=rtEF_RVZQ6s (d.g., 24.10.19).

Kula dilê min jî qurban eman eman eman eman eman eman

Bi ro bi şev tim delal e

Ew heval e uy delal e

Ew heval e tim delal e

Hele li edebê û êrkanê

Hele li edebê û êrkanê

Şale tu me mehrûm nekî

Şale tu me mehrûm nekî rindo rindo rindo rindo rindo rindo

Li mektewa îrfanê

Uy delalo uy hevalo

Uy delalo uy hevalo

Kula dilê min jî qurban eman eman eman eman eman eman

Bi ro bi şev tim delal e

Ew heval e uy delal e

Ew heval e tim delal e

Belgesela Goçera[24]

Ro helatiye ro li ava

Goçer neman yaro qurba

Xwa dane serê delava

Çûna ara manî heylo

Heylo yaro ez bi te va

Heylo heylo heylo yaro

Heylo heylo heylo yaro

Çiyayê sipî çî bi av e

Çûmê hatim mi da nave

Êk destê me li hev bike

Ez sûnd dixwim gune tune

Her du dinya î bê av e

Heylo heylo heylo yaro

Heylo heylo heylo yaro

Çiyayê jorê ulu çiyan e

Baxçê gula û sosinan e

Şûna êr û ewliya giyan e

[24] https://www.youtube.com/watch?v=teEg659iEi0 (d.g., 24.10.19).

Derd î li min uy hevalo

Derman î li destê wan e

Heylo heylo heylo yaro

Heylo heylo heylo yaro

Dema Dîwana[25]

Îmam Husên pîrê min î

Dûr û nêzîk gi diwîzî

Pîro qurba gi diwînî

Ê ku gotî îqrar yek e

Didu nabin ku sikinîn

Tu jî li me ra songiyê win î

Vir da vir da heval vir da

Rûmene di xana gir da

Memê Hêcî, Kerrê Kavî

Hev ra gotin şora dila

Rih berdane di kêvir da

Were rûne gavê li vira

Ez bêm keko tu bê bira

Şale li me ra songiyê win e

Diwim qurban Demir Dede

Loy rindo qûnça kevira

[25] https://www.youtube.com/watch?v=SeQ_W9zAd0s (d.g., 24.10.19).

Loy heval qûnça kevira

Rêya uluya ser bi ser e

Pê da bigre heval were

Murşîdê me Doxan Dede

Pîrê me jî tim Qember e

Ser dilê saxa yî bi xewer e

Duaz-i Îmam[26]

Werin demê werin demê

Ki em li ortê rakin xemê

Ez bi qurban Eliyê zelal

Şale li me giya tim diyarî we

Hesen Husen şahê alemê

Hesen, Husen pîrê alemê

Min go gir e heval gir e

Tu kerem ke were vir e

Zeynel Aba, Muhemed Baqir

Ez bi qurban Qutbê Îlhêm

Cafer Sadiq li me nebire

Pîrê pîra li me nebire

Baran barî hûr bi hûr e

Wen ki em henî mala pîr e

Mûsê Kazim, Xulqî Riza

Ez bi qurban Taqî, Naqî

[26] https://www.youtube.com/watch?v=Bw11NVeWExM (d.g., 13.11.19).

Şale ew jî li me nebire

Rê uluyan ser bi ser e

Pê da bigre heval were

Ez bi qurban Hesen Esker

Î bi xetî û bi ferman e

Li Mehdî ra î bi xewer e

Pîrê demê kî û kî ye

Yek Muhemed yek Elî ye

Kê li pîr ra songi anî

Serê xwe li ber linga danî

Ew heqa timî li ba wî ye

Ya Elî[27]

Wexta ki Elî heyî tu kes tunebû

Di nûra Elî da va dinya çêbû

Erd û ezman hat zimên lê pêda bû

Gotin ew jî sirra te ye ya Elî

Hina digot hêl av hêlek duman bû

Hina digot wexît axir zeman bû

Li hev geriya ki wexta xwa temam bû

Me go erd û ezman jî tu yî ya Elî

Li çerxê çex dibûyî digotin melek

Ew xwadiyê riha bû navkî xwa felek

Êk îna nekir giş diwûn helak

Me go Nûh û Lût jî tu yî ya Elî

Her kitawê ezîm ki hatin zimên

Go bavê axê ye histûna ezmên

Ew noxteya Heq bû, bû sirra zemên

Me go sirra Heq jî tu yî ya Elî

[27] Wêne_11

Sêcan navê Elî hatnî cîhanê

Li benda wî ketnî dema îrfanê

Heyîna Elî qet neketnî gûmanê

Me go tu Heq î heqîqet î ya Elî

Bêrî Bêrî[28]

Bira ha we keko ha we

Bira ha we keko ha we

Bê min diwî dilî westiyayî

Ez bi qurba bê te nawe

Bêrî bêrî heval bêrî

Bêrî bêrî keko bêrî

Dost ji dostê xwa nebirî

Tê me tê me pîrêm tê me

Tê me tê me keko tê me

Bar giran bû riya min dûr bû

Ez bi qurban te nagême

Sêcan li têra têrkî hur wûm

Ez ê li têra têrkî hur wûm

Herim werim ser dilê saxa

Hewesa ra ez bifirim

[28] Wêne_12

Birîndar im[29]

Pîro qurban were min macir meke

Kerem ke deriyê dilê xwa li min veke

Ew dilê neyara bi min şa meke

Birîndar im, ez macir im, neçar im

Damîş nawim ez cemalê te newînim

Xwa li xwa ra ez ê xerîw bimînim

Por pincikê xwe helkim tu car nahûnim

Birîndar im, ez macir im, neçar im

Digerim çar aliyî dostê dost tune

Boy muhebbeta dilê saxa yî birçî me

Wenda bûme qet nizanim ez kî me

Birîndar im, ez macir im, neçar im

Bi ayîn im tim reş e li serê min e

Bes e were reşê li serê min dîne

Hewesa xwang û bira me li xwa ra wîne

Birîndar im, ez macir im, neçar im

[29] Wêne_13

Sêcan im pîrê min tu perdê rake

Bira sax be hesret, dilê min şa ke

Şîrîn canê min ê li xwa ra qurban ke

Birîndar im, ez macir im, neçar im

Ez Çir Bikim Vê Dunyayê[30]

Kesekî nizanî halê min

Şikênan nênka dilê min

Bêxwadî hiştin gula min

Ez çir bikim vê dunyayê

Rêka min êxistin zorê

Bi hesret emrê min terê

Şewitîm hewesa yarê

Ez çir bikim vê dunyayê

Bûme terê perşikestî

Nizanim xezala li kerî qetî

Ney li xwa me li welatî

Ez çir bikim vê dunyayê

Nemam nemam Sêcan nemam

Rojê me bûn ax û eman

Çavêm stêrk in dilêm duman

Ez çir bikim vê dunyayê

[30] Wêne_14

Hal û Zeman[31]

Ez î bi nav bûm bi nîşan bûm

Li baxan gula şên bûm

Macir bûm welatê xelkê

Ro di royê da perîşan bûm

Hawar dilo kes newîne

Herkes li arê xwa bimîne

Hawar dilo hawar hawar

Der û cîranê me hewûn

Ken û giriyê me tev bûn

Dest zulmeta van zaliman

Der û cîran em li hev bûn

Li diyaran çûm diyara

Mame hewesa xwang û bira

Bûme pariyê li dev gura

Dilhewes û derdgiran bûm

[31] Wêne_15

Em rûdinîştin quncikan

Guh dida ser kal û pîran

Sêcan şîret digirtin li wan

Em bê şîret bê ogit man

Li Vî Arî Vî Zozanî[32]

Li vî arî vî zozanî

Ez aciz bûm li vî canî

Ricayê min li te sultanî

Êndî bes e bira ez bimirim

Ez bi dilî te yî şûştîwûm

Bi merîfet rûniştîwûm

Li dostan ra bi omdîwûm

Êndî bes e bira ez bimirim

Qe rêça te min wenda kir

Kirasê neçê di xwa da kir

Deryê derewa lê vekir

Êndî bes e bira ez bimirim

Ketim nav gola gemarê

Dûr mame namûs û arê

Li ronyê ketim êvarê

Êndî bes e bira ez bimirim

[32] Wêne_16

Bi êmegê te dişewtim

Kuriya dil da dikewicim

Nikam xwa bêm dibihecim

Êndî bes e bira ez bimirim

Bûm qûlekî dewar newûy

Kula îlancixê ku dernewûy

Miriyê heft rokî ax serbûy

Êndî bes e bira ez bimirim

Sêcan im nizanî ki ê ha we

Halê min ê bi halê sa we

Bêderê min gişţka bi ka we

Êndî bes e bira ez bimirim

Mîvan û Mazûvan[33]

Mîvanê kekê min xêr hatin

Gişt meriyê bi îtîqat in

Qet kes newên songî natin

Hin ewliya ne hin lê zat in

Ez koçekê bavê xwa me

Li ber derî dawistî me

Dilêm ne xem û ne xeyal e

Li benda îqrara xwa me

Gul hêşîn tên pêgera wan

Peya nawin li dilê bi duman

Li derdan ra diwin derman

Melem ê li destî wan e

Çiqas xwaş e bê mahne ne

Dehrd î li me derman î li wan e

Him eşq in him jî sewda ne

Ez distirêm kilama wana

[33] Wêne_17

Nûr dibare li ser dilan

Çar alî tê bîhîna gulan

Zar digere wek bilbilan

Gul vediwin aşqa wan ra

Hele hayî Sêcan hayî

Îro dest li me bûne xwayî

Dilên xew da kirin payî

Bext û miraz rêka wana

Neslê Me[34]

Em li Heq ra bi mizgîn in

Neslê me ê li dîwana ye

Axê radikin û ezmên datînin

Neslê me ê li dîwana ye

Em li hev ra ne bi gûman in

Him dîhn in em him îman in

Him axir in him zeman in

Neslê me ê li dîwana ye

Em jî henî li şerîetê

Rûdinînî bi merîfetê

Guhdardikînî ya ki li Heq tê

Neslê me ê li dîwana ye

Dilê me ne şek û ne gûman e

Meqamê me meqamê gulan e

Îqrarê me ê bi dilan e

Neslê me ê li dîwana ye

[34] Wêne_18

Bê qirar gavê rananin

Li her çîçekê dananin

Dostên sadiq ra amman in

Neslê me ê li dîwana ye

Diskinînî dîwana Heq da

Me go ya hu neslê pak da

Kerem kin Sêcan heq da

Neslê me ê li dîwana ye

Şikir[35]

Xêlî zeman e ez î bi hewesa we me

Şikir bi saetê bi vê demê şikir

Bi dîna we pir û pirî dilşa me

Şikir bi saetê bi vê demê şikir

Dilê min bi dîna we bû gul vewû

Li serê min bihar hat, zivistan rawû

Timî çav rê wûm dilê min hewesa we wû

Şikir bi saetê bi vê demê şikir

Ê ki macirî nedînî hewesa nizanin

Meriyê macir çawê bi sêrik in dilê xwa yî bi dûman in

Dost li me ra omdî ne û el amman in

Şikir bi saetê bi vê demê şikir

Li min kêm mekin vê eşq û muhabbetê

Sewr û solixa dilêm bi we xweş dertê

Ez heyran we ku Sêcan bîra we tê

Şikir bi saetê bi vê demê şikir

[35] Wêne_19

Ya Xizir[36]

Çi bi nûr î çi bi nezer î

Li her derê tî bi xewer î

Ê tengiyê pî didî berê

Kesê bêkesa ye ya Xizir

Carna hîv î hîva zerî

Diwî ro û didî derî

Ne li cihekî tî li her derî

Sirra Heq î tu ya Xizir

Hezar yek navî bi zar î

Îqrara sadiqan gudar î

Mirazxwaza mirazdar î

Kanya mirazay ya Xizir

Salbiçûk diwî û dilîzî

Qet naskinî tim î bi lez î

Dil jî li meryan didizî

Dizê comerd î ya Xizir

[36] Wêne_20

Car peya carna siyar î

Gehî xurt gehî extiyar î

Li nav dile Elî tu yar î

Yar û yaren tuy ya Xizir

Sêcan kelp im li deryê te

Gudarî me rêberya te

Tu nemînî li qusurya me

Bibexşînî xwa ya Xizir

Sewda[37] (2)

Pîr qurbana kemalê

Têr newûm li cemalê

Sew xatirî sewday şîrîn

Macir kirin qewmê me

Surgun kirin qewmê me

Li çiya û baniya dinale

Haylo haylo sewdao

Çi î şîrîn î çi î şao

Pîrê me pîrê pîra da

Pîrêm Kalê, Ap Elê da

Va li me ra sermiyan mao

Tuy dil î qurba dil î

Loy dil î rindo dil î

Me jî li du goçê nêlî

Tu bi bejnê çi î kiwar î

Nizanim bi te ra bêm mêrgê

Ez nizame tu baxçek gul î

[37] https://www.youtube.com/watch?v=b1dW6JJK3p8 (d.g., 02.04.2020).

Haylo haylo sewdao

Çi î şîrîn î çi î şao

Pîrê me pîrê pîra da

Pîrê mi Seyîd Riza da

Va li me ra sermiyan mao

Uy merd e qurba merd e

Loy merd e rindo merd e

Dutsaxa li tengiya berde

Birîndarê deştê û çê

Tuy destê xwey bimbarek

Pîr qurba dermên ser de

Ez qurba dermên ser de

Haylo haylo sewdao

Çi î şîrîn î çi î şao

Pîrê me pîrê pîra da

Pîrê me di av û çala da

Va li me ra sermiyan mao

Mêmaniyê min çal e çal e

Tembûrêm çal e çal e

Bi ro bi şev dinale

Ê ki bi zimên nizane

Ê ki bi me nizane

Hin diwên va sewda ye

Hinî diwêne va hal e

Haylo haylo sewdao

Çi î şîrîn î çi î şao

Pîrê me pîrê pîra da

Pîrêm Kalê, Ap Elê da

Va li me ra sermiyan mao

Hevalê Neyar[38]

Êk me go heval in terka me kirin

Ketin nav bexçê me gula me birin

Dil û qolincê me birîn vekirin

Ez ê bimrim heval bi van derdan ra

Bi van kulan ra

Gotin em gî yek in goç bi rê xistin

Songiya xwa nanîn ez bi tenê hiştim

Macir bûme keko ez tême kuştin

Ez ê bimrim heval bi van derdan ra

Bi van kulan ra

Ro helatye hele çingê bi tîn e

Elefa cahîla me dişewtîne

El aman ya Xizir xwa bi me gîne

Em ê bimrin bê te li van çolan jî

Em man bê av jî

[38] https://www.youtube.com/watch?v=uHrAeiYlFGI (d.g., 24.10.19).

Felek[39]

Sal ê çex bû peyiz e

Dilê me bê te yî zîz e

Berfikê da qolincê

Delala pir arsiz e

Uy felekê nav çendê

Te solixa mi li mi stendê

Bûy kulika qansêrê

Te emrêm gencî stendê

Hele li çiya û gira

Heyrana xwang û bira

Derdê xelkê ne yek in

Derd dane min bi qentara

Uy felekê nav çendê

Te solixa mi li mi sendê

Bûy kulika qansêrê

Te emrêm gencî stende

[39] https://www.youtube.com/watch?v=wmfCrIi_wfg (d.g., 24.10.19).

Çawê rawû lê miştin

Me diktor hekîm niştin

Min çi bi te kir felek

Te e li dû hevala hiştim

Uy felekê nav çendê

Te solixa mi li mi stendê

Bûy kulika qansêrê

Te emrêm gencî stendê

2.2.2. Ji Aliyên Teşe, Naverok û Şêwazê ve Analîzeke Kurt a Kilamên Elî Sîzer

Mijara vê xebatê di kilamên Elî Sîzer de şopên baweriya Elewîtiyê ye lê piştî ku kilam hatine nivîsîn bi ya me dê baştir be ku ji aliyê teşe, naverok û şêwazê ve analîzeke kilaman were kirin. Ji ber mijara me rasterast ne ev e, em analîza kilaman yek bi yek nakin, ji dêlva vê yekê ve em cih bidine analîzeke giştî. Sîzer, kilamên xwe ne bi şêweyekî azad nivîsandine. Di tevên kilamên wî de hewla ku kilam birêkûpêk bin tê dîtin, kilamên xwe bi pîvana kiteyî û çarmalkan nivîsandine. Lê teşeyê tevên kilamên wî ne yek e. Carinan, di heman kilamê de hejmara kiteyan diguhere lê bi piranî hejmara kiteyan hev digire. Dîsa tê dîtin ku hinek kilam ne çarmalk in, hejmara hevokên bendan diguhere.

Di kilamên Sîzer de herî zêde hevokên 11 kiteyî hatine bikaranîn, hevokên 7, 8, 9, 10, 11 û 12 kiteyî jî hatine bikaranîn. Lê carinan di yek helbestê de jî hejmara kiteyan diguhere. Tevna beşavendê di tevên çarmalkan de ne bi şiklekî ye. Beşavenda rast, "aaab, cccb, dddb" beşavenda çeprast, "abab, cbcb, dbdb" beşavenda pêçayî, "abba, cbbc, dbbd" hatine bikaranîn. Lê herî zêde ji beşavenda rast sûd hatiye wergirtin. Divê were gotin ku carinan di seranserê kilamekê de heman tevna beşavendê nayê dîtin û tevn diguhere.

Hatibû îfadekirin ku kilamên Sîzer bi gelemperî ji çarmalkan pêk hatine. Lê ev rewş di tevên kilaman de nayê dîtin. Di hinek kilaman de bendên pênc, heft, heşt hevokî jî hene. Carinan dîsgotinên kilaman bi bendên beriya xwe de hatine gotin û carinan dîsgotin bi serê xwe hatine gotin. Di seranserê hinek kilaman de hejmara hevokên bendan weke hev e lê belê di hinek kilaman de hejmara hevokan bend bi bend diguhere. Di tevên kilaman de hevsengî nîne.

Piraniya kilamên Sîzer bi redîf in. Beriya redîfan beşavenda nîvco, beşavenda timam û beşavenda zengîn hatine bikaranîn. Di dawiya gelek hevokan de heman deng hatine dubarekirin.

Di kilaman de bi piranî hewla ku hevsengiyek were avakirin tê dîtin. Kilamên ku seranser bi çarmalkan û heman tevna beşavendê hatine nivîsîn hene, herwiha

kilamên ku him hejmara bendan him jî tevna beşavendê cuda ne jî hene. Bi piranî dîsgotinan hevsengiya kilaman xera kirine. Carinan hejmara kiteyên dîsgotinan li hejmara kiteyên hevokên din nayê, carinan jî dîsgotin hejmara bendan diguherin. Sîzer, di benda dawî ya tevên kilaman de mexlesa xwe, Sêcan, bi kar aniye. Ev taybetiyeke wêjeya klasîk e.

Naveroka kilamên Sîzer, bi gelemperî baweriya Elewîtiyê û civaka Elewî ye. Pesindayîna civaka Elewî, zehmetiyên ku vê civakê dîtine, sedemên zextên li ser civakê di kilaman de cihê xwe girtine. Taybetiyên civaka Elewî di gelekên kilaman de hatine zimên. Di kilaman de xwiya dike ku di civaka Elewî de "ezîtî" nîne "embûn" heye. Ferdê Elewî li berjewendiyên xwe nafikire, berjewendiyên civakê derdixe pêş. Dîsa çawaniya rê, girîngiya rê û zehmetiya rê di kilaman de tê dîtin. Mezin û pêşengên civakê, pesindayîna wan, derhozeyên wan jî di kilaman de hatine îfadekirin. Dîsa cihên girîng ên weke gund, tirbe û ziyaretan jî di kilaman de xwiya dikin. Tiştên weke îqrardayînê, diwazdeh îmaman, çar enasiran, Elî, Hesen, Hiseyn, Fatîme ku di baweriya Elewîtiyê de girîng in di kilamên Sîzer de gelek caran têne dîtin. Qala navê Qizilbaşiyê û bê ma ev nav ji kengî ve heye, hatiye kirin.

Di kilamên Sîzer de gelek caran navên jinên weke Fatma, Xetîce, Zelîxa, Kîbele, Zeyneb û Elîf Anayê derbas dibin. Hîn wextê ku dinya nebûye Fatma hebûye; wextê sifyana Nûh, Hacerê û Sehrayê bi Mûsa re pez dohtine; Zelîxayê, agirê Nemrûd vemirandiye; Xetîceyê, Muhemed reng reng xemilandiye; Zeynebê, erd û ezman tev helandine. Kilama bi navê "Jin û Cîhan" bi taybetî li ser rol û girîngiya jinê hatiye nivîsîn. Li gorî kilamê hîn ji wextê ku dinya nebûye ve jin heye û di gelek bûyerên dîrokî de jin xwedanrol e.

Piştî baweriya Elewîtiyê û civaka Elewî, mijara ku herî zêde derdikeve ber çavan mijara koçê û mihaciriyê ye. Sîzer, naçar maye ku ji welatê xwe koç bike. Dilê wî bi jiyana xerîbiyê ne xweş e, ev koça mecbûrî, jiyana li xerîbiyê û hesreta welêt di gelek kilamên wî de xwiya ne. Kifş dibe ku ji jiyana xwe ya beriya koçberiyê xweş e lê piştî koçberiyê şertên wî guherîne û bêriya jiyana xwe yî berê dike. Dîsa

xeyn ji koçberî û mihaciriya şexsê wî koçberiya civaka wî jî di kilamên wî de cih digire. Îfade dike ku civaka wî ji ber zextan û çewisandinê, naçar maye ku tim koç bike. Carinan kul û gazinên xwe yên ji derdor û hevalên xwe bi rêya kilaman anîne zimên û herwiha kêfxweşî û dilşahiyên xwe jî bi rêya kilaman îfade kirine. Lê çi gazin, çi kêfxweşî be hema bêje di tevên kilamên wî de şopên baweriya Elewîtiyê têne dîtin. Wextê ku kul û gazin têne îfadekirin hewara xwe dibe pêşengên baweriyê û kesên pîroz, wextê ku dilşahî û kêfxweşî dibine mijar spasiya van kesên pîroz û pêşeng dike. Qala baweriyê di kilamên wî yî berê de zêdetir xwiya dike lê piştî çûna xerîbiyê mijarên koçberî û hesreta welêt zêdetir derdikevine pêş.

Sîzer, tevên kilamên xwe bi devoka Semsûrê nivîsandine û gotine, zimanê kilamên wî zimanê civakê û jiyana rojane ye. Him bilêvkirina peyvan him jî peyvên heyî ti carî neguherîne, bilêvkirina herêmî û bikaranîna peyvên herêmî tercîh kirine. Kîjan peyv di nava gel de hebe ew peyv bi şiklê ku heye bi kar aniye, hinek peyvên ku ji zimanên din derbasî Kurmanciya Semsûrê bûne bi heman awayî bi kar anîne. Ji dêlva van peyvan ve Kurmanciya wan tercîh nekiriye. Weke mînak peyvên: “bîlligî (yekîtî), eysan (mirov), solix (hilm), gurûh (kom), cemal (xweşikahî), dutsax (dîl) û hwd.

Ev tercîha Sîzer a ku kilamên xwe bi devoka Semsûrê distrê, ji bo kesên ku dûrî devoka Semsûrê bin ku di serî de têgihiştina kilaman hinekî zehmet bike jî wextê ku guhê mirov hînî vegotina wî dibe, zimanê wî bi hêsanî tê fêhmkirin. Zimanekî herikbar e, guhdar û xwîner bi peyvên zêde mecaz û yên ku nayêne fêhmkirin re rûbirû namînin, herwiha peyvên çêkirî jî di nava kilamên wî de peyde nabin. Herçiqasî ku zimanê Sîzer hêsan û herikbar be jî di gelekên kilaman de wateyên kûr hene, bûyer û rûdanên dîrokî yan jî girîng rasterast negotine lê ew anîne hişê însên. Weke mînak di kilama bi navê Belgesela Goçeran de gotiye “Êk destê me li hev bike/ Li her du dinya î bê av e” li vê derê Sîzer bûyera Kerbelayê tîne bîra însên.

Guherîna dengê “b” û “w”yê ya ku li herêma Semsûrê tê dîtin di kilamên Sîzer de jî bi heman awayî xwiya dike. Ji dêlva “xeber”ê ve “xewer”, ji dêlva “xerîb” ve xerîw”, ji dêlva “rabim” ve rawim”, ji dêlva “nebîne” ve “newîne” ji dêlva “hebû” ve “hewû”, ji dêlva “sibe” ve “siwe”, ji dêlva “mekteb”ê ve “mektew” û hwd. Dîsa guherîna “ji” û “li”yê di kilaman de kifş e. “Me li hev îna kir/ Li me ra anîne/ Li me ra bûn şewq/ Ez aciz bûm li canî” û hwd.

Di kilaman de rêzikên gramerê yên weke ergatîviyê û tewangê pir baş hatine parastin. Carinan tê dîtin ku ji bo pîvana kiteyan hinek bêje hatine kurtkirin. Weke mînak: Êk nizane bê kanî gul kî ye (Êk nizane: Yê ku nizane) û hwd.

3. DI KILAMÊN ELÎ SÎZER DE RENGVEDANA ELEWÎTIYÊ

Di beşên jorî de agahiyên li ser Elewîtiyê hatine dayîn û kilamên Sîzer hatine nivîsîn. Piştî van agahiyan dê tesbîtkirina rengvedana Elewîtiyê ya di kilamên Sîzer de hêsantir bibe. Dê di vê beşê de têgeh, kes û kevneşopiyên Elewîtiyê yên di kilamên Sîzer de bêne tesbîtkirin û dê agahiyên li ser van mijaran bêne dayîn lê beriya van tiştan ku em nêrînên Elî Sîzer ên li ser Elewîtiyê zanibin dê îmkana berawirdkirina nêrînên wî û kilamên wî bi destên me bikeve.

3.1. Bi Nêrîna Elî Sîzer Elewîtî[1]

Agahiyên ku di bin vî serenavî de hatine dayîn hemû nêrînên Elî Sîzêr ên di heqê Elewîtiyê de ne. Ev agahî ji hevpeyvîna ku me bi Sîzer re kiriye -08.08.2019, gundê Çeqelê, Semsûr- hatine bidestxistin. Me nêrînên Sîzer ne bi hevokên wî anîne zimên lê me qet mudaxeleyî naveroka hevokên wî nekiriye, bi tevahî fikr û nêrînên Sîzer hatine îfadekirin.

3.1.1. Elewîtî: Nav-Bawerî

Sîzer dibêje ku mijara nav ji bo wan ne mijareke gelekî girîng e. Baweriya wan baweriyeke kevnar e û navê wan gelek caran guheriye. Lê ew, navê Elewî qet bi kar nayîne, dibêje ku ev navekî nû û çêkirî ye. Navê Qizilbaş rasttir e.

Bi baweriya Sîzer, kaînatê xwe ava kiriye, xwedayekî ku kaînat çêkiriye nîne. Kaînatê şeş rojan xwe peyde kiriye, roja heftan bi dengê "hu" timam bûye. Gotina hu emrê çêbûna kaînatê ye. Bi gotina "hu"yê kâinat ava bûye. Herwiha baweriya ku mirov ji Adêm û Hewayê hatine jî li cem Sîzer diguhere. Ew dibêje ku ew, ne

[1] Elî Sîzer, *Hevpeyvîn*, Gundê Çeqelê-Semsûr, 08.08.2019.

ji Adêm û Hewayê hatine, ew ji Şît û Naciyeyê ne. Wextê Şît û Naciyeyê, ti şer nebû lê roja ku Adem çêbû şer dest pê kir. Ji Adêm û vir ve şer e.

Li gorî Sîzer, Qizilbaşî ojdan e, heqîqet e, ax e, av e, erd e, ezman e. Her tiştî bi Qizilbaşiyê dest pê kiriye, mirov çûne û hatine, pirtûkên pîroz çûne û hatine, pêxember çûne û hatine xwe di nava Qizilbaşiyê de veşartine. Rêya Qizilbaşiyê rêyeke bêkemasî ye, tiştên şaş û xelet tê de nînin. Mirov bi qisûr û kêmasî ne lê di rêyê de kêm û kêmasî nînin. Rêya Qizilbaşiyê durûtiyê qebûl nake, rê înkariyê qebûl nake, rê tiştekî bê ked qebûl nake, tiştekî ku ne bi keda te be heram e. Qizilbaşî bi şêweyê jiyanê ye, ne bi dêv e, ne bi gotinê ye. Bi rabûn rûniştin, fikir, û tevgeran e. Divê firêzeya însên paqij be. Divabe ferdê Qizilbaş, berê neynikê bide xwe û berê xwe nas bike. Heta ku xwe nas neke nikare rêya Qizilbaşiyê biajone. Qizilbaş ti carî tiştekî înkar nakin, lê ji rêya Heq û cemala însên venaqetin. Di Qizilbaşiyê de mirov, ne weke Qizilbaş tê dinê, bi kirinên xwe dibe Qizilbaş. Qizilbaşî ne tiştekî ku ji zikmakî ve tê ye. Ku kesek bi kirinên xwe ne di rêya Qizilbaşiyê de be bi gotinê û bi malbatê nabe Qizilbaş.

3.1.2. Mirin, Hizra Axretê, Perwaz

Li gorî Sîzer, di baweriya Qizilbaşiyê de mirin nîne, bi tenê laş diçe. Dibêje ku ew ji mirinê bawer nakin, ji mirinê re dibêjin çûnûhatin, laşê mirov dimire lê rih namire, perwazê dike. Ew, hizra reenkarnasyonê bi şiklên "çûnûhatin, kirasguherîn, perwaz"ê îfade dike. Li gorî baweriya wî rih namire dîsa tê, wê tim û tim were. Mirovên kamil dê dîsa bi şiklê mirovên kamil werin. Bes navê wan diguhere, mirov kirasê xwe diguherin. Dibêje ku ev bawerî di nava civaka wan de berê zindî bûye û wextê ku hinekan tiştên nelirê dikirin digotin "Tu bi qurbana rihê xwe bî." Anku rihê wî/wê yê berê û yê niha ne weke hev in, ev mirov neçê bûye. Sîzer, dibêje ku berê yên ku diçûn û dihatin/perwaz dikirin/kirasê xwe diguhertin hebûn û wan ew kes didîtin lê niha yên ku diçin û tên xwe kifş nakin. Bawer dikin ku Apê Şikrî -vêga li gundê Çeqelê yê Semsûrê dijî- yek ji wan kesan e ku perwaz kiriye û niha dijî lê ew jî xwe hişkere nake. Fikra reenkarnasyonê ji bo Qizilbaşiyê hîmekî bingehîn e, dema ku tu Qizilbaş bî divê tu ji reenkarnasyonê bawer bikî. Qizilbaş ti carî ji mirinê bawer nakin. Tunehî nîne, çûnûhatin heye dê Qizilbaş herin û werin. Wextê ku tu tiştên çê bikî rihê te derbasî mirovekî kamiltir dibe lê wextê ku tu tiştên neçê bikî rihê te derbasî heyîneke/î xerabtir dibe. Wê her kes here ser para xwe. Ji ber ku ji bo wan dinyaya din nîne mirov wextê ku careke din tê, li gorî kirinên berê di rihekî çê/neçê de peyde dibe. Li gorî hinek angaştan rih hezar û carekê perwaz dike lê Sîzer vê yekê qebûl nake, dibêje ku sînor ji perwazê re nîne.

Herwiha, di Qizilbaşiyê de fikra axretê nîne, dojeh û bihişt nînin. Dojeh, wechê însên ê tirş e. Bihişt, dilşahiya mirov e, bi gotina Sîzer "Ku min tu dîtî dilê min şa bû ev bihişt e". Anku dojeh jî bihişt jî di dilê însên de ne. Baweriyeke ku dê bimirin û li gorî kirinên xwe werine cezakirin/xelatkirin nîne. Tiştekî ku pîroz be û mirov bibe bihiştê nîne, dinyaya din nîne. Sîzer dibêje "Jixwe em di cinetê de bûn lê cineta me li serê me kirin dojeh." Li gorî Sîzer pergala bihişt/dojehê pergala hepiskirina însên e. Misilman dibêjin ku li bihiştê şerab di çêm re tê, lê li vir heram e. Ev yek dûrî aqilan e û divê Misilman baweriya xwe tevlî baweriya

wan nekin. Herwiha, baweriyên din dibêjin dê ferişteh li wê dinê îfadeya we bigirin. Qizilbaş li vê dinê vî karî dikin. Ti eleqeya wan bi dinyaya din re nîne. Ew li vê derê hisêb didine hev û li vê dinê li tawanên xwe mikur tên.

Herçend ku hizra mirinê li cem wan nebe jî carinan tê dîtin ku ji bo kesên Elewî jî telqîna miriyan tê xwendin. Sîzer dibêje ku ev tişt ji bavê xwe pirsiye û bavê wî gotiye ku tiştekî wilo ti carî li cem wan nebûye, ji tirsa ku "Emewî" newin serê wan jê nekin wan jî ev tişt kirine.

3.1.3. Îbadet

Li gorî Sîzer, di Qizilbaşiyê de îbadetên şiklî nînin. Wextê ku heval û cîranên însên bûne mêvanê mirov îbadeta mezin ew e. Ji bo îbadetan cihekî diyar, demeke diyar û qibleyeke diyar nîne. Mirov berê xwe bide ku dere, qibleya mirovî ew der e. Îbadet li her derê dibe, li binê darekê jî dibe li zinarekî jî dibe. Misilman diçine mizgeftê, Mesihî diçine dêrê lê cihên ku ji ber wan dimînin tev cihên îbadetê ne ji bo Qizilbaşan. Herçend ku ji bo îbadeta Qizilbaşan şûneke kifş nebe jî bi taybetî piştî salên hefteyî ayînên wan zêdetir li demxaneyan/cemxaneyan têne lidarxistin. Navê demxaneyan berê mezilgeh bûye. Di îbadeta wan de tiştê bingehîn ev e ku mirov ewil, layiqî rêyê be û xwe ji neçêyiyên dinê dûr bike. Wextê ku di dema muhabetê de çerx dibin jî kefa destê xwe yê rastê li himberî rûyê xwe weke neynikê digirin û berê kefa destê xwe yê çepê didine pişta xwe, bi wateya " Em ê ji Heq hilgirin, li milet par bikin" wateyeke din jî ev e ku dibêjin "Em ê berê neynikê bidine xwe û berê, qisûrên xwe bibînin." Anku armanca sereke ya îbadetê paqijbûna însên e.

3.1.4. Xweda-Pêxember-Quran

Şîroveya Xwedê di Elewîtiyê de ne weke dînên mîna Îslamê û Mesîhîtiyê ye. Li gorî Sîzer, Xweda ojdanê mirovan e. Xweda bi mirovan re rûdine, dixwe, vedixwe, civatê dike. Ne tiştekî ku em nikarin bigihinê ye. Sîzer dibêje:

“Xwedayê me ojdanê me ye. Dema ku mirov cemala hevalê xwe dibîne Xwedayê xwe dibîne.”

Sîzer îfade dike ku Muhemed di baweriya wan de heye lê ne bi şiklê Îslamê ye. Wextê ku Muhemed hatiye nava cimeta çilan û gotiye ez pêxember im ew nehewandine encix wextê ku gotiye ez xizmetkar im ew qebûlî nava xwe kirine. Meseleya ku dibêjin pêxember çûye mîracê ne karê aqilan e. Mîrac, dilê însên e.

Li gorî Sîzer, tevên dîn û pirtûkan ji Qizilbaşiyê peyde bûne. Qizilbaşî ji ti dîn û kitêban çênebûye, ew ji Qizilbaşiyê çêbûne û jê veqetiyane. Destpêka tevan Qizilbaşî ye. Tevên rengan û kitêban di Qizilbaşiyê de peyde dibin. Li ser navê Pêxember bi hezaran pirtûk û şitexalî çêkirine dibêjin ev hedîsên Pêxember in. Pêxember di nava şer û pêvçûnan de bû, ne pêkan e ku wilqas tiştan bibêje. Qurana Qizilbaşan tembûr e, Quran ji bo Misilmanan çi be kilam û tembûr ji bo Qizilbaşan ew in. Tembûr, Qurana bitêl e. Qizilbaş, qedir didine çar pirtûkan jî, mezinên wan gotine her kitêbê bixwînin lê ji rêya mirovên kamil vemeqetin, kitêba wan mirov e. Mirov, nîşaneya Xwedê ye. Zebûr, Tewrat, Încîl, Quran ji bo Qizilbaşan yek in. Rêzê ji wan re digirin. Rêzdayîna Quranê jî heye lê ne girêdayiyê bi wê ve ne. Sîzer îfade dike ku Quran berê di nava wan de kêm hebûye. Dibêje hinek kesan dixwendin lê ew ji xwe re nedikirin rêber. Nedigotin gotina Xwedê ye. Yasîn jî dixwendin lê ji xwe re dixwendin, ne li pêşiya xelkê. Ji xwe re ji bo ku pê zanibin dixwendin. Îro Quranê ji tirsan dixine malên xwe. Ji tirsa ku wan nefî nekin, wan nekujin Quran xistine malên xwe. Da meyzînin ku Quran li malên wan jî hene û bela xwe ji wan vekin. Hebûna Quranê ne ji ber baweriyê ye, ji tirsa îqtidarê ye.

3.1.5. Kevneşopiyên Girîng

Sîzer dibêje ku di Qizilbaşiyê de yek ji kevneşopiyên herî girîng kevneşopiya destbiraktiyê ye, ev kevneşopî bi şiklê misawtiyê jî tê îfadekirin. Du malbat ji hev re dibine birayên axretê. Ev malbat, salê carekê li hizûra pîrê xwe îqrarê didine hev. Dikevine bin kirasekî û dibêjin çar can bûn canek. Li hizûra hev soz didin ku

dê heta salekê li ser îqrara xwe bimînin. Sala ku tê dîsa bi heman awayî îqrara xwe didin. Divê destbirak ti tiştî ji hev veneşêrin, ku nan li mala destbirakê wan nebe divê nanê xwe li hev par bikin. Destbiraktî ji biratiyê pêşvetir e, mehra zarokên birayan li hev dibe lê ya zarokên destbirakan li hev nabe. Berê, hîn wextê dawetê xelkê, destbirak ji xwe re digirtin. Tiştên ku ji ti kesî re nayêne gotin ji destbirêk re têne gotin. Divê destbirak bi her tiştê hev zanibin. Destbiraktî bi şiklê malbatî pêk tê. Pîrê ku misaw îqrarê didinê, weke Xwedê tê dîtin, ew dîwana ku îqrar lê tê dayîn dîwana Heq e, pîr jî Xweda ye, Elî ye, Muhemed e. Kevneşopiyeke ku gelekî girîng e jî kirîvantî ye. Wextê ku kirîv sinet dibin pêşmalê/bervankê didine pêşiyê, dema ku xwîn diçilke ser ê ku bervankê zem dike dibêjin xwîna me bû yek, kirîv bi vê xwînê digihine hev û mehra zarokên kirîvan jî lev nabe. Li gorî Sîzer, ev kevneşopiyên weke misawîtî û kirîvantiyê bi çûna bajaran û fikra modernîteyê hêdî hêdî ji holê radibin.

Di Qizilbaşiyê de simbêl pîroz in. Berê, qusandina simbêlan nedihate qebûlkirin, lê niha bi taybetî di nava nifşên nû de ev kevneşopî hêdî hêdî kêm dibe. Di Qizilbaşiyê de ajelên weke quling, şêr û xezalê pîroz têne dîtin; xezal, jina mehsûm û mihaciriyê temsîl dike. Qizilbaş gelek caran xwe weke "Qewmê Mihaciran" bi nav dikin û ji bo jinên ku li mihaciriyê hatine kuştin dibêjin: "*Xezala mala bavê min, anîn bi tivingan bi kuçikan kuştin."* Wextê ku li Kerbelayê qetlîam çêbûye quling çûyê ser cenazeyên wan, bi perên xwe ji wan re sih çêkiriye, ji ber vê yekê quling li cem Qizilbaşan pîroz tê dîtin û dibêjin qewmê Qizilbaşiyê mîna qulîng e. Şêr jî xwedanê cihekî taybet e, ha nêr bûye ha mê bûye şêr, şêr e û şêr weke temsîla hêzdarbûnê tê dîtin. Carinan tê angaştkirin ku kîroşk li cem Elewiyan bêyom tê dîtin. Lê Sîzer van angaştan qebûl nake, dibêje ti ajela ku heram an jî bêqidoş be nîne. Em tevên ajelan diparêzin. Çi zindî çi ne zindî em tiştekî ji hev venaqetînin. Xwarinên ku heram bin jî nînin. Tiştê heram ew e ku keda we tê de nebe û hûn bixwin.

Di Qizilbaşiyê de pergaleke civakî heye, kesê ku nû dikevê rêyê û îqrarê dide talib e, piştî talib li gorî astê; rêber, pîr û murşîd tên. Di vê pergalê de kes ji hev

biqedirtir û payebilindtir nayê dîtin. Ev pile, ji bo ku rê wenda nebe û pêdiviyên rêyê bi cih werin hene. Lê ev pilê ferqê naxine navbera endamên Qizilbaşiyê. Pile nînin, pileya tevan weke hev e, kes ji kesî ne balatir û ne nizimtir e. Talib dikare bi hêsanî şaşî û kêmasiyên pîrê xwe jê re bibêje. Xeyn ji van meqaman "meqamê dîwane" heye, hinek dibêjin şêx, hinek dibêjin sofî. Mijara qurbanê mijareke bi nîqaş e, Sîzer dibêje ku kurban ne kahr e û ne berx e. Divê can bibe qurban, divê mirov xwe bike qurbanê rêyê. Dibêje ku ew tiştekî ser jê nakin bes nefsa xwe dikujin, nefsa zalim ser jê dikin.

3.1.6. Jin

Sîzer îfade dike ku di Qizilbaşiyê de ferqa jinan û mêran nîne. Dîbêje ku ew, ti carî ti kesî jev venaqetînin û ti cudahiya bi şiklê jin-mêr nîne. Ji bo wan, her kes can e, bes can hene û ji berê ve di nava wan de jin û mêr jev ne cihê ne, ti carî nedigotin jin û mêr, xizmet hebû çi hebû giş bi hev re bû. Li gel ku ferqa jinan û mêran nîne jî jin xwedan cihekî taybettir in. Xweda mîna jinan e, jin kaînat e. Hîn di cimeta çilan de hevdeh heb jin hene.

Herwiha, di Qizilbaşiyê de pirzewacî nîne, dibêjin heval yek e, pirên qulingan jî piştî ku hevalên wan dimirin xwe dikujin. Sîzer dibêje di şerîeta Îslamê de pirjinî heye, çend zewac kirine ne karê me ye, deh caran dizewice not carî dizewice ev ne karê me ye ev şerîeta wan e, ji bo me pirzewacî ne rast e. Pirzewacî ne exlaqê me ye û ne rêya me ye.

3.2.**Di Kilamên Elî Sîzer de Kesên Dîrokî**

3.2.1. Baba Tahir

Baba Tahirê Uryan an jî Hemedanî, sedsala dehan li Hemedanê hatiye dinê. Weke yekemîn helbestvanê Kurd tê qebûlkirin. Pêşengekî terîqeta Ehlê Heq e.[1] Yek ji heft pêşengên Yarsantiyê ye û hinek helbestên wî di pirtûka pîroz a Yarsanan –

[1] Nevin Güngör Reşan, *Navdarên Kurd*, DOZ Yayınları, İstanbul, 2008, r.16.

Serencam- de cih digirin.[2] Bi dubeytiyên xwe navdar e û dubeytiyên wî di berhema wî ya bi navê "Dubeytî" de hatine berhevkirin. Kesê ku cara ewil bernavkê Qelender bi kar aniye ew e. Ew û Îbnî Sîna -Îbnî Sîna, sala 1037an li Hemedanê çûye ser dilovaniya xwe- hevçaxê hev in.[3] Sîzer, di kilama "Sewda" de cih daye Baba Tahir û îfade kiriye ku Baba Tahir ji wan re bûye nûr: *Baba Tahîr, Baba Mansûr/ Ew li dilê me bûne nûr.*

3.2.2. Baba Mansûr

Baba Mansûr, îro di nava Elewiyan de gelekî tê naskirin. Yek ji mezinên baweriyê yên li Dêrsîmê ye û ocaxa wî heye. Tê bawerkirin ku mirovekî xwedanderhoze bûye. Sala 1145an li Erziromê hatiye dinê, kurê Seyîd Muhemed Saltuk e. Ji binyata îmamê pêncan, Muhemed Baqir tê. Bavê wî ew şandiye Xoresanê.[4] Ji Xoresanê hatiye Erzînganê û ji wir jî çûyê Mazgêrdê û li wê de rê cîwar bûye.[5] Piştî ku vegeriyaye Mazgêrdê Silêman Şah artêşek şandiye da ku wî bikujin lê ew reviyaye gundê Muxinduyê û ji destê artêşa Selçukiyan filitiye.[6] Li gundê Muxinduyê -gundekî Mazgêrdê ye- hêtek heye, tê bawerkirin ku Baba Mansûr ev hêt bi rê ve biriye û ev der ji bo Elewiyên wê herêmê ziyareteke girîng e.[7] Birêvebirina keviran û hêtan û herwiha siwarbûna li ajelên berî di nava Elewiyan de gelek caran weke derhozeyên kesên kamil derdikevine pêş. Li gorî efsaneyê rojekê Baba Mansûr xaniyek lê dikir. Seyîd Hecî Qureyş li hirçekê siwar û bi şiklê ku marekî xwe li zenda wî pêçaye hatiye serdana wî. Mêvên ji mazulvên xwestiye ku ew jî derhozeyekê nîşan bide. Li ser vê yekê Baba Mansûr hêtê xênî bi rê ve

[2] Arik, *Alevilik ve Tarihi*, Dara Yayınları, İstanbul, 2019, r139.
[3] Ahmet Yaşar Ocak, *Osmanlı İmparatorluğu'nda Marjinal Sûfîlik: Kalenderîler*, Türk Tarih Kurumu Basımevi, Ankara, 1999, rr. 18-19.
[4] Hiroki Wakamatsu, "Veneration of the Sacred or Regeneration of the Religious: An Analysis of Saints and the Popular Beliefs of Kurdish Alevis", *The Journal of Sophia Asian Studies No.31(2013),* r.74.
[5] Nihat; Vural, "Baba Mansur ve Baba Mansur Ocağı"https://www.cemhaber.com/baba-mansur-ve-baba-mansur-ocagi.html (d.g. 26.04.2020).
[6] Wakamatsu, "Veneration of the Sacred or Regeneration of the Religious: An Analysis of Saints and the Popular Beliefs of Kurdish Alevis", rr. 74-75.
[7] Sadullah Gülten, "Baba Mansur'dan Şeyh Harun'a: Bir Blevi Ocağının Tarihsel Kökenine Dair Bazı Gözlemler", *Türk Kültürü ve Hecî Bektaş Velî Araştırma Dergisi* / 2012 / 63, r.141.

biriye.[8] Tê gotin ku çar kurên Baba Mansûr -Seyîd Mehmûd, Seyîd Qasim, Seyîd Brahîm û Seyîd Heyder- hene û di navbera kurên wî de têkiliya murşîd, pîr û rêber heye.[9] Behsa Baba Mansûr di kilama bi navê "Sewda" de hatiye kirin, Baba Mansûr li gel Baba Tahir ji wan re bûye nûr: *Baba Tahîr, Baba Mansûr/ Ew li dilê me bûne nûr.*

3.2.3. Xelacê Mensûr

Xelacê Mensûr, sala 857an li bajarokê Tûrê yê Îranê çêbûye. Tê gotin ku kalikê wî ji dînê Zerdeşt e. Piştî ku perwerdehiya tesewifê dît, ji bo ku rêya yêkbûna bi Xwedê re hînî mirovan bike li Xuzistanê axaftin kirin. Van axaftinan jê re gelek heval û herwiha gelek jî dijmin çêkirin. Piştî ku ew bi derewînbûnê tawanbar kirin çû Xoresanê. Li Bexdayê xwestiye ku di ber cimeta xwe de were qurbankirin, dijminên wî xwestine ku ew were idamkirin. Tê gotin ku gotiye "Enel Heq" anku "Ez Xweda me". Ew û alîgirên wî hatine girtin û bi neh sal heps hatine cezakirin. Piştre hatiye daleqandin, serê wî hatiye jêkirin û laşê wî hatiye şewitandin. Xweliya laşê wî ji minareyê avêtine çemê Dîcleyê.[10] Xelac, yek ji pêşengên tesewifê ye, fikrên wî ji sedsala nehan heta bi roja me hatine. Fikra "Enel Heq" derxistiya holê û berdêla vê fikrê bi canê xwe daye. Angaşta ku Xelac, ji ber têkiliya wî ya bi Karmatiyan re hatiye idamkirin heye -Karmatiyan li ber Ebasiyan serî hildane- herwiha angaşta ku vê yekê rast nabîne jî heye.[11]

Ev fikra ku Xwedê û mirov yek dibîne him di wêjeya tesawifê de him jî ji aliyê gelek nivîskarên modern ve îro jî tê parastin. "Di beşên Tewrat û Încîlê yên ku nehatine xerakirin de û bê îstîsna di her devera Quranê de Xweda û mirov di heman rêzê de têne bilêvkirin. Anku ne di ayetên ilmî de lê di tevên ayetên ku

[8] Wakamatsu, "Veneration of the Sacred or Regeneration of the Religious: An Analysis of Saints and the Popular Beliefs of Kurdish Alevis", r. 75.
[9] Aslı Büyükokutan Töret, "Mansur Baba Soyundan Gelen Bir Şifa Ocağı:Şah Papucu", *Türk Kültürü ve Hecî Bektaş Velî Araştırma Dergisi*, Kış 2019/hj. 92, r 130.
[10] Hallac-ı Mansur, *Tavasin "Enel Hak"*, wer. Yaşar Günenç, Yaba Yayınları, İstanbul, 2001, rr. 8-9.
[11] Salih Çift, "İlk Dönem Tasavvuf Düşüncesinde Nûr Kavramı", *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Cilt: 13, Sayı: 1, 2004, rr.143-144.

mijarên civakî, polîtîk û aborî rave dikin de ku ji dêlva peyva en-nas ve Allah û ji dêlva peyva Allah ve en-nas were nivîsîn wateya hevokê qet naguhere. Weke mînak ayeta 'Kî deynekî xweşik bide Xwedê…' ne tê wateya ku pêdiviya Xwedê heye ku mirov deyn bidinê; tê wateya yên ku deyn bidine mirovan". Di tevên ayet û hedîsên civakî û yên ku rexekî wan î civakî heye de Xweda û mirov di rêzekê de cih digirin.[12] Sîzer, di kilama "Sewda" de îfade kiriye ku Nesîmî, ji bo dara Mensûr hatiye serjêkirin: *Sewa xatrê dara Mansûr/ Nesîmî ki post hat guranê.*

3.2.4. Nesîmî

Dawiya sedsala çardehan, destpêka sedsala pazdehan hatiye dinê. Baş nayê zanîn bê ji ku derê ye, dibe ku ji Bexda, Şîrvan, Şîraz, Amed an jî Tebrîzê be. Di kevneşopiya Elewî-Bektaşiyan de yek ji heft hozanên mezin tê hesibandin û weke şahê şehîdan tê binavkirin.[13] Dîwanake bi Azerî, yeke bi Farsî û yeke bi Erebî nivîsîne lê dîwana wî ya bi Erebî îro ne li ber destan e. Berhêmên wî mînakên herî baş yên lîrîk ên wê demê têne hesibandin. Nesîmî dibêje "Heke ku tu heyîneke Xwedayî bî xeyn ji heyîna xwe li Xwedê negere."[14] Nesîmî, gelekî di bin bandora ceryana Xurufîtiyê de maye û gelek bandor li derdora xwe kiriye. Fikrên wî ji aliyê dîndarên wê demê ve nehatine fêhmkirin. Li gorî fikrên wî mirov neynika Xwedê ye. Ji ber fikrên xwe hatiye tawanbarkirin û li ber çavên xelkê çermê wî hatiye gurandin. Ji ber fikra ku mirov xwiyakirina Xwedê ye ewil Xelacê Mensûr hatibû darvekirin. Ev fikir bi gotina "Enel Heq" hatiye sembolîzekirin. Heq, navek ji navên Xwedê ye, tê wateya "Ez Xweda me". Nesîmî jî weke Xelacê Mensûr bûye qurbanê heman hizran. Sîzer, di kilama "Sewda" de ev bûyera dîrokî bi bîr aniye û gotiye ku Nesîmî jî seba xatirê dara Mensûr hatiye guranê. Herwiha gotiye ku ji wan bawer kirine û serê xwe li rêya wan danîne: *Sewa xatrê dara Mansûr, Nesîmî ki post hat guranê/ Me îna kir îman anî serê xwe li rêya wan danî.*

[12] Ali Şeriati, *Dine Karşı Din*, İşaret Yayıncılık, İstanbul, 2013, r. 38.
[13] İlyas Kayaokay, "Klâsik Türk Şiirinde Bir Efsânevî Kahraman Olarak Seyyid Nesîmî", *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi* 19, İstanbul 2017, rr. 194-195.
[14] Hamid Mebmedzade, "Nesimi'nin Hayatı ve Farsça Divanı", wer. Turgut Karabey, http://www.turkiyatjournal.com/Makaleler/195437835_7.pdf, r. 67, (d.g. 07.05.2020).

3.2.5. Ebul Wefa

Sala 1035 an li Kusana Iraqê hatiye dinê. Navê wî yê rast Muhemed e, Kurdan navê Kakis lê kiribûn. Bernavê wî "Taca Arifan" e. Tirbeya wî yî li Iraqê sedsala sêzdehan binavûdeng bû. Hinek şîroveyên ku dibêjin Ebûl Wefa hewl daye ku Rafiziyan ji rêya wan vegerîne hene, herwiha şîroveyên ku wî weke kesekî ku li dijî Sunîtiyê ye jî nîşan didin hene. Tê gotin ku di civatên wî de jin jî hebûne. Xelîfeyê Ebasiyan weke ku wî tawanbar bike jê re şerab û tûtin şandiye û gotiye ji wan civatan re ev tişt lazim in. Derhozeyên wî hene, tiştên di meşkê de kirine rûn û hingiv, li derwêşan belav kirine; berf û pembû xistine zerikekê, agir xistiye nîvê wan û ew zerik ji şahê Ebasiyan re şandiye. Sala 1107an rehmet kiriye.[15] Di qadên bîrkarî û astronomiyê de alimekî gelekî mezin e û gelek îcadên wî hene.[16] Xeyn ji van qadan bi fiqih, tesewif, muzîk, zanistên fenî û wêjeyê re jî eleqedar bûye. Tê gotin ku dîwaneke wî heye lê dîwana wî ne li ber destan e, lê mecmûeyeke wî ya helbestan heye.[17] Sîzer, di kilama bi navê "Sewda" de qala alimbûna Ebul Wefa kiriye, ew weke "taca serê arifan" nîşan daye û xwe jê re kiriye heyran: *Dibim heyran Ebul Wefa/ Bû taca serê arifa.*

3.2.6. Baba Îshaq

Serhildana Babaiyan a ku sala 1240î li hemberî Selçukiyan rû daye bi rê ve biriye. Serhildana Baba Îshaq, serhildana herî mezin a li dijî Selçukiyan e. Baba Îshaq, hîmên cereyanên ewil ên dijsunî danîne.[18] Ji herêma Mêrdîn-Semsûrê ye.[19] Di serhildanên Babaiyan de xwedanê roleke girîng e. Piştî ku herêma Semsûr, Alduş û Kolikê bi dest xistiye serhildana wî bi awayekî fermî dest pê kiriye. Piştre Meletî û Amasya jî ji Selçukiyan standine û berê xwe daye Konyayê. Li bakurrojhilatê Kirşehîrê bi artêşa Selçukiyan re şer kirine û li wê derê hatiye

[15] Aksüt, *Mezopotamya'dan Anadolu'ya Alevi Erenlerin İlk Savaşı* (1240), rr.146-149.
[16] Cengiz Aydın, "Ebül-Wefa el-Bûzcanî", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi,* https://islamansiklopedisi.org.tr/ebul-vefa-el-buzcani, (d.g. 07.05.2020).
[17] Ahmet Akdağ, "Şeyh Ebu'l-Vefâ'nın Tasavvufî Bir Şiirine Cebbârzâde Mehmed Ârif Bey Tarafından Yapılan Şerh: Dâfi'u'z-Mulem Min Kulûbü'l-Ümem*", Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim Dergisi*, Sayı: 2/3 2013, rr.154-155.
[18] Bahattin Keleş, "Baba İshak İsyanı'nın Anadolu Selçuklu Tarihindeki Yeri ve Önemi", *F.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi* 23:1 (2018), r.75.
[19] Aksüt, *Mezopotamya'dan Anadolu'ya Alevi Erenlerin İlk Savaşı* (1240), rr. 66-69.

kuştin, 1240.[20] Rola wî di berbelavbûna Batinîtiye de gelek e. Di gelek lêkolînên ku li Tirkiyeyê hatine kirin de sedemên serhildana Baba Îshaq û serhildanên Babaiyan weke sedemên aborî têne nîşandan, rola hizrên Batinî û dijsunî tê piştguhkirin. Sîzer, di kilama bi navê "Sewda" de amaje pê kiriye ku Baba Îshaq li gel Baba Resûl li Semsûrê serî hildaye. Ji wan re bûne rêber, şewq û rê: *Baba Îshaq, Baba Resûl/ Serî rakirin li Semsûrê/ Ew bûne rêberê welî/ Ew li me ra bûn şewq û rê.*

3.2.7. Baba Resûl

Serhildanên Babaiyan ên sala 1240î bi navê serhildanên Baba Resûl jî têne binavkirin. Ne diyar e bê ma Baba Îshaq e yan Baba Îlyas e yan jî Dede Garkın e.[21] Li gorî hinek lêkolîneran Baba Resûl angaşt kiriye ku pêxember e, hinek lêkolîner jî van angaştan qebûl nakin.[22] Baba Resûl, xwe weke yekî dîndar nîşan daye, bêyî ku pereyan ji gundiyan bistîne şivantî kiriye, ti tişt ji ti kesî nesitandiye, çi bi dest xistibe ew xwariye, ji ajelan hez kiriye. Van tevgerên wî ew di çavên gundiyan de biqedr kiriye û gundiyan jê hez kiriye. Piştî ku di çavê xelkê de mezin bûye gelek mirîden wî çêbûne.[23] Li ser mirina wî angaştên cûrbicûr hene. Sîzer, di kilama bi navê "Sewda" de amaje pê kiriye ku Baba Resûl li gel Baba Îshaq li Semsûrê serî hildaye. Bûne rêber, ji wan re bûne şewq û rê: *Baba Îshaq, Baba Resûl/ Serî rakirin li Semsûrê/ Ew bûne rêberê welî/ Ew li me ra bûn şewq û rê.*

3.2.8. Şêx Bedredîn

Sala 1359an li gundê bi navê Sîmavnayê –li Yewnanîstanê ye- hatiye dinê. Bi bandora Hiseyn Exlatî berê xwe daye mîstîsîzmê. Li Îranê hizrên Batinî nas kirine. Du mirîden wî li Aydin û Manîsayê serî rakirin, ji ber ku serhildan bêwext bûn ew ji wê derê vekişiya. Li herêmên ku Elewî zêde ne ji bo birêxistina wan

[20] Ahmet Yaşar Ocak, "Baba İshak", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi,* https://islamansiklopedisi.org.tr/baba-ishak, (d.g. 07.05.2020).
[21] Aksüt, *Mezopotamya'dan Anadolu'ya Alevi Erenlerin İlk Savaşı* (1240), r. 129.
[22] *h.b.*, rr. 125-126.
[23] Bahattin Keleş, "Baba İshak İsyanı'nın Anadolu Selçuklu Tarihindeki Yeri ve Önemi", *F.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi* 23:1 (2018), rr. 81-82.

xebitiye. Hêzên Osmaniyan ew dîl girtine û sala 1420an daleqandine.[24] Wextê ku zarok e, perwerdehiya ilmî standiye paşê hêdî hêdî nêzî fikrên ortodoks bûye, serweriya Osmaniyan bi hêsanî qebûl nekiriye, diya wî berê Mesîhî bûye, dê jina wî û bûka wî jî Mesîhî bin û ew li cihekî ku Misilman kêmane ne û seraqet bi Mesîhiyan re di nava têkiliyê de ne hatiye dinê.[25] Sala 1416an li Dobrucayê hinek kes li dora xwe civandine û rasterast dest bi antîpropagandaya Osmaniyan kiriye, wextê ku hêzên Osmaniyan bi ser wan de girtine kesên li derdora wî bêyî ku bi wan re têbikoşin dev jê berdane û ew ketiye destê Osmaniyan.[26] Li gorî Şêx Bedredîn, mirov heyîna herî nêzîkî Xwedê ye û bi taybetiyên xwedayî xemiliye. Xweda ji tunehiyê naafirîne, destpêka afirînê nîne û bêdawî ye.[27] Berhema bi navê "Varîdat" –tê gotin ku berhema Şêx Bedredîn e- ji gotinên wî pêk tê. Ji ber ku tê de dev avêtiye rêveberiyê, ev berhem di dema Osmaniyan de bi dizî hatiye xwendin û heta îro hatiye. Ev berhem li ser fikra panteîzmê ava bûye. Li gorî vê berhemê tevê cîhanê rengvedan û neynika Xwedê ye, tevê cîhanê yek heyîn e û yek çavkaniya wê heye anku Xweda di her tiştî de ye.[28] Di kilama bi navê "Sewda" de navê Şêx Bedredîn derbas bûye û li gorî kilamê Pîr Sultan rihê xwe di Şêx Bedredîn de dîtiye: *Şêx Bedredîn û Çelebî/ Pîr Sultan ruhê xwa li wan dî.*

3.2.9. Pîr Sultan

Pîr Sultan, yek ji heft helbestvanên mezin ên Elewiyan tê qebûlkirin. Dema Şah Tahmasb jiyaye, sedsala şazdehan. Navê wî yê rast Heyder e. Li ser navê Safewiyan li dijî Osmaniyan serhildanek organîze kiriye. Xizir Paşa, ew daye girtin û li Sêwasê daye daleqandin.[29] Baş nayê zanîn bê gora wî li ku derê ye. Pîr

[24] Öz, *Osmanlı'da Alevi Ayaklanmaları*, rr.152-153.
[25] Michel Balivet, "Şeyh Bedrettin Tasavvuf ve İsyan", http://www.altinicizdiklerim.com/resimler/SeyhBedrettin_TasavvufveIsyan.pdf, rr. 6-9, (d.g., 07.05.2020).
[26] Ali Kozan, "İdeolojik Okumalardan Bilimsel Zemîne: İdeolojik Okumalardan Bilimsel Zemîne: Simavna Kadısıoğlu Şeyh Bedreddin İsyânı Simavna Kadısıoğlu Şeyh Bedreddin İsyânı", *İstem*, Yıl:7, Sayı:13, 2009, rr.184-185.
[27] Selahattin Ali Arik, *Alevilik ve Tarihi*., r. 246.
[28] Barış Çoban, "Şeyh Bedreddin Hareketinin Manisfestosu Olarak Varidat", https://www.researchgate.net/publication/331487311_Seyh_Bedreddin_Hareketinin_Manifestosu, (d.g., 08.05.2020).
[29] Gölpınarlı, *Pir Sultan Abdal Hayatı Sanatı Eserleri*, rr. 6-7.

Sultan, di demeke ku Osmanî û Safewî seraqet şer dikin de hatiye dinê û di helbestên wî de bi awayekî zelal kifş dibe ku alîgiriya Safewiyan kiriye.[30] Pîr Sultan, di hinek helbestên xwe de bang li gel kiriye ku heyfa îmaman hilînin û gel vexwendiye baweriya xwe.[31] Hay ji helbestvanên beriya xwe heye û teknîka wî ya helbestan bihêz e. Di tevên helbestên xwe de îdeolojiya xwe belav dike, carinan wilqasî ji mijarên dînî dûr dikeve ku mirov şaş dibe.[32] Herwiha Pîr Sultan bes ne helbestvanek bû, serê xwe bi mijarên civakî re êşandiye, di helbestên xwe de cih daye pirsgirêkên civakê û rêyên çareserkirina van pirsgirêkan û xwe bi civakê re kiriye yek.[33] Tê dîtin ku Pîr Sultan, wêje weke rêya belavkirina baweriya xwe dîtiye. Helbestên xwe bi zimanekî sivik, bi zimanê gel nivîsandine. Gelek bandora Pîr Sultan li ser civaka Elewî çêbûye, tê dîtin ku demên piştî wî jî hinek kesên ku bi navê wî têne naskirin hene. Ev dibe nîşaneya ku gelê Elewî her demê bo xwe Pîr Sultanek çêkiriye. Herwiha îro gelek kes helbestên wî dikine kilam û distirên. Sîzer, di kilama bi navê "Sewda" de behsa Pîr Sultan kiriye û aniye zimên ku Pîr Sultan rihê xwe di Şêx Bedredîn û Çelebî de dîtiye: *Şêx Bedredîn û Çelebî/ Pîr Sultan ruhê xwa li wan dî.*

3.2.10. Çelebî

Qelender Çelebî, ji binyata Hecî Bektaşî Welî ye û postnişînê wî ye. Sala 1527an li dijî Osmaniyan serî hildaye, Qanûnî Sultan Silêman naçar maye ku ji sefera Maceristanê vegere da ku serhildanê têk bibe. Serhildana Çelebî xwe dispêre baweriya Elewîtiye, alîgirên wî feqîr û hejar in. Serhildanê li Kirşehîrê dest pê kiriye û heta bi Sêwas û Mereşê berbelav bûye.[34] Çelebî dixwest ku di nava xelkê de wekhevî hebe, tade û caresî li kesekî nebe, mal û milk ne ji dewlemendan re be ji her kesî re be û terîqeta wî ji kesên ku girîngî nedidane wecîbeyên dînî pêk hatiye.[35] Ji ber ku Çelebî gel diparast û li lê xwedî derdiket, gel jê re gelekî rêz

[30] Salahaddin Bekki, "Pîr Sultan Abdal", http://turkoloji.cu.edu.tr/pdf/salahaddin_bekki_pir_sultan_abdal.pdf, (d.g., 08.05.2020).
[31] Asım Bezirci, *Pir Sultan*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2010, r.32.
[32] Gölpınarlı, *Pir Sultan Abdal Hayatı Sanatı Eserleri*, rr.16-17.
[33] Öz, *Osmanlı'da Alevi Ayaklanmaları*, r. 190.
[34] h.b., rr. 184-186.
[35] Akman, *Onaltıncı Asır Osmanlı Toplumunda Bellibaşlı Kızılbaş İsyanları*, r. 71.

digirt û gava ku dest bi serhildanê kir demildest sih hezar kes lev civiya.[36] Herçend ku Osmaniyan çend caran bi hêzên mezin êrişî hêzên Çelebî kiribin jî nekarîne ku serhildana wî têkbişikînin. Piştî ku tê derxistine ku Dulqadirî piştgiriyê didine serhildana Çelebî bi Dulqadiriyan re peyman çêkirine. Piştî ku Dulqadirî ji pey Çelebî vekişiyane hêza wî gelekî kêm bûye û Osmaniyan şiyane bi hêsanî zora wî bibin. Serê wî li çiyayê Nurheqê jê kirine û ji Îbrahîm Paşa re birine.[37] Navê Çelebî di kilama bi navê "Sewda" de derbas bûye. Sîzer di kilamê de aniye zimên ku Pîr Sultan, rihê xwe di Şêx Bedredîn û Çelebî de dîtiye: *Şêx Bedredîn û Çelebî/ Pîr Sultan ruhê xwa li wan dî.*

3.2.11. Seyîd Riza

Sala 1862yan li Dêrsimê hatiye dinê, kurê Seyîd Îbrahîm e. Malbata wî malbateke nasraw e. Piştî mirina bavê xwe cihê wî girtiye. Wextê serhildana Koçgiriyê telgrafa piştgiriyê şandiye ji serhildêran re. Yek ji pêşengên serhildana Dêrsimê ye, salên serhildanê li ser banga hikûmetê da ku hevdîtinan bi hikûmetê re bike daye rê, lê di rê de hatiye girtin.[38] Piştî ku serhildan têk çûye 18ê Mijdara 1938an hatiye daleqandin.[39] Nayê zanîn bê ma gora wî li ku derê ye. Dema serhildanê hewl daye ku eşîran bigihîne hev, gotiye dev ji neyartiya hev berdin em ê dijmin ji xaka xwe derxin û paşê dîsa hûn dikarin neyartiya hev bikin. Eşîr weke ku dilê wî dixwest negihane hev lê dîsa jî dev ji serhildana xwe bernedaye. Dewletê, gundên ku tevlî serhildanê bûne dane ber êgir, ji ber tundiya dewletê gelek eşîr ji pey Seyîd Riza vegeriyane û hêza wî kêm bûye.[40] Him wextê ku serhildana Dêrsimê berdewam dikir him jî piştî serhildanê dewleta Tirkiyeyê gelek komkujiyên mezin kirine. Seyîd Riza û hevalên wî bi xayintî girtine dîsa bi awayekî dijqanûnî ew bi dar vekirine. Ji ber rol û pêşengiya wî îro Seyîd Riza di nava Kurdan de bi taybetî di nava Kurdên Elewî de xwediyê cihekî taybet e. Herwiha Sîzer jî di kilamên

[36] Çetin Yetkin, *Başlangıçtan Atatürk'e Türk Halk Eylemleri ve Devrimler*, Ümit Yayıncılık, Ankara, 1996, r. 144.
[37] bnr. Akman, *Onaltıncı Asır Osmanlı Toplumunda Bellibaşlı Kızılbaş İsyanları*, rr. 73-75.
[38] Güngör Reşan, *Navdarên Kurd*, r. 72.
[39] İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 383.
[40] Tuğba Doğan, "Arşiv Belgelerine Göre 1937-1938 Dersim İsyani", *History Studies İnternational Journal of History*, Volume 4/1 2012, rr. 161-164.

xwe de cih daye Seyîd Riza. Li gorî kilama "Sewda" wextê ku Elîşêr derketiye meydanê Seyîd Riza li dar û dîwanê ye: *Elîşêr derket meydanê / Seyîd Riza li dar û dîwanê.* Di kilama "Sewda (2)" de îfade kiriye ku Seyîd Riza pîrê wî ye, rêya wan û sewdayê wan î şêrîn ji bo wan sermiyana Seyîd Riza ye: *Haylo haylo sewdao/ Çi î şîrîn î çi î şao/ Pîrê me pîrê pîra da/ Pîrê mi Seyîd Riza da/ Va li me ra sermiyan mao.*

3.2.12. Elîşêr

Elîşêr, sala 1882yan li Qoçgiriyê hatiye dinê. Hozan e û yek ji pêşengên serhildana Qoçgiriyê ye. Bi Zerîfe Xanimê re zewiciye û li ser zimanê Kurdî lêkolîn kirine. Elîşêr, sala 1914an ji bo serxwebûna Kurdistanê tevlî artêşa Rûsan dibe. Weke nûnerê herêma Sêwas, Meletî û Dêrsimê ji bo Kurdistaneke xweser xebatan bi rê ve dibe.[41] Piştî ku serhildana Qoçgiriyê têk çûye berê xwe daye Dêrsimê û li cem Seyîd Riza maye. Sala 1937an biraziyê wî û sîxurekî bi navê Zeynel bi xayîntî serê Elîşêr û Zerîfe Xanimê jê kirine û birine ji nûnerên dewletê re. Elîşêr, helbestên bi Tirkî û Kurmancî nivîsîne.[42] Gelek lêkolînerên Kurd serhildana Qoçgiriyê yek ji tevgerên herî micid û girîng ên li bakurê Kurdistanê yên destpêka sedsala bîstan dihesibînin.[43] Elîşêr, ji eşîra Hesenan e, di nava eşîrên Kurdan de gelekî biîtibar e ev îtibara xwe ji bo doza Kurdbûn û Kurdistanê bi kar aniye. Xwestiye ku eşîrên Dêrsim û Qoçgiriyê bigihîne hev û azadiya Kurdistanê ragihîne.[44] Elîşêr û hevjîna wî Zerîfe îro di nava Kurdan de sembol in. Zerîfe jî xwenda ye, şervan e û şêwirmenda Elîşêr e. Sîzer, di kilama bi navê "Sewda" de serhildana Qoçgiriyê bi bîr aniye û îfade kiriye wextê ku Elîşêr daketiye meydanê Seyîd Riza jî li dar û dîwanê bûye: *Elîşêr derket meydanê / Seyîd Riza li dar û dîwanê.*

[41] Güngör Reşan, *Navdarên Kurd*, r. 108.
[42] İIşık, *A'dan Z'ye Kürtler*, rr. 53-54.
[43] Faik Bulut, *Dersim Raporları*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2013, r.99.
[44] h.b., rr. 103-104.

3.3.Di Kilamên Elî Sîzer de Şopên Elewîtiyê

3.3.1. Perwaz

Weke ku di beşên berê de hatibû îfadekirin yek ji hîmên Qizilbaşiyê hizra perwazê ye. Ev hizra perwazê weke koça rih tê qebûlkirin. Li gorî vê fikre, mirin nîne, rih gelek caran di formên cuda cuda de peyde dibe. Hizra perwazê di kilamên Sîzer de gelek caran derbas bûye û wî hevokên: *"Nêçe hezar salan em li hev çex bûn/ Sed bîst çar hezar cara ruh perwaz kir/ Em veşirîn wana neçê fêhm kirin/ Bi vî sewdayî ketim çerxê/ Rêça te çex diwim ez wek perwana/Çexbûn ya te hatin ya te çûn ya te"* weke îfadeya hizra perwazê anîne zimên. Di van hevokan de bi awayekî zelal tê dîtin ku qala koça rih anku "perwaz-kirasguherîn-çûnûhatin"ê hatiye kirin û ev hîmê girîng ê Qizilbaşiyê di kilamên Sîzer de hatiye parastin.

3.3.2. Çil Derî Çar Meqam-Çar Enasir

Di Elewîtiyê de pergaleke ku mirovan dike evdê kamil heye, ev pergal ji çar pêngavan pêk tê. Ev pergal, weke "çar deriyan" hatiye binavkirin: Şerîet, terîqet, merîfet, heqîqet. Ji bo ku her pêngavek ji van bi cih bê 14 şert hene.[45] Dîsa li gorî baweriya Elewîtiyê mirov ji çar hêmanan pêk hatiye. Ev hêman: av, ax, ar û ba ne. Sîzer her hêmanekê ji van bi deriyekî re têkildar dike û di kilamên xwe de gelek caran cih daye vê pergalê. Ev bawerî di kilamên Sîzer de bi hevokên: "*Li çar derî çel meqamî-Pîrê pîran miqam danî/ Li şerîetê bûnî rêber/ Ketnî deryê marîfetê/ Husên xwadyê şefaetê/Çar anasir bûn çar derî/ Çel meqamî bi xewer î/ Çar anasir kirin hevîr histiran / Navkî xwa ba û ax, navkî xwa ar û av/ Çar derî Heq gotin delîl vêxistin/ Em jî henî li şerîetê-Rûdinînî bi merîfetê/ Merîfet li herd cîhana bû siltan"* hatiye îfadekirin.

3.3.3. Dîrok-Destpêk

Di beşa ewil de li ser dîrok û destpêka Elewîtiyê gelek nêrînên ciyawaz hatibûne dayîn. Sîzer, berovajiyê van angaştan, Elewîtiyê bi destpêka gerdûnê re dide

[45] Yaşar Uçar, "Reenkarnasyon ve İslam", *Cem 65* (Nisan 1997): 71, rr. 68-69.

destpêkirin. Li gorî wî, hîn wextê ku gerdûnê şikil negirtiye Elewîtî hebûye. Elewîtî ji ti dînan cuda nebûye tevên dînan ji Elewîtiyê peyde bûne. Ev nêrînên Sîzer di kilamên wî de jî bi awayekî zelal hatine zimên. Hevokên weke: *"Di qal û bela da em ê bi tev bûn/ Erd û ezman tunebû em hebûn/ Di qal û bela da hîmê wê (rêka heqîqetê/Qizilbaşî) danîne/ Wextak erd gî av bû ezman dûman bû- Di navbera wir de xanek çêdibû-Li nav wê xanê jî Fatma mîvan bû"* îfadeya fikrên Sîzer ên di heqê destpêka Qizilbaşiyê de ne.

3.3.4. Elî

Têkiliya Elî û Elewîtiyê, di baweriya Elewîtiyê de cihê Elî û mijarên din ên bi Elî re têkildar mijarên gelekî nîqaşbir in. Nîqaşên li ser van mijaran û nêrînên cuda yên di heqê van mijaran de di beşa ewil de hatibûne îfadekirin. Elî, di kilamên Sîzer de gelek caran derbas dibe. Lê belê Eliyê ku di kilamên Sîzer de ye ne weke Eliyê ku xelîfeyê Muhemed e ye. Eliyê di kilamên Sîzer de hîn beriya ku dinya ava bibe û kesek li dinê hebe hebûye, dinya di nûra Elî de çêbuyê, Elî, erd e; Elî, ezman e; Elî, sirra Heq e, Heq e, heqîqet e. "*Wexta ki Elî heyî tu kes tunebû/Di nûra Elî da va dinya çêbû/Erd û ezman hat zimên lê pêda bû/Gotin ew jî sirra te ye ya Elî/Me go erd û ezman jî tu yî ya Elî/Me go Nûh û Lût jî tu yî ya Elî/Me go sirra Heq jî tu yî ya Elî/Heyîna Elî qet neketinî gûmanê/Me go tu Heq î heqîqet î ya Elî"*

Elî, di kilaman de bi wesfên baş ên weke comerdî û hevalê merdan hatiye îfadekirin: "*Elî qurba tî comerd î, rindo rindo tî comerd î/ Tu comerd î meriyê merd î"* Herwiha di kilaman de bi şiklê Eliyê zelal û hevserê Fatîmayê jî derbas dibe: *"Êrê Fatimê, Eliyê zelal e"* Lê Elî ne bes weke kesayetekî ku dema xelîfe Elî jiyabe derbas dibe. Elî, carinan Lût e, carînan Nûh e. Anku di demên cuda de bi nav û karakterên cuda derketiye holê: "*Me go Nûh û Lût jî tu yî ya Elî"*Dîsa Elî bi navên cuda yên weke Ela, Ilî, Îlya jî hatiye îfadekirin: "*Ela, Ilî, Îlya, Elî hate dîn li çar derî"* Herwiha ji bilî ziryeta wan kesekî sirra Elî fêhm nekiriye û wan sirra Elî anîne zimên: "*Sira Elî sulba me da hat zimên."* Elî, çiqasî mijareke

nîqaşbir be jî tê dîtin ku di gelek kilamên Sîzer de bi wesfên baş derdikeve pêş çavan û di navenda kilamên Sîzer de Elî heye.

3.3.5. Xweda

Di Elewîtiyê de mijara Xwedê ne mijareke zelal e. Li gorî Sîzer, Xweda û mirov yek in. Xwedayê wan bi wan re rûdine, dixwe, vedixwe. Nêrînên Sîzer ên di heqê Xwedê de di kilamên wî de jî bi heman awayî hatine îfadekirin. Xweda bi giştî bi şiklê Heq, Îlah, Elah hatiye îfadekirin lê herî zêde peyva "Heq" hatiye bikaranîn. Sîzer di kilamên xwe de îfade dike ku ew ji Heq in, Heq jî ne dûrî wan e, Xweda li wan dibe mêvan, Xweda cemala însên e, cemala însên jî Xweda ye. Xweda av e, agir e. Ku ew û Xweda di bedenekê de bin ew ling in, Xweda ser e. Heyv, roj, erd û ezman cemala Xwedê ne, wextê ku miradekî wan hebe Xweda miradê wan dide wan, guhê xwe didine tiştên ku Xweda dixwaze û xwe bi qurbana Xwedê dikin. Xweda, sereqat hişyar e, li her cihî ye, hosteyê rastan e, hilma dilên westiyayî ye. Ev nêrînên Sîzer di kilamên wî de bi van hevokan hatine îfadekirin: "*Em ê li Heq in Heq jî li me ne yî dûr e/ Me ya Heq go Heq jî li me bû mîvan/ Cemal Heq e û Heq cemal e/ Dido dila Heq î li ceme/ Îna dikim tu him av î him ar î/ Em ê bi ling win bê te tune serê me/ Hîv roj erd ezman cemala te/ Mirazdar î ez li te mirazxwaz im/ Diwim qurban wî Xwedêyî/ Guhdardikînî ya ki li Heq tê/ Ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî ya Îlahî/ Em ê di xew da tu tim payî/Tu her cah î ne cah cah î/ Tu ostayê tim rasta yî / Ne hevalê derewa yî/ Solixa dilê westiyayî*"

3.3.6. Şît û Nacî

Fikra Gurûhu Naciye ji bo Elewîtiyê hizreke bingehîn e û ji hizra Sunî ya "Firqe-î Naciye"yê cuda ye. Li gorî hizra Sunî, Firqe-î Naciye koma ku digihe xelasiyê ye herwiha li gorî hedîsa Pêxember dê umeta wî bibe heftê û sisê firqe (kom), lê dê komek ji van koman xelas bibe û dê yên mayî tev di êgir de bişewitin. Hizra Sunî vê koma ku xelas dibe weke Firqe-î Naciye bi nav dike. Li gorî hizra Elewîtiyê du şîroveyên Gurûhu Naciyeyê hene. Li gorî şîroveya ewil Gurûhu Naciye ew koma ku ji binemala Şît û Naciyeyê tê ye, tevên pêxember û weliyan ji vê binyatê ne. Li gorî şîroveya diduyan Gurûhu Naciye li derdoreke paqij û kamil e herwiha bijarte

ye. Gurûhu Naciye ji zarokên Hewayê paqijtir û gihiştîtir e.[46] Yên ku di emrê Heq de ne û di rizayê de îqrarê didin Firqe-î Naciye ne, ji Naciyeyê çêbûne. Firqe-î Naciye ew kes in ku di emrê Heq û rizaya Heq de ne. Serê çil hefteyî carekê li Dîwana Heq radibine darê û hesêb didine pîrên xwe.[47] Sîzer jî îfade kiribû ku li gorî baweriya wan ew ne ji Adêm û Hewayê ne, ji Şît û Naciyeyê ne. Ev nêrînên Sîzer, di kilamên wî de jî hatine îfadekirin. Dibêje ku ew ji ziriyeta Şît hatine û bûne Gurûhu Nacî û nefsa xwe ji holê rakirine. Di kilamên bi navê "Qizilbaş" û "Delîl" de qala navê Şît û Naciyeyê hatiye kirin û ev mijar bi şiklê: "*Sulba Şît ra em bûn gurûhu Nacî / Li Şît û Naciya ra nefis rakirin"* hatiye zimên.

3.3.7. Îqrar

Îqrar yek ji girîngtirîn têgehên Elewîtiyê ye. Elewîbûn bi îqrardayînê dest pê dike. Kesê ku dixwaze ku bibe Elewî divê îqrarê bide pîrekî û heta ku heye vê îqrara xwe xera neke. Kesê ku îqarara xwe xera bike biqisûr tê hesabkirin û li gorî sûcê xwe tê cezakirin. Cezayê herî giran hermonîkirina ferd e. Ferdê ku tê hermonîkirin nikare bikeve nava civakê. Civak, vî ferdî bi her awayî ji xwe dûr dike û heke ku ev kes were efûkirin jî divê careke din îqrara xwe bide. Têgeha îqrarê gelek caran di kilamên Sîzer de derbas bûye. Li gorî kilamên Sîzer gelên ku bêîqrar in tev dûrî rastiyê ne. Hîn dema sifyana Nebî Nûh de îqrardayîn hebûye, kesên rast û çê îqrara xwe xera nakin herwiha îqrara kesên pak carek e, ew kes ti carî îqrara xwe xera nakin. Îqrara wan ne bi dêv e bi dil e, Xweda mirazê kesên ku li ser îqrara xwe ne, dide wan. Îqrar di kilamên Sîzer de di van hevokan de derbas bûye: "*Milletê bê îqrar giştkî dûrî ne/ Îqrar da te qet nediçûm derî rê/ Tofana Nuh da wan îqrar dajotin/ Li îqrara saxa ê dawistiye/ Dilê saxa îqrara sadiqa kî bibexşînî/ Îqrar da te qet nediçûm derî rê/ Ê ku gotî îqrar yek e/ Didu nabin ku sikinîn/ Li benda îqrara xwa me/ Îqrarê me ê bi dilan e/ Îqrara sadiqan gudar î/ Mirazxwaza mirazdar î"*

[46] Caner Işık, "Güruhu Nâciye'den Aleviliğe", *Alevilik Araştırmaları Dergisi*, 2015 / yıl: 5 sayı: 10, rr. 31-33.
[47] Kutlu, *Kızılbaş Alevilikte Yol Erkan Meydan*, r.42.

3.3.8. Destbiraktî

Destbiraktî di baweriya Elewîtiyê de, di cihekî taybet û girîng de ye. Têgeha destbiraktiyê bi şiklê misawtiyê jî tê îfadekirin. Wextê ku du kes dizewicin malbateke din ji xwe re dikine destbirak. Ev du malbat dikevine şiklê malbatê û biratiya wan ji biratiya bi xwînê pêşvetir e. Divê ti tiştî ji hev veneşêrin û her kêliya girîng li cem hev bin, herwiha mehra zarokên misawan li hev nabe. Li gel ku têgeha destbiraktiyê têgeheke gelekî girîng e jî ev têgeh di kilamên Sîzer de bes yek carê di kilama bi navê "Delîl" de bi şiklê: "*Giş hev ra misaw in ewna can bi can*" derbas bûye.

3.3.9. Pêşengên Baweriyê

Talib; anku kesê ku tiştekî dixwaze. Di Elewîtiyê de kesê ku dixwaze ku bikeve rêyê, talib e. Piştî talib rêber tê. Rêber ew kes e ku rê li ber hinekan dixe, weke şêwirmendekî tê qebûlkirin. Piştî rêber pîr tê. Wextê ku kesek dixwaze ku bibe Elewî îqrara xwe dide pîr. Piştî pîr, murşîd tê. Kesê herî kamil û gihiştî murşîd e. Lê ev bernav ne tiştekî fermî ne. Ev kes ne karmendên fermî ne. Di nava civakê de kifş dibin û derdikevine pêş, herwiha ev ne weke astekê û pileyekê ne. Di civaka Elewî de asta kesekî ji ya kesekî ne balatir e. Ev binavkirin, ji bo ku pêdiviyên rêyê bi cih werin û rêya Elewîtiyê wenda nebin e. Hemû ferdên Elewî dikarin hesêb ji rêber, pîr û murşîd bipirsin. Sîzer dibêje ku di nava wan de kesek bi rêya xwîne nabe xwediyê van meqaman û nabêjin em ji binyata pêxember tên herwiha nabêjin em seyîd in jî. Gel van mîsyonan dide wan, gel kê layiqî van meqaman bibîne xwediyê meqêm ew e. Lê divê were îfadekirin ku şiklê diyarkirina van pêşengan li cem tevên komên Elewî ne bi yek şiklî ye. Dîsa nêrînên ku dibêjin li cem Kurdên Elewî ev sifet bi xwînê derbas dibin hatibûne diyarkirin. Tê gotin ku ji bo Elewiyan, têgeha pîr bi seyîdbûnê re di heman wateyê de ye û meqamê pîr mexsûsî ewladên Muhemed û Elî ye.[48]

[48] Shahab Vali, "Mefhûmê 'Pîr' der Fermanê Mensûb be Îmam Sadiq", *Cavîdanê Xered,* Dovreyê Cedîd, Şomareyê Dovvom, Behar 1389 (k.), r. 6.

Di kilamên Sîzer de bêjeya talib carekê derbas bûye: "*Bûn talibê pîrê pîran";* bêjeya rêber sê caran derbas bûye: *"Li şerîetê bûnî rêber/ Ew bûne rêberê welî/ Gudarî me rêberya te"*. Di hevoka "Guhdarî me rêberya te" de rola rêber a weke şêwirmend kifş dibe. Xwiya dibe ku Sîzer li hêviyê ye ku rêber rêyeke li ber bixe.

Di kilamên Sîzer de ji pêşengên baweriyê herî zêde navê pîr derbas bûye. Bêjeya pîr gelek caran di dîsgotinên kilaman de derbas bûye. Pîr; gih Hiseyn, gih Hesen, Gih Ap El, gih Seyîd Riza, gih Qember û gih jî Elî ye. Gotinên pîr tev rast in û heqîqet in, deriyê pîr deriyê heqîqetê ye. Pîr, ew kes e ku canê xwe jê re dikine qurban, pîr tim bi her tiştî dizane. Kesê ku hewara xwe dibinê pîr e. Hevokên ku bêjeya pîr di wan de derbas dibin ev in: *"Hu hu hu pîrê min Elî/ Hesen, Husen pîrê aleme/ Pîrê me jî tim Qember e/ Pîrêm kalê Ap Elê da/ Pîrê mi Seyîd Riza da/ Gotinê pîrê min gî heqîqet e/ Qapiyê pîrê min gî heqîqet e/ Canê min bi qurbana pîr kin/ Pîro qurba gi diwînî/ Pîro qurban were min macir meke"*

Bêjeya murşîd bes carekê derbas bûye: "*Murşîdê me Doxan Dede/ Ser dilê saxa yî bi xewer e"* di vê hevokê de qala murşîdekî Elewiyan hatiye kirin û hatiye îfadekirin ku murşîd ji tiştên ku di dilên kesên baş de ne bixeber e û bi dilên wan zane.

3.3.10. Diwazdeh Îmam

Mijara diwazdeh îmaman mijareke binîqaş e, di beşên jorê de qala nîqaşên li ser vê mijarê hatibû kirin. Li gorî kesên ku bawer dikin ku diwazdeh îmam di Elewîtiyê de hene îmamê ewil Elî ye û îmamê dawî Mehdî ye. Navê diwazdeh îmaman li gorî rêzê bi vî şiklî ye: Îmam Elî (599-661), Îmam Hesen (624-670), Îmam Hiseyn (625-680), Îmam Zeynel Abidîn (658-713), Îmam Muhemed Baqir (676-733), Îmam Caferî Sadiq (699-766), Îmam Mûsa Kazim (745-799), Îmam Elî Riza (765-818), Îmam Muhemed Taqî (811-835), Îmam Elî Naqî (829-868), Îmam Hesen Eskerî (846-874), Îmam Muhemed Mehdî (869- …).[49]

[49] Danimarka Alevi İnanç Toplumu, *Alevi-Bektaşi İnancının Esasları*, r. 36.

Qala diwazdeh îmaman di kilamên Sîzer de heye. Kilama bi navê "Duaz-i Îmam" li ser diwazdeh îmaman e. Di vê kilamê de navên diwazdeh îmaman bi vî şiklî derbas dibin: Elî, Hesen, Hiseyn, Zeynel Aba, Muhemed Baqir, Cafer Sadiq, Mûsa Kazim, Xulqî Riza, Taqî, Naqî, Hesen Esker, Mehdî. Dîsa di kilama bi navê "Delîl" de jî behsa diwazdeh îmaman heye.

3.3.11. Jin

Herçiqasî ku mijara jinê ne weke mijareke dînî xwiya bike jî di baweriya Elewîtiyê de cihê jinê gelekî cuda û taybet e. Elewîtî cudahiyê naxe navbera jinan û mêran, zayend ne girîng e. Her mirov can e.

Sîzer, di kilamên xwe de gelek caran cih daye mijara jinê. Kilama bi navê "Jin û Cîhan" bi tevahî li ser jinan e. Li gorî kilamê hîn wextê ku dinya ava nebûye Fatma hebûye: *"Wextak erd gî av bû ezman dûman bû/ Di navbera wir de xanek çêdibû/ Li nav wê xanê jî Fatma mîvan bû"*; Hacerê û Sehrayê wextê sifyana Nebî Nûh îqrara xwe dane û bi Mûsa re pez dohtine: *"Min ra li Hacerê, Sehra digotin/ Tofana Nuh da wan îqrar dajotin/ Hatin bi Mûsa re jî tev pez dohtin";* Kîbeleyê xwe bi xwe çêkiriye, her kesî jê bawer kiriye, heyvê û rojê baskên xwe jê re vekirine: *"Kîbelê li xwe da xwe peyda dikir/ Him jin û him mêr û giya lê îna kir/ Hîvê û royê jî ser ra perê xwe vekir"*; Zelîxayê agirê Nemrûd vemirandiye, Xetîceyê Muhemed xemilandiye, Zeynebê erd û ezman tev helandine: *"Ew arê Nemrûd Zelîxê vemirand/ Xetîcê Muhemed reng reng xemiland/ Hezret Zeynew erd û ezman gî heland"*; di dîsgotina kilamê de hevokên "*Ji bo vê em diwên cîhan wek jin e/ Siya xwe girtiye erdê him ji ezmên e"* hatine dubarekirin. Di kilama bi navê "Qizilbaş" de hatiye îfadekirin ku ji berê ve di nava wan de ferqa jin û mêran nîne: *"Li nav me da tine bû jin û mêrî"* û qala ku di meclîsa çilan de hevdeh jin hebûne hatiye kirin: "*Deh û heft bacyan xizmet girtin wî derî*"; di kilama bi navê "Delîl" de hatiye îfadekirin ku jinên çilan ji wan re çira pêxistine û rêya wan kirine ronahî: "*Jinên çelan li me ra delîl vêxistin"*.

3.3.12. Pirtûkên Pîroz

Di beşa ewil de hatibû îfadekirin ku Elewî pirtûkekê ji xwe re weke pirtûka pîroz pênase nakin. Qedir didine tevên pîrtûkên pîroz lê wan pîroz nabînin. Heman raman ji aliyê Sîzer ve jî hatibûne îfadekirin, wî jî amaje pê kiribû ku tevên pirtûkan dixwînin lê ev xwendin ne ji ber pîrozdîtina pirtûkan e, ji ber xwesteka zanînê ye. Herwiha Sîzer îfade kiribû ku Quran ji ber tirsa derdorê li malên wan peyde dibe. Navên çar pirtûkên pîroz di kilama "Delîl" de bi şiklê: "*Tewrat, Zebûr, Încîl, Quran ku hatin zimên/ Ehlîbêtê Muhemed delîl vêxistin*" derbas bûne.

3.3.13. Xizir

Xizir, di baweriya Elewîtiyê de weke kesekî pîroz tê qebûlkirin. Kî di kirasekî teng de be, hewara xwe dibe Xizir, miraz ji Xizir têne xwestin. Sîzer jî di kilamên xwe de gelek caran cih daye Xizir. Kilama bi navê "Ya Xizir" li ser Xizir e. Li gorî kilamê, Xizir her derê dibîne, ji her tiştî agahdar e, kesên di tengiyê de rizgar dike, kesê bêkesan e, carinan heyv û carinan roj e, sirra Heq e, hezar û yek navên wî hene, guhdarê îqrara kesên sadiq e, kaniya mirazan e û mirazê mirazxwazan dide wan, bi biçûkan re biçûk bi mezinan re mezin e, kesê ku dibexşîne ye. Dîsa di helbesta bi navê "Delîl" de qala Xizir hatiye kirin: "*Ê tengiyê Xizir lê diwe mêvan/ Xizir, bi Elî Selmên ra delîl vêxistin*". Di dîsgotina kilama bi navê "Gula Meqama" de hevoka: "*Ya Xizir ya Xizir ya Xizir tu bi gî dizanî*" hatiye dubarekirin.

3.3.14. Tembûr

Tembûr, ji bo Elewiyan amûreke gelekî girîng e, herwiha amûra pîroz e. Weke ku li jorê amaje pê hatibû kirin Elewî ne xwedan pirtûkeke pîroz in. Baweriya xwe bi sedsalan bi rêya kilaman ji pê girtine û bo nifşên nû veguhestine. Ev kilam bi piranî bi tembûrê hatine/têne stran. Kilam û tembûr weke hestî û goşt in, ji bo ku kilamên pîroz bi tembûrê têne stran tembûr jî pîroz tê dîtin. Ji ber vê yeke, ji

tembûrê re "Qurana bitêl" tê gotin.[50] Kilaman him baweriya Elewiyan him jî çanda wan zindî hiştiye. Mirov dikare bibêje ku kilaman û tembûrê çanda Kurdan jî hebandine û ev muzîka olî ji bo Kurdan qewmîneke gelekî biqedr e. Li Kurdistanê weke encameke pêşveçûna girîng a sufîzm û mîstîsizmê qada muzîka olî û pîroz weke yek ji pêşveçûnên herî girîng bû.[51] Wextê ku di konteksta tembûrê de qala muzîka olî û Kurdan were kirin nabe ku qala Yarsanan newe kirin. Muzîk di ayînên Yarsanan de xwediyê cihekî taybet e û amûra sereke ya ayînê tembûr e. Tembûr sedsala yazdehan ji aliye Şah Xweşîn ve hatiye nasandin. Tê gotin ku di meclîsên Şah Xweşîn de 900 tembûrvan, 900 kilambêj, 900 bilûrjen û 900 defjen dihatine cem hev.[52] Tê dîtin ku him Kurdên Elewî him jî Kurdên Yarsan kilamên xwe bi tembûrê dibêjin û tembûrê pîroz qebûl dikin. Tembûra Elewiyan li gorî demê şikil guhertiye lê Yarsanan şiyane tembûra xwe bi şiklê berê biparêzin, Yarsan rê li ber guherîna şiklê tembûra xwe venakin.[53] Tembûr, îro li gelek deverên cîhanê bi nav û formên cuda peyde dibe û herwiha li ser dîrok û jêdera tembûrê angaşt û nîqaşên cuda hene. Li gorî angaştekê, tembûr, ji zimanê Hindî tê. Wateya wê kundirê tehl e. Di eslê xwe de ev amûr ji kundir hatiye çêkirin. Li gorî angaşta din tembûr ji dombirrê tê. Bi wateya dûvê qutkirî/dûvê ku hatiye birîn. Dîsa kesên ku sazkirina tembûrê bi qewmê Lût ve têkildar dikin hene.[54]

Sîzer, di kilamên xwe de cih daye tembûrê jî. Ji bo tembûrê navê "mêmanî" jî bi kar aniye û dibêje ku berê ji tembûrê re hîn bêhtir digotin mêmanî. Di kilama "Sewda (2)" de ev du nav li gel yek bi kar anîne: *Mêmaniyê min çal e çal e/ Tembûrêm çal e çal e/ Bi ro bi şev dinale/ Ê ki bi zimên nizane/ Ê ki bi me nizane/ Hin diwên va sewda ye/ Hinî diwêne va hal e*. Li gorî kilamê, mêmaniya wî bi

[50] Ulaş Özdemir, "Ehl-i Hak'ın Kutsal Sazı Tanburun Kimliği ve Bağlamayla İlişkisi" in ber. Pınar Ecevitoğlu, Ali Murat İrat, Ayhan Yalçınkaya, *Hecî Bektaş Veli Güneşte Zerresinden, Deryada Katresinden*, Dipnot Yayınları, Ankara, 2010, r.247.
[51] Mustafa Dehqan, "An Ahl-i Haqq Kurdish Folio on the Music", Departmant of Oriental Studies, University of Vienna, 2018, r. 70.
[52] Ali Akbar Moradi, "Iranian Kurdistan The Ritual Maqam of the Yarsan, Chanting and Tanbur", *INEDIT*, Maison des Cultures du Monde, 2002, r. 28.
[53] Özdemir, "Ehl-i Hak'ın Kutsal Sazı Tanburun Kimliği ve Bağlamayla İlişkisi", rr. 246-247.
[54] Behrûzê Vecdanî, *Ferhengê Camieyê Musîqiyê Îranî*, Cildê Dovvom, Neşrê Gendoman, Tehran, b. 2. 1386 (k.), r. 730.

şevê û rojê dinale û yên ku zimanê wan tênagihin anku bi rêya wan nizanin nikarin halê wan fêhm bikin.

Di kilama "Dem Bû Dem" de bêjeya "tembûr"ê û "saz"ê bi hev re bi kar anîne: *Yar tembûrê tel û perda/ Loy aşiq û bextê te da me/ Carkê rale wî sazî/ Tu him biwê him jî lêxe/ Yar aşiq û kul û derda.*

3.3.15. Ferîşteh

Navên Îsrafîl, Cebraîl, Mîkaîl û Ezraîl di kilama "Delîl" de derbas bûne. Li gorî Sîzer, hîn wextê ku gerdûnê şikil negirtiye Elewîtî hebûye. Tevê baweriyan ji Elewîtiyê çêbûne û baweriya wan di nava tevê baweriyan de heye. Ev nêrînên wî di behskirina mijara ferîştehan de jî bi awayekî zelal têne dîtin. Di kilama "Delîl" de, van fikrên xwe li ser mijara ferîştehan diyar dike. Di kilamê de tê dîtin ku her çar ferîştehan ji wan re delîl (çira, mûmik) pêxistine. Weke ku tê zanîn di Elewîtiyê de ronahî semboleke zehfî girîng e. Gelek caran çira an jî mûmik weke nîşaneya vê sembolê têne bikaranîn. Di ayînên cemê de, li ziyaretan, li ser goran rastî van sembolan tê hatin. Di ayînên cemê de ewil, çiravan çirayê (mûmikê) pê dixe û ayîn bi vî şiklî dest pê dike û dîsa yek ji diwazdeh peywirdaran çiravan e. Di kilama "Delîl" de kesên ku delîl (çira) pêxistine çar ferîşteh in. Anku van ferîştehan jî xizmet ji Elewîtiyê re kirine û sembola ronahiyê bi destên wan hatiye zindîkirin: *Îsrafîl, Cebraîl, Mîkaîl, Ezraîl/ Bûn melek li me ra delîl vêxistin.*

3.3.16. Ziyaret

Di tevên baweriyan de têgeha ziyaretan, têgeheke girîng e. Şopînerên baweriyeke cihên ku ji bo wan pîroz in ji bo armancên diyar û di demên diyar de ziyaret dikin. Ji bo Kurdên Elewî wextê ku qala têgeha ziyaretê tê kirin hîn zêdetir ziyaretên herêmî têne hişê mirovî. Sîzer di kilamên xwe de rasterast qala têgeha ziyaretê nekiriye û ev bêje bi kar neaniye lê gelek kesên ku gorên wan weke ziyaretan pîroz têne dîtin di kilamên wî de derbas dibin. Yek ji van kesan Elîf Ana ye, sala 1991ê çûye ser dilovaniya xwe û gora wê li gundê Pazarcixê yê bi navê Pûlyana Jêrî ye. Elîf Ana, wextê ku sax e tim alîkariya xelkê kiriye, tê gotin ku ji piçûkayiya xwe ve bi her tiştî zanîbûye. Ji ber van, xelkê gelekî qedir dayê û niha

weke ewliyayekê tê qebûlkirin. Kesên ku diçine serdana gora wê bawer dikin ku dê ji derdên wan re bibe derman. Di kilama bi navê "Dema Elî" de qala Elîf Anayê hatiye kirin: *Va Mereş e xweş Mereş e/ Pîrêm tê da tim dimeşe/ Elîf Anê temenna ne.*

Kesê din ê ku gora wî îro weke ziyaretê tê qebûl kirin Demîr Dede ye. Gora wî li gundê Semsûrê yê bi navê Çamgaziyê ye. Di heqê jiyana wî de agahiyên zelal nînin lê gelek ji Elewiyên herême bawer dikin ku kesekî pîroz e. Li kêleka gora wî demxaneyek heye, kesên ku diçine demxaneyê serdana gora wî jî dikin û bawer dikin ku dê wan bigihîne mirazê wan. Navê Demîr Dede di kilama "Dem Bû Dem" de derbas bûye: *Î comerd e Demîr Dede/ Yar tixtorê tixtora ne/ Ûmdiya kela û kura ne / Bê mexelê xezalan e/ Xwadiyê feqîr fuqera ne.*

Kesekî din ê ku di kilaman de qala wî hatiye kirin û gora wî weke ziyaretê tê qebûlkirin Ulu Baba ye. Di heqê Ulu Baba de agahiyên zelal nînin. Ev ziyaret, li navçeya Semsûrê ya bi navê Çîlikanê yê. Ji ber ku cihê ziyaretê gelekî bilind e, piraniya salê gelekî sar e û encix havînê serdana vê ziyaretê pêkan dibe. Ev, ziyareteke gelekî kevnar e û tê bawerkirin ku Ulu Baba nexweş û berastengan rihet dike û mirovan digihîne mirazên wan. Di kilamên bi navên "Qerebêl" û "Dema Elî" de navê Ulu Baba derbas bûye: *Meqam girtin heqîqetê Ulu Baba ul niyaz e/ Qerebêlî Qerebêlî Qerebêl maşela li te ra…* U*lu Baba ulu çiyan e.*

Kesê din ê ku Sîzer, di kilamên xwe de behsa wî kiriye û gora wî niha ziyaret e Doxan Dede ye. Gora Doxan Dede li gundê Semsûrê yê bi navê Borgenekê ye. Doxan Dede, dema ku sax e weke murşîdê kamil hatiye naskirin. Him ji Semsûrê him jî ji bajarên din gelek kes têne vê ziyarete û ji bo ku mirazên wan bi cih werin diayan dikin. Sîzer, di kilama bi navê "Dema Dîwana" de murşîdbûna Doxan Dede aniye zimên: *Rêya uluya ser bi ser e/ Pê da bigre heval were / Murşîdê me Doxan Dede.*

Kesê din ê ku Sîzer di kilamên xwe de behsa wî kiriye û cihê gora wî bûye ziyaret Mehmûd Hesarî ye, bêhtir bi navê Mehmûd Ensarî tê zanîn. Ziyareta Mehmûd Hesarî heft kîlometreyan dûrî Semsûrê ye. Him ji Semsûrê him jî ji bajarên

derdorê gelek Elewî gora Mehmûd Hesarî ziyaret dikin û li ser gora wî diayan dikin. Sîzer, di kilama bi navê "Dema Elî" de aniyê zimên ku Mehmûd Hesarî ji tevên derdan re derman e: *Ez qurban Mehmûd Hesarî/ Ew dermanê derdan giyan e.*

3.3.17. Dem (Cem)

Wextê ku qala Elewîtiyê tê kirin bêgoman yek ji tiştên ku ewil tê hişê însên ayîna cemê ye. Ji ber ku cem bi şiklê ayînekê tê lidarxistin ku têgeha ayînê baştir were fêhmkirin dê mijar zelaltir bibe. Herçend ku li ser têgeha ayînê pênaseyeke hevpar û ku bi giştî tê pejirandin nebe jî R. Rappaport, ayînê weke tevgereke bingehîn a civakî pênase dike. F. Staalz ji bo ayînê pênaseya tevgereke hêsan, bêarmanc û bêwate maqûl dibîne. C. Levi-Strauss ayînê hîn bêhtir bi weke şiklekî lîstikê dibîne û ayînê weke mînakeke lîstikê ku tê tercîhkirin pênase dike. C. Geertzs jî ji bo ayînê pênaseya ku dibêje di ayînê de cîhana heyî û cîhana ku tê xeyalkirin dibine heman cîhan tercih dike.[55] Gava ku mirov li van pênaseyan dinêre tê dîtin ku ayîn weke tevgereke bingehîn in ji bo civakê. Ji ber ku ayîn di her tevgerên civakî de hene li her cihê ku civak hebe dê mirov karibe qala ayînan jî bike. Ji xwarinê bigire heta bi merasîmên şînê li gorî hinek rêzikan têne kirin û tekuziyek di wan de heye. Herçend ku baş neyê zanîn bê ma ayînan kengî, li ku derê û bi çi şiklî dest pê kirine jî tê dîtin ku civakên herî kevn ku yên em di heqê wan de xwedan agahî ne hinek ayîn pêk anîne. Mirovên kevn ên dema civakên nêçîrvan û civakên eşîretî beşdarî çalakiyên ayînî bûne lê encix dawiya sedsala 19an ev ayîn weke danayên ku koka dîn û medeniyetan test bikin hatine dîtin.[56] Herçend ku bêjeya ayînê ewil weke têgeheke dînî were fêhmkirin û tevgerên bi şiklê spasiya Xwedê derkevine pêş jî Xweda di demên berê de di ayînan de nebûye. Xweda û cîwarbûn bi hev re bi pêş ketine, armanca ayînên berê ev e ku xweza jiyana heyî berhemdêr bike. Hinek ayînên wê demê weke îfadeya spasiya civakê û rêya sivikkirina tawanên civakî bûn ên mayî ji ayînên çandiniyê û efsûnî şikil

[55] Catherine Bell, *Ritual Theory-Ritual Practice*, Oxford University Press, New York, 2009, r. 0.
[56] Catherine Bell, *Ritual Perspectives and Dimensions*, Oxford University Press, New York, 2009, r. 1.

girtin û ji zîndîkirina xwezayê re xizmet kirin. Li Mezopotamyayê hezarsala sisiyan perestgeh veguhestine mala Xwedê, piştî ku pergala bajaran guherî, civak dabeş bû, xwedî/mezinên bajaran derketine holê û civak bi rê ve birin.[57] Piştî ku Xwedê tevlî ayînan bûye jî şiklê pêkanîna ayînan li gorî demê, armancan û civakan guheriye û diguhere. Di gelek ayînan de tê dîtin ku merasim li pêşberî peykerekî tê encamdan û ev peyker di heqê civakê de dikare hinek agahiyan bide. Bedena însên ji bo moda, temsîl, taswîr û têgihiştina remzên peykeran weke dîmena herî pêkan hatiye pejirandin. Ev wêne/peykerên di ayînan de bi bêhnên xweş û muzîkê jî hatine qehîmkirin.[58] Armanca van objeyên weke muzîk û bêhnên xweş jî ev e ku bandora ayînê li ser beşdarvanan zêde bibe û beşdarvan bi tevahî bibine perçeyekî ayînê. Herwiha armanca ayînê çi dibe bila bibe, ayîn xwedanê fonksiyonên cûrbicûr e. Ayîn yek ji rêyên sereke ye ku mirov xwe pê îfade dike.[59] Kesê ku beşdarî ayînê dibe bi rêya ayînê derfeta xweîfadekirinê dibîne. Dîsa ayîn rêya avakirina modelan e, lê ayîn bes ne modelên pêywendiyên civakî çêdike, modelên tevgeran jî çêdike.[60] Di dema ayînê de pêywendiyên ku di nava beşdarvanan de derdikevine holê dibine modelek û şopînerên wê ayînê li gorî van modelan tevdigerin. Hêzeke girîng a ayînê muzakerekirina nakokiyên di navbera kevneşopiyên olî, yên di navbera ferd û civakê, ol û hiyerarşiya civakî û beşdervanan de ye.[61] Ferdên ku beşdarî heman ayînê dibin ji ber ku ji bo heman armancê civiyane nêzîkatiyeke hestî di navbera wan de ava dibe. Ferd, xwe weke endamekî wê civakê dibîne û piştî demekê rastiyên wê civakê weke rastiyên xwe dinirxîne. Ayîna ceme, him weke îbadeta sereke ya Elewiyan tê pejirandin him jî weke tevên ayînên din van fonksiyonan jî tîne cih.

[57] Albert I. Buamgarten, *Sacrifice in Religious Experience*, Brill, Koln, 2002, rr. 40-41.
[58] Davide Nadali, "When Ritual Meets Art- Rituals ın the Vısual Arts Versus the Visual Arts in Rituals: The Case of Ancient Mesopotamia", *Rivista Studi Orientali Supplemento* 2, 2013, r. 222.
[59] Ithamar Gruenwald, *Rituals and Ritual Theory In Ancient Israel*, Brill, Leiden • Boston, 2003, r. 2.
[60] Rao Ursula, " Ritual in society", in *Theorizing Rituals: Issues, Topics, Approaches, Concepts*, ed. Jens Kreinath-Jan Snoek-Michael Stausberg Brill, Leiden • Boston 2006, r. 146.
[61] Catherine Bell, *Teaching Ritual*, Oxford University Press, New York, 2007, r. 230.

Sîzer jî di kilamên xwe de cih daye ayînê û girîngiya wê bi rêya kilamên xwe îfade kiriye. Lê Sîzer him di kilamên xwe de bêjeya "cem"e bi kar nayîne him jî di hevpeyvînên ku pê re hatine kirin de ti carî ev bêje bi kar nedîanî. Ji dêlva "cem"ê ve dibêje "dem" û ji dêlva "cemxane"yê ve dibêje "demxane". Herwiha îfade dike ku berê navê demxaneyan "mezilgeh" bûye. Divê were îfadekirin ku ji bo ayîna demê cihekî diyar ne şert e. Dem li her deverê çêdibe û Sîzer dibêje ku demxaneyan bi awayekî neyênî jî bandor li baweriya wan kiriye. Him bûne sedema wendabûna çandê û zimên him jî îbadeta wan hinekî bûye şiklî. Dibêje ku berê, bêyî ku nîşanî kesekî bidin îbadeta xwe jidiltir û tekûztir dikirin. Kilama "Dem Bû Dem" li ser demê ye. Dem weke mala xwe, weke halê xwe îfade kiriye û şiklê pêkanînê demê jî aniye zimên: *Dem dem mala min demêy/ Dem dem halê min demêy/ Dema kekêm dem giran e/ Dem digere her du piyan e.*

3.3.18. Derhoze

